

T.C
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI
YÜKSEK LİSANS TEZİ



ÇEND ÇÎROKÊN HERÊMA ŞÊXAN

(Metin – Analiz)

Mehmet BOZKOYUN

132302110

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Emanullah POLAT

Bingöl-2015

K.T

Zanîngeha Bîngolê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Wêjeya Kurdî

Lîsansa Bilind

ÇEND ÇÎROKÊN HERÊMA ŞÊXAN

(Metn – Analîz)

Mehmet BOZKOYUN

132302110

Şêwirmend

Alk. Doç. Dr. Emanullah POLAT

Bîngol-2015

Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğüne

Bu çalışma jürimiz tarafından.....

.....
Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS / DOKTORA TEZİ olarak kabul edilmiştir.

(imza)

Başkan :.....

(Akademik Unvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Unvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Unvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Unvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Unvanı, Adı-Soyadı)

Onay

Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

İmza

.....

Akademik Unvan, Adı Soyadı

Enstitü Müdürü

(Mühür)

NAVEROK

NAVEROK	I
Kurte.....	VI
Özet	VII
Abstract	VIII
Peşgotin.....	IX
DESTPÊK	1
1. BEŞA YEKEM (FOLKLOR Û ÇÎROK).....	12
1.1. Dewlemendiya Folklorê Kurdî.....	12
1.1.a. Edebiyata Gelerî	14
1.1.b. Adet û Tore	15
1.1.c. Bîr û Baweriyên Gelêrî	16
1.1.d. Zanyariyên Gelêrî.....	16
1.2. Beşek ji Folklorê Kurdî: Çîrok.....	17
1.3. Li Dinyayê Çend Nûnerên Çîrokê.....	22
1.4. Çend Nûnerên Çîroka Kurdî	25
1.5. Çavkaniyên Çîrokê.....	27
1.6. Cûreyên Çîrokê	28
1.6.a. Çîrokên Ajalan	30
1.6.b. Çîrokên Neasayî	30
1.6.c. Çîrokên Rasteqîn	31
1.6.d. Çîrokên Kenhar (Pêkenok).....	31
1.6.e. Çîrokên Zincîreyî	31
1.7. Beşên Çîrokê	31
1.7.a. Çîvanok (Serê Çîrokê - Destpêka Çîrokê).....	32
1.7.b. Beşa Hîmî (Gewde- Bingeha Çîrokê)	32

1.7.c. Encam.....	32
1.8. Naveroka Çîrokan	33
1.9. Di Çîrokê de Bûyer	33
1.10. Lehengên Çîrokê	34
1.11. Fonksiyonên di Derbarê Lehengên Çîrokê de.....	35
1.12. Di Çîrokê de Cih û Dem.....	47
1.13. Di Çîroka Kurdî de Hinek Sembol.....	48
2. BEŞA DUYEM (EŞÎRA ŞÊXAN)	50
2.1. Herêma Şêxan (Eşîra Şêxan).....	50
2.2. Eşîr çi ye?	52
2.3. Hêmanên Ku Eşîrê Pêk Tînin.....	58
2.3.a. Mal	58
2.3.b. Malbat	58
2.3.c. Bav - Babik.....	59
2.3.d. Qebîle (Ber).....	59
2.4. Eşîra Şêxan.....	61
2.4.a. Eşîra Şêxan Ji Ku Hatiye?	61
2.4.b. Berên Eşîra Şêxan	62
2.4.c. Şecereya Eşîra Şêxan.....	68
2.4.d. Di Nava Eşîra Şêxan de Lîstik	69
2.4.e. Di Nava Eşîra Şêxan de Jûr (Ode).....	72
3. BEŞA SÊYEM (ÇEND ÇÎROKÊN HERÊMA ŞÊXAN)	74
3.1. Çîrokbêjên Herêma Şêxan.....	74
3.2. Dema Çîrok Vegotinê	74
3.3. Ji bo Çîrokbêjan Pere (Dirav) yan Xelat Dayîn	75
3.4. Beweriya Gel bi Çîrokan.....	75
3.5. Çend Çîrokên Herêma Şêxan (Eşîra Şêxan)	76

3.6. Keleha (Kela) Gewhernigê.....	76
3.6.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî	90
3.6.b. Metelokên Herêmê	90
3.6.c. Di Çîrokê de Dem.....	90
3.6.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh	90
3.6.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî	91
3.6.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî	91
3.6.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê	91
3.6.h. Peyam.....	92
3.6.i. Leheng.....	92
3.6.î. Nirxan	93
3.7. ‘Ereb Zengûrî û Rindika Çiya	93
3.7.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî	104
3.7.b. Metelokên Herêmê	104
3.7.c. Di Çîrokê de Dem.....	105
3.7.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh	105
3.7.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî	105
3.7.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî	106
3.7.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê	106
3.7.h. Peyam.....	107
3.7.i. Leheng.....	107
3.7.î. Nirxan	108
3.8. Siltan Hesen û Eşîra Binî Zêdan	108
3.8.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî	125
3.8.b. Metelokên Herêmê	125
3.8.c. Di Çîrokê de Dem.....	126
3.8.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh	126

3.8.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî	126
3.8.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî	126
3.8.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê	126
3.8.h. Peyam.....	127
3.8.i. Leheng.....	127
3.8.î. Nirxan	128
3.9. Sodeleynê	128
3.9.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî	136
3.9.b. Metelokên Herêmê	136
3.9.c. Di Çîrokê de Dem.....	137
3.9.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh	137
3.9.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî	137
3.9.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî	137
3.9.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê	137
3.9.h. Peyam.....	138
3.9.i. Leheng.....	138
3.9.î. Nirxan	138
3.10. Perîzade	138
3.10.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî	145
3.10.b. Metelokên Herêmê	145
3.10.c. Di Çîrokê de Dem	146
3.10.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh	146
3.10.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî	146
3.10.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî	146
3.10.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê	146
3.10.h. Peyam.....	147
3.10.i. Leheng.....	148

3.10.î. Nirxan	148
Encam.....	149
Çavkanî	152
Pêvek.....	158

Kurte

ÇEND ÇÎROKÊN HERÊMA ŞÊXAN

(Metn – Analîz)

Mehmet BOZKOYUN

Li ser rûyê dinyayê û li welatê me çîrok bûne mijara pirr lêkolînan. Pirr caran çîrok, bi bêjeyên “hebû tunebû li welatekî”, “hebû tunebû carekê ji caran” dest pê dibe û guhdaran dixê nava xeyalên neasayî û fantastîk, carcaran guhdaran dibê ser çiyayên di nava ‘ewran de, car caran jî guhdaran heft tebeqe di binê ‘erdê de dibê. Di şevên zivistanê yê dirêj de civata Kurdan bi çîrokan re hevaltî dikirin ango çîrok parçeyek ji jiyana kurdan bû. Hinek çîrok hebûn, neteweyî bûn ango li hemû welêt dihate zanîn (Şengê û Pengê, Mîrze Miheme) hinek jî herêmî bûn, an jî hew li gundekî tenê dihatine zanîn.

Her herêmek xwedî çîrok bû. Yek ji wan herêma jî li Rihayê Herêma Şêxan e. Herêma Şêxan navê xwe ji Eşîra Şêxan digire ango em dikarin çîrokên Herêma Şêxan wek çîrokên Eşîra Şêxan jî bi nav bikin.

Me li jorê hevok bi zanebûn, bi qertafên dema borî bikaranîn. Ji ber ku êdî bi derketina televîzyonan, bi derketina telefonên mobîl, bi derketina înternetê ango bi kurtasî bi pêşveçûna teknolojiyê re di nava civata kurdan de çîrok nayên vegotin û çîrok li ber candanê ne (dikin bimirin). Çîrokbêjên Kurdan an wefatkirin an jî ji ber sedema temen dirêjîyê çîrokên xwe jibîrkirine.

Me jî hewl da ku, di nava Eşîra Şêxan de çîrokên ku dikin were jibîrkirin ên dikin ji holê rabin û yê hetanî vê demê neketine lîteratura çîrokan berhev bikin û van çîrokên ji mirinê xelas bikin.

Peyvên Sereke: Herêma Şêxan, Eşîra Şêxan, Çîrok

Özet

ŞEXANLI YÖRESİNİN BİRKAÇ MASALI

(Metin – Analiz)

Mehmet BOZKOYUN

Dünyada ve ülkemizde masallar birçok araştırmaya konu olmuştur. Çoğu zaman masalları “bir varmış bir yokmuş, bilinmeyen bir diyarda”, “bir varmış bir yokmuş zamanlardan bir zamanda” sözleriyle başlar ve dinleyiciyi olağanüstü ve fantastik hayallere sevk eder, bazen dinleyenleri başları bulutların üstünde bir dağa çıkarır, bazen de dinleyicileri yerin yedi kat altına götürür. Kürt toplumu uzun kış gecelerinde masallarla arkadaşlık ederdi yani masallar Kürtlerin yaşamlarının bir parçası idi. Bazı masallar vardı ki bunlar ulusal idi yani bütün kürt bölgelerinde bilinen masallar idi (Şengê ile Pengê, Mîrza Mûhammed) bazıları da sadece bir yöreye has idi ya da sadece bir köyde bilinen masallar idi.

Her bir bölgenin kendine has masalları var/vardı. Bu bölgelerden (yöre) biri de Şanlıurfadaki Şêxanlı bölgesinin masallarıdır. Şêxanlı bölgesi ismini Şêxanlı aşiretinden almaktadır. Bundan dolayı Şêxanlı bölgesinin masallarını Şêxanlı aşiretinin masalları olarak da adlandırabiliriz.

Biz, yukarıdaki kelimeleri bilerek geçmiş zaman ekleri ile kullandık. Çünkü televizyonun, cep telefonunun, internetin çıkmasıyla ya da başka bir deyişle kısaca teknolojinin ilerlemesi ile birlikte, kürt toplumunda artık masallar anlatılmamakta ve masallar can çekişmektedirler (ölmek üzereler). Kürt masal anlatıcıları ya vefat etmişler ya da yaşlı olmalarından dolayı masalları unutmuşlardır.

Bizim de çabamız, Şêxanlı aşireti içinde unutulmak üzere olan, yok olmak üzere olan ve masal literatürüne girmemiş olan masalları toplamak ve bu masalları ölümden, yok olmaktan kurtarmak içindir.

Anahtar Kelimeler: Şêxanlı Yöresi, Şêxanlı Aşireti, Masal

Abstract

A FEW FOLKTALES OF ŞÊXANLI TRIBE'S

(Text – Analysis)

Mehmet BOZKOYUN

Folk tales have been comeup for many discussion in ourcountry and in the World. They usually starts with the sentences saying “ onceopun a time, in anunknown country...” or “once opun a time, a time from times...” and Folk tales encourage listen ers to extrao rdinary and fantastic dreams, sometimes have listeners clim bup mountains whose top sare over the clouds and sometimes take people under the seven fold of the earth. Kurdish society companied with folk tales in the long winter nights. That’s to say; folk tales were a part of the kurds. There were some folk tales (like Şengê and Pengê or Mîrza Muhammed), which were national. Namely they were known all parts of the kurdish regions. And but some of them were peculiar to only one regionor they were known only in one village.

Each religion has(had) folk tales which (were) are special to them. One of the seregions is Şêxanli and its folk tales are examples of the sespecial folk tales. Şêxanli region is named after the Şêxanli tribe. So we can name them asthe Şêxanli region’s folk tales.

We explained the sentences above in the past tense. Because Kurdish folk tales haven’t told any more in the kurdish society because of the invention of the televisions, the mobile phones andt he use internetor in other words due to advance of technology and the folk tales are in throes of death (they are about to die). And the kurdish story tellers were died or they forgot the folk tales owing toold age.

Our struggle is to gather the folk tales which are about to be forget tenorvanished in the Şêxanli tribe and can not find their places in our literature. And also our struggle is to save the folk tales embellishingour dreams and deliver them from the death.

Key Words: Şêxanlı Region, Şêxanlı Tribe, Folktale

Peşgotin

Çîrokbêjî karekî taybet bû, gelo çima em vê hevokê bi qertafa dema berê tînin zimên? Îro edî çîrok û çîrokbêjî li ber mirinê ne. Bi pêşveçûna teknolojiyê edî nîfşên nû li şûna çîrokên ku şevên zivistanê dixemilandin îro bi lîstikên kompîtiran, bi telefonên mobîl û bi cureyên teknolojiyê yê din re mijûl in. Ger em (nivşa me) serê xwe deynin û em ji vê dinê koç bikin edî wê çîrok jî ji holê rabin. Çîrok rabirdûya gel e. Dema ku gel rabirdûya xwe ji bîr bikin ew gel êdî tu caran nikarin dahatûya xwe bi hêsanî ava bikin. Ji ber ku mirovahî dişibin daran, çawa ku dar bê reh/kok nikaribe jiyana xwe berdewam bike, (li gor baweriyaya me rehên mirovan jî çanda wan a devkî ye) mirov jî bê çanda devkî nikare jiyana xwe berdewam bike. Ger jiyana xwe berdewam bike jî ew jiyan dibe jiyanêke bêreh ev tişt jî kêmasiyeke mezin e.

Armanca me ji xebatê, çîrokên Eşîra Şêxan yê ku giranbiha û yê neketine lîteraturê, ji mirinê xelas kirin û xistina nava lîteraturê ye. Girîngiya vê xebatê, xelaskirina bîra civata kurd e. Em di wê baweriyê de ne ku çîrok, ji pirr cûreyan cûreyêke bîra civata kurd e.

Dema ku me di derbarê Eşîra Şêxan de agahî berhev dikirin me pirr zehmet kêşand. Ji ber ku çavkaniyên nivîskî tunebûn, her kesekî li gorî xwe agahî didan, carcaran pirr agahiyên xelet derdiketin holê, pişavtina van agahiyan gelekî zehmet bû. Di berhevkirina çîrokan de jî zehmet pirr bûn. Dema ku ji bona berhevkirina çîrokan ez li nava gundên Eşîra Şêxan digeriyam, hinek çîrokbêjan wefat kiribûn, hinekan nedixwestin ji me re çîrokan bibêjin, hinekan çîrok nîvçe nîvçe dizanîbûn. Bi xebateke çend salan encax min çîrokên bi rêk û pêk ji çend çîrokbêjan berhevkin.

Ev xebata me, ji bilî destpêkê li ser sê beşan hatiye avakirin. Di beşa yekem de di derbarê folklorê û di derbarê çîrokê de agahiyên berfireh hatine dayîn. Di beşa duyem de di derbarê Herêma Şêxan û di derbarê Eşîra Şêxan de agahiyên berfireh hatine dayîn. Di van agahiyan de sînorên Herêma Şêxan, dîroka eşîrê, cûreyên eşîran, gundên eşîrê, şecereya eşîrê, lîstikên eşîrê û hin taybetmendiyan din yê eşîrê hene. Di beşa sêyem de taybetmendiyan çîrokan û çîrokbêjên Eşîra Şêxan hatiye dayîn. Di

heman beşê de çend mînakên çîrokên Eşîra Şêxan yê heta niha neketine lîteraturê hatiye dayîn û li gorî metoda Propp tehlîla van çîrokana hatiye kirin.

Bêguman amadekirina xebate wuha hêsa nebû, di amadekirina vê tezê de şîret û asankariyên mamosteyê min ê hêja Alk. Doç. Dr. Emanullah Polat û arîkariya dost û hevalên min ên hêja cihê rêzê ne. Ji ber vê çendê ez di serî de sipasiya mamosteyê xwe yê hêja Alk. Doç. Dr. Emanullah Polat û mamosteyê hêja Alk. Doç. Dr. M. Zahir Ertekin dikim. Ji bilî vê ez spasdarê Wetha Şukrî, Meyra Xerîb, Zera Fatê, Zekiye û Emîna Sînan, Eyûbê Xelîl, Sînanê Sofî Kalo, Ewdilqadir Akboru, Îbrahîm Kırmızıgöz, Hemedê Xerîb im. Lê, min ji bona vê tezê bi sedan kesî re mûlaqat kir ne mimkûne ku ez navê hemûyan li vê derê rêz bikim lê belê mala hemûyan ava be.

Mehmet BOZKOYUN

BÎNGOL - 2015

LÎSTEYA NEXŞEYAN

Şekil 1: Nexşeya ku Herêma Şêxan Nîşan Dide.	51
---	----

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1: Cudahiyên di navbera zaravayên eşîran de.....	57
Tablo 2: Li Gorî Ahmet Özer, Ziya Gökalp û İsmail Beşikçi Sinifandina Eşîrê.....	60
Tablo 3: Sinifandina Eşîra Şêxan.....	60
Tablo 4: Firqeyên girêdayî Eşîra Miliyan.....	64
Tablo 5: Firqeyên ku girêdayî eşîra Beraziyan.....	65
Tablo 6: Berên Eşîra Şêxan.....	66
Tablo 7: Çend gundên Eşîra Şêxan.....	67

Kurtebêje

amd. : Amadekar

b.n. : Berhema navborî

bnr. : Binêrin

b.z. : Berî zayînê

c. : Cild

ç. : Çap

DÎA: Ansîklopediya Îslam a Diyanetê

g.n.: Gotara navborî

h.b.: Heman berhem

hwd. : Her wekî din

j. : Jimare

nql. : Neqil

r. : Rûpel

r.x.l. : Rehma Xwedê lê be

s.x.l. : Slava Xwedê lê be

vgz. : Veguhêzer

wer. : Wergêr

DESTPÊK

Folklorê gelan li ser rûyê dinyayê ji sed û pêncî salî zêdetir e (berhema ku bi navê folklorê di sala 1846an de ji aliyê William John Thoms ve hatiye weşandin.)¹ bala lêkolîneran kêşandiye. Xebatên ewilîn ên di derbarê folklorê de ji aliyê biyaniyan² ve hatine kirin. Xebatên folklorê di nava kurdan de di nîveka sedsala XIXan dest pê kiriye. Bi dehan cûreyên folklorê çend cûre ev in: Gotinên pêşiyar, çîrok, zûgotinok, biwêj, lawik, dengbêjî, beytbêjî û hwd. Li vê derê jî bi awayekî zelal tê xuyakirin ku folklor ji edebiyata devkî (zargotin) pêk tê. Li ser rûyê dinyayê folklorê kurdî em dikarin bêjin ku cihekî girîng digire. Folklorê kurdî folkloreke gelekî dewlemend e.

Mehmed Uzun di derbarê sedemên dewlemendiya folklorê kurdî de wisan dibêje: “ Herwekî ku tê zanîn, kurd ne xelkekî xwenda û nivîskar e û ew baweriya xwe, ji kitêban bêtir, bi gotinê tîne. Loma jî kurdan di dewsa nivîsînê de, her tiştê xwe bi gotinê û bi dev veguhezandine hev. Ji her netewe û gelî bêtir, kurdan bawerî bi gotina devkî anîye û bi edebiyata devkî û folklorê ve girêdayî mane. Her lêger û xebata ku dê li ser edebiyata kurdî çêbe, divê xwe bigihîne edebiyata devkî û lê hûr be.”³ Ji bilî van sedemana, em dikarin şert û mercên erdnigariyê, jiyana civatê, qedexebûna zimên, koçerî û hwd., sedeman jî ji bona dewlemendiya folklorê kurdî rêz bikin.

Çîrokên ku neketine lîteraturê hêjayî xebate baş e. Çîrokên ku di nava Eşîra Şêxan de tîne vegotin û di nava gel de belav nebûne ji aliyê me ve hatin berhev kirin. Ji ber ku bîngeha xebata me li ser çîrokên Eşîra Şêxan hatiye avakirin, me jî bi awayekî berfireh, Eşîra Şêxan, çîrokên Eşîra Şêxan nirxandin. Gelek aliyên Eşîra Şêxan, çîrok û çîrokên Eşîra Şêxan, li gor armanca vê xebatê, bûne mijara lêkolîne.

¹Richard M. Dorson – W. J. Thoms, “William John Thoms ve ‘Folklor’ Başlıklı Yazısı”, *Millî Folklor Dergisi (Türk Dünyası Folklor Dergisi)* (wer. Serpil Aygün Cengiz), j. 36, Zivistan- 1997, r. 90.

²İngiliz, bnr. *H.b.*, r. 90.

³Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Çapa Sêyem, Weşanên Îthakî, Stenbol 2011, r. 30-31.

Ji ber ku derfetên tezê rê nadin, me hemû çîrok yekser negirtin nav vê xebatê. Ev xebat di riya xebatên di derbarê ‘Eşîr û folklorê de tenê gaveke piçûk e. Tu îdiaya (angaşt) vê tîzê tune ye ku hemû çîrokên neketine lîteraturê, derxe holê. Lê belê em bawer in ku ev xebat wê di derbarê ‘Eşîr û çîrokê de hin ramanan derxîne holê. Li gor çarçoveya xebatê çîrokên ku hatine nivîsandin hemû hetanî vê demê tu caran neketine lîteratura çîrokan. Di rêzkirina taybetmendiyên ‘eşîr û çîrokan de dibe ku hinek kêmasiyên me hebin, teqez dê hebin, em vê yekê ji mêj ve dipejirînin û lêborîna xwe dixwazin.

Me berê jî gotibû ku beşeke girîng ya folklorê kurdî çîrok in. “Kurd û çîrok, tu carî ji hevdu veneqetiyane. Gel derd û kulên xwe bi rêya çîrokê aniye zimên. Di nava Kurdistanê de war, kon, deşt, gom, jûr hemû warên çîrokane. Gelî hestên xwe, ramanên xwe bi hunera zimanê xwe rastine, bi vegotinê ew dewlemend kirine û kemilandine. Gelî bi hezaran çîrok rêzkirine ji bo wêjeya Kurdî. Çîrokên vê erdnigariyê, bi heşên gel, bi zargotinê xwe gihandiyê roja îro. Di çîrokê de zimanekî herikbar heye. Zimanekî rewan e û dil û heşê mirovî têr dike. Gel xwedî tûrikekî dagirtî ye, ev tûra bi zargotinê hatiye dagirtin û ji vegotinê re amade ye, em dikarin bibêjin ku zimanê çîrokê ji hêla tevnesazî û xeyalsaziyê ve jî di asta hunereke bilind de ye. Çîrok weke lorîkan mirov di xew re dibe û wek mamosteyan perwerdekar e. Damarên çîrokê xwe berdidin cuhokên zimên û bîra mirovî kûr dikin, zindî dihêlin. Çîrok ji ser rûpelan zêdetir, li ser zimanan e ango çîrok gerok e. Çîrok bi sebrê hatine honandin û derketine holê. Deriyê çîrokê ji herkesî re vekiriye.”⁴ Tê xweya kirin ku çîrok parçeyek ji jiyana kurdan e.

Armanca vê xebatê ew e ku, di derbarê hinek taybetmendiyên Eşîra Şêxan û di nava Eşîra Şêxan de bi sedan sala ye çîrokên ku tîne vegotin û lê qet nehatine nivîsandin were berhevkirin û li gorî daneyan gihiştina hin agahiya ne. Bingeha çîrokan jiyana civatê ye, di vê xebatê de, kêm be jî, em ê jiyana Eşîran di nava çîrokan de nas bikin. Çîrokên ku me di nava Eşîra Şêxan de berevkirine taybetmendiyên Eşîran di nava xwe de di hundurîne. Em vê rastiyê bi vî rengî dibînin: “Eşîra binî Zêdan, Siltan Hesên, Merdo Axa, Eşîra Ereban, xulam, konê

⁴ Bahoz Baran, “Ji Çîroka Bakur Çend Têbînî”, *Kovara W*, j. 47 Gulan-Pûşper, Stenbol 2013, r. 47.

donzdeh stûn û hwd.” li vê derê zelal xweya dike ku mijara çîrokan li gor jiyana civatê tê ye holê ango her çîrok kirasê civata xwe li xwe dike.

Yek ji armancên vê xebatê, di derbarê folklorê de dayina hinek agahiyane, di vê xebatê de, kêr be jî, di derbarê folklorê agahiyên girîng hatine dayîn. Lê ev xabata hemû folklorê nahewîne. Di nava folklorê de bi çîrokê ve sînorkirî ye.

Taybetmendiyeke vê xebatê ew e ku hemû çîrokên ku hatine nivîsandin ji her awayî de hûr hûr û bi metoda Propp hatiye tehlîlkin. Ê ku em dizanin heta niha li Bakur xebateke bi vî rengî nehatiye kirin .

Heta ku ji destê me hat di vê xebatê de me serî li ramanên pisporan û kesên ku xwe nêzîkî vê mijarê dibînin da. Dema ku me daneyên di derbarê Eşîra Şêxan û çîrokan de berhev dikirin, em li dehan gundan geriyên (Taşli, Begelî, Qizirelî, Bozq, Çiraxim, Ziyaret, Başbûk, Îsk, Çeteolox, Tehtok, Silûlî, Xirbê Mara, Deliqulî, Ziftîl û hwd.) û me bi dehan kesan re hevpeyvîn çêkir. Me ji fikr, raman û vegotinên van kesan sûd wergirt.

Aliyê diwartirîn yê xebatên folklorê devkî deşîfrekirina vegotinan e. Hemû vegotinên ku ji aliyê me ve hatine tomarkirin cardin ji aliyê me ve hatin deşîfrekirin. Dema ku me vegotin deşîfre kirin me qet destê xwe nedan gotinên gotinbêjan. Her çî bi tirkî, her çî bi erebî be an jî herêmî be me bêtir ku ji devê gotinbêjan derketine bi heman awayî nivîsandine. Heta ku ji destê me hat ev bêtir cuda me bi têbiniyan zelal kirine.

Bêjeya folklorê bi eslê xwe îngilîzî ye û ji bêtir “folk” (gel) û “lore” (zanist) pêk tê. Gotina folklorê cara yekem ji aliyê nivîskarê îngilîz William John Thoms ve hatiye bikaranîn. Ber bi nîvê duyemîn ê sedsala XIXan elmanan ji bona têtîna folklorê “volksunde”, îtalyaniyan jî têtîna “le tradîzonî popolarîya” bi kar dianîn.⁵ Lê niha bêjeya folklorê bi elmanî “ die folklore”, bi fransî “le folklore”, bi

⁵ Yuri M. Sokolov, *Folklor, Tarih ve Kuram*, (wer. Yürke Özer), Weşanên Geleneksel, Ankara 2009, r. 11.

îtalyanî “le folclore” bi îspanyolî “el folklore” tê bikaranîn.⁶ Li vê derê tê xweya kirin ku, hema hema li hemû parzemînên dinyayê gotina folklorê hatiye pejirandin û tê bikaranîn.

Celadet Bedîrxan di derbarê folklorê de dibêje ku “ Ev bêje di eslê xwe de îngilîzî ye. Lê îro ketiye hemû zimanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe.” Li gorî Celadet Bedîrxan “ folklor, bêjeyeke bihevketiye û bi mana zanîn an zanistiya xelkê ye.”⁷ Di hemû zaravayên Kurdî de ji bona zanista folklorê bêje hene. Bi kurmancî “zargotin” û “zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanistiya Şarî” tê bikaranîn.⁸

Remezhan Alan di derbarê folklorê de wisan dibêje:

“Zanista gel, hikmeta awan, xelqiyat, folklor an zargotin... Ev peyvên han, di destpêkê de parçe parçe ji bo çanda gel, ayînên mîtolojîk, adetên parastî, jiyana wehşiyên esîl, muzîk û reqsên gelerî, biwêj, qewl, destan, efsane û çîrokan dihatin bikaranîn. Wan berhemên ku xwe li ber bayê felekê girtine û beyî nivîsê heya îro hatine, îşaret dikirin. Berhemên ku di merhaleyên cihê cihê yê mirovahiyê de bi saya serê “gotin”ê şikl û şemalê dane xwe û piştê bi arîkariya hiş û guh mayînde bûne! Belê ev tev, niha di bin banê zanistekê de êwirîne. Rêça gavên folklorê, ji du sed salan kevintir e û ji sed salî zêdetir e jî li dinyayê di zanîngehan de (li Osloyê 1884) xwediyê kursiyên serbixwe ye. Wekî gelek bûyer û diyardeyan, wê jî tekamulek derbas kiriye. Êdî mirov dikare bibêje ku ew îro bûye zanistekê kamil.”⁹ Tê xweya kirin ku ji bona tekamuleke zanistî, ger dem bibore. Bi borîna demê re zanist, hedî hêdî tene ser heşên xwe û ji astekê şûnda ew zanista dikemile û dibe zanistekê kamil.

Hinek kes, ji bona folklorê bêjeyên mîna “xurafe”, “îtîqadên batil”, “baweriyên pûç” jî bikar tînin. Di xebatên pêşîn de (wek yê Thomas Browne, Jean Baptiste Thiers) gelek caran em pirtûkên bi navê, *kitêba xurefeyan*, *kitêba baweriyên*

⁶ Kadri Yıldırım-Ramazan Pertev-Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşana Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyê ya Zanîngeha Artûklûyê, Mêrdîn 2013, r. 11.

⁷ Celadet Bedîrxan, “Ferhengok”, *Hawar*, j. 30, Şam 1941, r. 16.

⁸ Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 11.

⁹ Remezhan Alan, *Folklor û Roman*, Weşanên Peywend, Stenbol 2013, r. 27-28.

pûç, lêkolîn li ser xeletiyên muşterek ên di nav gel de, dibînin. Ehmedê Xanî dema ku behsa çavkaniya pirtûka Mem û Zîn dike, dibêje: “*Hindek ji fesaneê di Bohtan / Hindek di behaneyên di buhtan.*” Kemal Fewzî ji bo berhevkirina çîrokan li nava gundan digeriya. Dema li nava gundan digeriya çîrokeke ji pîrejineke gundî guhdarî dike û ji vê çîrokê re dibêje xurafe.¹⁰ Li gorî Fewzî di serdemên berê de kurdan jî hinek tişt zanîbûn û bawerî bi hinek tiştan dianîn. Bêguman Kea, Rea, Hîra, Apollon, Mînrew, Zews ên kurdan jî hene. Merîfet ew e ku ev tiştana ji xeyalên kurdan were derxistin û bi awayekî zanistî li ber çavan bê raxistin. Fewzî dibêje, heta ku ji destên min were ez ê van xurefayên kurdan berev bikim û ez ê di nava rûpelên Jînê yê biqîmet de biweşînim. Ez ê bi vî awayî bêînsafiya “Kesekî Diyarbekirî”¹¹ nîşan bidim da ku ew kes efsaneyên xweşik ên kurdan dike malê “Dede Korkut”.¹²

Beriya ku nivîs tunebû mirovan an jî gelan hest, raman, bawerî û nêrînên xwe yê di derbarê rabirdû û dahatûya dinyayê de, li gorî jiyana, bawerî û nêrînên xwe bi riya vegotinê dianîn ziman. Ev formên vegotinê ji nîşekî derbasî nîşên din dibû û hetanî îro hatine. Ev formana îro wekî mîtos, efsane, destan, çîrok, çîrokên gelêrî, pêkenok, mamik, stran, gotinên pêşiyana lawik, lorîk tên binavkirin. Ev hemû cûreyana, ji aliyê folklorê ve li gorî prensîbên zanistî tene tesnîfkirin û tehlîlkin.¹³

Roja ku Xwedayê alemê mirov afirandin dinya bi van mirovana şên bûye. Kê zêde 3 milyon sal berê di çaxa paleolîtîka kevn (serdema keviran) de mirovan ji bo jiyana xwe berdewam bike, ji keviran alet çêkin. Li ser dîwarên şikeftan wêne çêdikin. Ev çaxa hemû qeşa bû, ji ber vê sedemê di vê çaxê de hilberîn tunebû. Mirovan bi nêçîrê û berhevkinê jiyana xwe didomandin. Mirov di şikeftan û qulêkên daran de dijîyan. Di çaxa paleolîtîkê de mirovan teşe dane keviran, kevir wekî kêran tûj kirine, ji keviran bivir çêkirine, bi van keviran sewal kuştine, goştên sewalan perçe kirine. Di serdema neolîtîka nû de qeşa heliya, avhewa hinekî nerm bû, mirov ji şikeftan derketin, ji xwe re gund avakirin, cotkarî kirine û

¹⁰ *H.b.*, r. 28-29.

¹¹ Ji “Kesekî Diyarbekirî” qest Ziya Gökalp e.

¹² Kemal Fewzî, “Kürd Masalları”, *Jîn*, V, (amd. M. Emin Bozarlan), Weşanên Deng, Uppsala 1988, r. 934-935.

¹³ Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 12.

pezxwedîkirine. Ev çalakîyên seretayî tevde bûne çavkaniyên zanîna gelan ku îro wekî folklorê tê binavkirin.¹⁴

Dîroka berhevkirina keresteyên folklorê pîrr kevn e. Di warê lêkolîna folklorê de nivîskarê yekem Pausanis (B.Z. sedsala II.) e ku wî li Yewnana Antîk, behsa jiyan û baweriyên welatê xwe kiriye. Navê berhema wî Perigosis Tes Ellades (Şayesa Yewnanîstanê). Di xebatên dîroknas Heredot (B.Z. 425) û di xebatên erdnîgarîvan Strabon (B.Z. sedsala I.) de agahiyên di derbarê gelan de hene. Di sedsala Xan de Îbnu Fazlan û Ebû Dulef; di sedsala XIIan de Marco Polo, di sedsala XIVan de Îbnu Batûta di seyhatnameyên xwe de behsa folklorê pîrr gelan kirine.¹⁵

Nimûneyên folklorê kurdî ne pîrr kevn in. Li gorî Tosinê Reşîd yekem numûneya folklorê kurdî di sala 1711an de ji aliyê Mêsrop Maştoş li Yêrevanê hatiye kirin ku ew di derbarê gotinên pêşiyên de ye.¹⁶

Folklor, bi pîrranî çandevaniya gelêrîye, paşmayînîyên kevn e, peydabûnên çandî û civakî ne û hemû berhemen folklorê devkî ne. Folklor çanda gelekî an jî hinek gelan dikole, paşê hinek nimûneyên cuda berhevdiye (nimûneyên ku ji aliyê herkesî ve hatibe pejirandin), dawîya dawîn ji van daneyana sentezekê amade dike¹⁷

Ji bona mijar û naveroka folklorê mirov nikare sînorekî deyne. Ji ber ku naveroka folklorê pîrr fireh e. Li gorî Proop mijara folklorê berhemen çandî ne, ev berhema yan ên welatekî ne yan jî yên neteweyekî ne. Folklor van berhema li gorî metodên xwe berhev dike, paşê ev berhemen hatine berhevkirin disinifîne (Stran, çîrok, gotinên pêşiyên hwd.) û li dawiyê sentezekê derdixe holê.¹⁸ Zimanzanê kurd Celadet Bedîrxan di kovara Hawarê de naveroka folklorê bi vî awayî radixe ber çavan: “ Folklor tevahiya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê derketine û di dora nivşan de bi ser ve ketine û gihastine nivşên nû.”¹⁹

¹⁴ Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 16.

¹⁵ Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 16.

¹⁶ Alan, *h.b.*, r. 40.

¹⁷ Doğan Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weşanên Akçağ, Ankara 2007, r. 327.

¹⁸ Vladimir Proop, *Teori ve Tarih*, Weşanên Awesta, Stenbol 2001, r. 15.

¹⁹ Bedîrxan, *h.b.*, r. 16.

Me berê jî gotibû ku ji naveroka folklorê re sînor diyarkirin karekî zehmet e. Li gorî me naveroka folklorê ji van mijarana pêk tê. (Mirov dikare li ser vana hinek tiştên din jî zêde bike)

Çîrok	Gotinên pêşiyên
Pêkenok	Destan
Lorîk	Tiştanok
Mamik	Zûgotinok
Jimartok	Lihevanînok
Şabûnok	Biwêj
Beytbêjî	Nifir
Dengbêjî	Çîvanok

Ji bona danberhevê em li vê derê sinifandina Alan Dundes jî bidin wê mijar hebekî din baş were fêmkirin. Dundes lîsteyeke dirêj dijmêre, paşê dibêje, ya rast ew e ku ev lîsteya hemû celebên folklorê nahundurîne. Li gorî Alan Dundes di naveroka folklorê de ev mijarana hene.²⁰

Mît	Efsane	Dijûn	Sond
Çîrok	Çîrvanok	Rakirina piyaleyan	Zûgotinok
Gotinên pêşiyên	Mamik	Hunera gel	Cil û berg
Stran	Efsûn	Baweriya gel	Stranên gel
Pîrozandin	Nifir	Şibandinên gel	Lîstik
Heqaret	Devavêtin	Sembol (dîrefş)	Rojbûn
Silav	Xatirxwestin	Serê salê	Cejn
Reqs gel	Şanoya gel	Salixdana xwarinan	Bîr û bawerî
Lorî	Zimanê gel	Modelên lihêvan	Neqşên lihêvan
Etîmolojîyên gel		Nivîsên mezalan	
Mecaz û Navên gel (leqeb-navlêk)			
Tîpên mal, embar û çîtan			

²⁰ Alan Dundes, "Folklor Nedir", *Millî Folklor Dergisi (Türk Dünyası Folklor Dergisi)* (wer. F. Gülay Mirzaoğlu), j. 36, Zivistan- 1997, r. 76.

Tê xweyakirin ku mijarên folklorê pîrr zêde ne. Ev zêdebûna ji folklorê re ne kêmasî ye tersane dewlemendiya folklorê li ber çavan radixe.

Li Tirkiyeyê, Pertev Naili Boratav (Mustafa Pertev) û Sedat Veyis Örnek ji bona naveroka folklorê bi tirkî lîste amadekirine. Nail Tan jî di derbarê naveroka folklorê tirkî de lîsteyeke pîrsan amade kiriye. Lê mixabin di warê folklorê kurdan de Herçîqas Heciyê Cindî, Celîlê Celîl, Mihemed Tewfîq Wirdî, Sadiq Behaeddîn Amêdî, Alaadîn Seccadî, Mihemed Mukrî, Seydayê Tîrêj, Îzeddîn Mistefa Resûl, Şukriyê Resûl Îbrahîm, Mehmet Emin Bozarslan û gelek folklorên din xebat kiribine jî heta vê demê lîsteyek folklorê kurdî nehate amadekirin.²¹ Hewceye ku xebatkar an jî xemxurên folklorê kurdî di demeke nêz de lîsteyeke naveroka folklorê kurdî amade bikin. Folklorê kurdî pîrr dewlemend e, ev gencineya hewceyî mifteyê ye, ew mifteya jî xebateke birêkûpêk e.

Herçîqas lîsteyeke folklorê kurdî tunebe jî di derbarê folklorê de di nava kurdan de pîrr behrem derketine holê. Çend mînak ji van behemana ev in:

Li Tirkiyeyê²² :

Nivîskar: Mehmet Kömür
Berhem : Taw Dilo
Çap û dem: Stenbol, 2003

Nivîskar: Çiya Mazî
Berhem : Ferhenga Gotinên Pêşîyan
Çap û dem: Stenbol, 2005

Nivîskar: Mehmet Öncü
Berhem : Çîrokên Kurdan
Çap û dem: Stenbol, 2009

Nivîskar: Hilmi Akyol
Berhem : Antolojiya Dengbêjan 1-2
Çap û dem: Amed, 2011

²¹ Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 31.

²² Tekin Çifçi, *Kilam û Jin*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2014, r. 49-50.

Li Sûriyeyê:

Nivîskar: Camîî Kenna
Berhem : Amthal Kurdiyya
Çap û dem: Heleb, 1957²³

Nivîskar: Cegerxwîn
Berhem : Gotinên Pêşîyan
Çap û dem: Şam, 1957²⁴

Nivîskar: Cemil Kunneh
Berhem : Terîbû Hîkemin we Emsalin Kurdiyye
Çap û dem: 1958²⁵

Li Îranê²⁶:

Nivîskar: Qadir Fettah Qadî
Berhem : Emsal û Hîkem dê Kurdî
Çap û dem: Tebrîz, 1365

Nivîskar: Seyîd Ebdulhemîd Secadî
Berhem : Pendê Pişîniyan
Çap û dem: Urmiye, 1369

Nivîskar: Îbrahîm Efxemî
Berhem : Bineretî Metelî Kurdî
Çap û dem: Tebrîz, 1368

Nivîskar: Elî Rexzadî
Berhem : Guwarî Kurdewarî
Çap û dem: Senendec, 1382

Li Iraqê:

Nivîskar: Merûf Çiyawok
Berhem : Hezar Bej û Pend
Çap û dem: Bexda, 1930²⁷

Nivîskar: Îsmâîl Heqî Şaweys
Berhem : Qise-î Pêşînan
Çap û dem: Bexda, 1933²⁸

Nivîskar: Îzedîn Mistefa Resûl
Berhem : Adabî Folklorî Kurdî
Çap û dem: Bexda, 1970

Nivîskar: Umer Şeyxullah Diştkî
Berhem : Pendî Kurdî
Çap û dem: Hewlêr, 1972²⁹

²³ Viladîmîr Mînorsky-Thomas Boîs, *Kürt Milliyetçiliği*, Weşanên Örgün, Stenbol 2008, r. 184.

²⁴ *H.b.*, r. 184.

²⁵ Çifçi, *h.b.*, r. 51.

²⁶ Çifçi, *h.b.*, r. 52.

²⁷ Mînorsky-Boîs, *h. b.* r. 183.

²⁸ Mînorsky-Boîs, *h. b.* r. 183.

²⁹ Çifçi, *h.b.*, r. 53.

Li Qafqasyayê:

Nivîskar: Heciyê Cindî	Nivîskar: Heciyê Cindî
Berhem : Folklor Kurmanca	Berhem : Hikayeta Cimeta Kurda (6. Cild ³⁰)
Çap û dem: Yêrîvan, 1936 ³¹	Çap û dem: Yêrîvan ³²
Nivîskar: Casimê Celîl	Nivîskar: Eskerê Boyik
Berhem: Kilamên Çiya	Berhem: Li Çiya
Çap û dem: Yêrîvan, 1970 ³³	Çap û dem: Yêrîvan, 1991 ³⁴

Li Ewropayê:

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar	Nivîskar: Şerefxan Cizîrî
Berhem: Xwençe	Berhem: Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon
Çap û dem: Stockholm, 1989 ³⁵	Çap û dem: Stenbol, 2011

Nivîskar: Rohat Alakom
Berhem : Di Folklor Kurdi de Serdestiyeke Jinan
Çap û dem: Stenbol, 2013³⁶

Li Ser Folklor Kurdi Xebatên Biyaniyan³⁷:

Nivîskar: H. Makas	Nivîskar: E. Lescot
Berhem : Metnên Kurdi	Berhem : Metnên Kurdi ³⁸
Çap û dem: Lenîngrad, 1926	Çap û dem: Paris, 1940

³⁰ Bi rêz ev cildana di van salan de hatine çapkirin: 1961(I), 1962(II), 1969(III), 1980(IV), 1988(V), 2005(VI)

³¹ Goran Candan, "Heciyê Cindî : Jiyan û Kar", *Nûbihar*, j. 126, Zivistan, Stenbol 2014, r. 60.

³² *H.b.*, r. 60.

³³ Paşa Amedî, "Malbata Casimê Celîl", *Nûbihar*, j. 126, Zivistan, Stenbol 2014, r. 63.

³⁴ Rahmetullah Karakaya, "Eskerê Boyik: Şûrê Destê Şervanê Me, Zimanê Me ye", *Nûbihar*, j. 126, Zivistan, Stenbol 2014, r. 44.

³⁵ Ev berhema 10 cild in. Cilda yekem di sala 1989an de hatiye çapkirin. Çapa van berhemana niha tune ne, li gor gotina nivîskar wê di demeke kin de ji nû ve were çapkirin.

³⁶ Çapa yekem a vê berheme li Stockholmê di sala 1994an de hatiye çapkirin.

³⁷ Minorsky-Bois, *h.b.* r. 182.

³⁸ Ev berhema du cildin dilda yekem di 1940î de li Parisê, cilda duyem di 1942yan de li Beyrûdê hatiye çapkirin.

Nivîskar: Bazil Nîkîtîne

Berhem: Ji koleksiyona min Çend Çîrokên Kurdî

Çap û dem: ?, 1926

1. BEŞA YEKEM (FOLKLOR Û ÇÎROK)

1.1. Dewlemendiya Folklorê Kurdî

Çanda kurda gelekî dewlemend e û kurd bi çanda xwe ya dewlemend ser bilind in.³⁹ Di çanda kurdî de ya pêştirîn jî zargotin e. “Me got nivîs têr nake; ji ber ku di nivîsê de deng tune, nivîs li hemberî zimên kêr e.”⁴⁰ Ji bilî vê rastiyê :“ Ziman ewqasî bi deng ve girêdayî ye ku di tevayê dîrokê de ji nav hezaran ziman, hew 106 heb bi qeysa ku wêjeyekê hilberînin bi nivîsê re ketine têkiliyê, di nava van zimanan de qismekî wê qet nehatiye nivîsîn. Niha 3000 ziman pê tê peyivîn lê ji van zimanan bi tenê yên 78an wêjeya wan hene.”⁴¹

Li ser van agahiyan em dikarin bibêjin ku hîmê wêjeya nivîskî, wêjeya devkî ye. Li hemû cîhanê mînakên wêjeyê yên pêşiyê devkî ne. Paşê ji aliyê hin kesan ve ev mînakên devkî hatine berevkirin û paşê hatine nivîsandin ango paşê bûne nivîskî. Neteweyên mîna ereb, faris, îngiliz, tirk berhemên xwe yên devkî, ji demekê şûnda kirine nivîskî. Em dikarin kurdan jî ji van neteweyan bihesibînin.

Em dikarin li vê derê pirseke bi vî rengî bikin. Gelo di nava kurdan de kîjan wêjeya (wêjeya devkî yan jî wêjeya nivîskî) bi hêz e û pêşdeçûyî ye? Bersiva vê pirsê bi vî rengî be ez bawer dikim ku wê ne şaş be. Ji ber bê dewlet bûn, zor, zilm û zordariya hêzên derveyî welêt, ‘eşîrtî, jiyana civakî, tunebûna perwerdeyê, koçerî, pevçûn û hwd. kurdan tu caran nikarîbûn wêje, çand û zimanê xwe pêş de bibin. Ji ber van sedeman di nava kurdan de wêjeya devkî li gorî ya nivîskî hîn zêde bi hêz e û hîn zêde pêşketî ye.

Digel van sedemana W.R. Hay dibêje ku gelê kurd bi piranî xwedî jiyaneke belawela ne ji ber vê sedemê wêjeya nivîskî pirr pêş de neçûye û ev jî rewşeke misoger e.⁴²

³⁹ Abdurrahman Qasimlo, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Awesta, Stenbol 2009, r. 48.

⁴⁰ Hesenê Dewrêş, “Di Hin Berhemên Kurdî de Şopên Çanda Devkî”, *Kovara Zarema*, j. 1 Gulan, Stenbol 2014, r. 60.

⁴¹ Walter J. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür, Sözlün Teknolojileşmesi* (wer. Sema Postacıoğlu Banon), Çapa Çarem, Weşanên Metîs, Stenbol 2013, r. 15-23.

⁴² William Rupert Hay, *Kürdistan'da İki Yıl 1918-1920*, Weşanên Awesta, Stenbol 2005, r. 47.

Hem kurdên xwende hem jî kesên biyanî, ku wek rêwî, dîplomat, mîsyoner, rojhilatnas, zanyar, leşker yê riya wan bi welatê kurdan ketine gotina me ya jorê ya di derbarê hêz û pêşketina wêjeya devkî di (folklor) piştrast dike. Ev kesana bi hêzbûn û pêşketina zargotin an jî wêjeya devkî ya kurdan bi zelalî anîne zimên. Em dikarin di vî warî de bi sedan mînakên bidin lê ji ber ku em gotinê dirêj nekin em ê bi çend mînakên tenê vê rastiyê li ber çavan raxin.

Prof. Qanadê Kurdo di derbarê dewlemendiya folklorê kurdî de hestên xwe wisa tîne zimên: “ Di dîroka peydabûn û geşedana edebiyata Kurdî de zargotina cîmaetê (çîrok, hikayetên tarîxî, serhatî û serpêhatiyên mirovan, beyt û kilam) kaniya edebiyata kurdî ye.”⁴³ Prof. O. Vilcevsky dibêje ku folklorê kurdî “pirole dewlemend e” û vê rastiyê her tim di xebatên xwe de tîne zimên.⁴⁴ Bois jî dibêje: Ji ber ku perwerdehiya dibistanê di nava kurdan de kême, dewlemendiya zargotina kurdan bi ber çavê mirovan dikeve.⁴⁵

Nimûneyên ku ji gotinên zarbêjan (ên kurd) hatine girtin di hinek cihan de kardar û kêrhatî ne û di wî karî de di ser çîroknivîsên Îtalyayê yê sedesala XVan re ne.⁴⁶

Di warê edebiyata kurdî de, ji bo kesekî lêger, tiştê herî balkêş, dewlemendiya bêhed a folklorê ye.⁴⁷

Afirînerê zargotina kurdan cara ewil gundî û cotkar in, ên ku di şevên dirêj yê zivistanê de li odeyan berev dibin û distirên û dibêjin. Di nava wan de gelek dengbêjên profesiyonel, aşiq û çîrokbêj hene. Dengbêj bê zurne, bê tembûr distirên, lê aşiq li tembûrê dixin û pêra dibêjin. Di nava Sovyetê de aşiq û zanyarên zargotina

⁴³ Qanadê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Stenbol 2010, r. 28-29.

⁴⁴ Mînorsky-Bois, *h. b.*, r. 182.

⁴⁵ Viladîmîr Mînorsky-Thomas Bois-D. N. Mac Kenzîe, *Kürtler ve Kürdistan*, Çapa Duyem, Weşanên Doz, Stenbol 2004, r. 169.

⁴⁶ Î. A. Orbelî, *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane*, (amd. Sinan Hakan), Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011, r. 81.

⁴⁷ Bazil Nikitin, *Kürtler*, Weşanên Deng, Diyarbakır, 2013, r. 445.

kurdan ne bi tenê ji aliyê millet têne hezkirin, lê zanebûn û me'rîfeta wana ji aliyê hukumetê jî bilind tê qîmet kirin.⁴⁸

Zanyarê ermenî Xaçatûr Abovyan dinivîse: Poêzya (zargotin) gelê kurd wisa pir pêş ketiye, wisa dewlemend bûye ku her kurdekî em dikarin wek helbestvan bicibînin. Ew pir serwext in.⁴⁹

Mînorskî dibêje ku, kurd xwediyê wêjeyê gelerî ya pirr dewlemend e. Li bal kurdan çîrok, destan, stran pirr in.⁵⁰

Serbazek bi navê F. Mîlîgîn dibêje ku: “Li welatên pêşdaçûyî, ji bo ajotina heywên şiv û qamçiyên didine xebatê. Lê li Kurdistanê tu pêwîstî tune ye bi wan li heywên xîn. Li vira dewsa qamçî sazbandî tê xebatê û ew yek gelekî sade û rehet tê kêranîn. Merivê kurd li ereba xwe siyar dibe û gava kilama xwe dest pê dike, gamêşê wî pê ra- pê ra dilivin. Gava erebeçî dixwaze gamêşa bide sekinandin, nastirê gamêşê disekin. Eva hunerekî wisa ne, ku li dinyayê cihekî wisa tune ye, li vira kilam û miqam di nava karê gundîtiyê de têne bikaranîn.⁵¹ Tê xweyakirin ku folklorê kurdî pirr dewlemend e. Lê belê ev dewlemendiya ger bi rêk û pêk û bi rêbazên zanistiyê li ber çava were raxistin.

Ji bo xebatên zanistî ger folklorê kurdî were sinifandin. Di warê sinifandina folklorê kurdî de xebateke biqîmet hatiye kirin. Li gorî vê xebatê beşên folklorê kurdî wiha hatiye rêzkirin.

1.1.a. Edebiyata Gelerî

1. Destan
2. Menqibeyên dînî û tesawifî
3. Dengbêjî

⁴⁸ Ordîxanê Celîl-Celîlê Celîl, *Zargotîna Kurda*, I, Çapa Sêyem, Weşanên Aram, Amed 2013, r. 11-12.

⁴⁹ Heciyê Cindî-Emînê Evdal, *Folklorê Kurmanca*, Çapa Yekem, Weşanên Avesta, Stenbol 2008, r. 27.

⁵⁰ *H. b.*, r. 27.

⁵¹ *H. b.*, r. 27-28.

4. Çîrokên gelêrî
5. Çîrçîrok/ Xeberoşk
- 6 . Pêkenokên gelêrî
7. Gotinên pêşiyên û Biwêj
8. Kîlam û stranên gelêrî
9. Qewlerk/ Dûrik
10. Mamik/ Tiştanok
11. Zûgotinok/ Çîvanok
12. Lawik/ Zêmar
13. Lorîk
14. Stranên zarokan
15. Keresteyên ziman (argo/zimanê qeteniyan an zimanê girdegewran)
16. Nifir, niyaz, dia
17. Lîstikên temaşeyî yên gelêrî
18. Lîstikên şahî û werzîşê
19. Şanoya gelêrî
20. Lîstikên zarokan⁵²

1.1.b. Adet û Tore

1. Adet û rewresmên karkirinê
2. Rojên taybet (Cejn, rewresm û pîrozbahî)

⁵² Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 143.

3. Rewresmên saziyên civakî yên berê
4. Jidayikbûn
5. Navlêkirin
6. Navên kurdî
7. Zewac û dawet
8. Sinetkirin
9. Mirîveşartin Şîn/Taziye
10. Rabûn û rûniştina kurdewarî (Pêşwazîkirin, birêkirin)
11. Têkiliyên merivantî û cîrantiyê⁵³

1.1.c. Bîr û Baweriyên Gelêrî

1. Baweriyên di derbarê sirûştê de (Ba, baran, brûsk, erdhêj û hwd.)
2. Baweriyên di derbarê ajal û rihekan de
3. Baweriyên di derbarê laşê mirovan de
4. Baweriyên di derbarê hêzên awarte (Xwedê, cin, pîrhewok, şeytan û hwd.)
5. Baweriyên di derbarê kesên naskirî de (Xocê Xizir, Duzgin Baba û hwd.)
6. Kiramet, tirbe û cihên ziyaretê⁵⁴

1.1.d. Zanyariyên Gelêrî

1. Nexweşî û bijîjkiya gelêrî
2. Beydariya gelêrî
3. Zanyariya dar û giyayên şîfabexş

⁵³Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 144.

⁵⁴Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 144.

4. Stêrknasiya gelêrî
5. Meteorolojiya gelêrî
6. Zanyariya erdnîgariyê
7. Fehl, sêhr, şîroveyên xewnan
8. Baweriyên der bareyê pêkhatina ajal, rihek, û maddeyên sirûştî de
9. Xwarin û vexwarin⁵⁵

1.2. Beşek ji Folklorê Kurdî: Çîrok

Çîrok, cureyek ji folklorê kurdî ya devkî ye. Çîrok ji aliyekî de hînkariya in, ji aliyekî de mirovan difikirîne, ji aliyekî jî şîretkar in. Di çîrokan de bi piranî kes/leheng (carcaran lengên çîrokan ajal in) derasayîne, xwedî hêzên dijaqil in. Mijara çîrokên kurdî xeyalî ne ango tiştên ku nehatine bihîstin mijara çîrokên kurdî dinexşîne. Herçiqas mijara çîrokên kurdî xeyalî be jî cardin bingeha xwe ji jiyana civaka kurd girtiye û li ser êş, azar, kul, serpêhatî, xewn û xeyalên civaka kurd hatine ristîn. Çîrok, di şevên zivistanan de li ser lêvên çîrokbêjan bi sedan sala ye rêwitiya xwe didomîne, ji nişkekî digihêje nişkekî din û bi vî awayî hetanî îro hatine.

Bêjeya “çîrokê” cara yekem di sala 1893yan de di ferhengeke Kurdî-Erebî de hatiye bi kar anîn. Navê ferhengê El –Hediye el H’emîdiye fî el –Lugat el Kurdiye ye û ji aliyê Yusuf Ziya Paşa el Xalidî el Meqdîsî ve hatiye nivîsandin. Li Stenbolê hatiye çapkirin.⁵⁶

Kurd bi saya serê lehengên kilaman û çîrokan hêvî û hestên xwe tînin zimên.⁵⁷ Di nava kurdan de navê çîrokê hinekî bi pirsgirêk e. Ji ber ku li şûna peyva çîrokê carcaran serpêhatî, serhatî, kurteçîrok⁵⁸, çîrçîrok, çîrvanok, xevrîşok, mesele, qewimîn, metelok, xeberoşk û hwd. têne bikaranîn, ev jî di navlêkirina çîrokê de

⁵⁵ Yıldırım-Pertev-Aslan, *h.b.*, r. 144.

⁵⁶ Haşîm Ahmedzade, *Ulus ve Roman*, (Wer. Azad Zana Gündoğan), Weşanên Pêrî, Stenbol 2004, r. 190.

⁵⁷ Salih Kevirbirî, *Yirmi Olay, Yirmi Kılam Kürt Halk Türkülerinden Seçmeler*, (wer. Mazlum Doğan), Weşanên Ewrensêl, Stenbol 2004, r. 10.

⁵⁸ İrfan Babaoğlu, “Kurteçîrok Hestên Kurdan in” *Kovara W*, j. 47 Gulan-Pûşper, Stenbol 2013, r. 52.

aloziyê derdixê holê. Di vî warî de ev bû çend sale nîqaş têne kirin. Em ê çend nîqaaşên di vî warî de li vê derê rêz bikin.

Antolojiya çîrokên kurdî li bakur cara yekem ji aliyê Firat Cewerî ve hatiye amadekirin. Cewerî di bin sernava çîrokê de, di derbare çîrokê de wisa dibêje:

“Tê wê manê ku ez niha, di dema îro de, ji bo vê şeweyê hunerê gotinê ‘çîrok’ an jî mîna kurmancên jêr dibêjin ‘kurteçîrok’ dipejirînim û loma min ev nav bi kar aniyê. Di kovar û rojnameyên mîna Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-1945), Roja Nû (1943-1946), Hêwiya Welêt (1963-1965), Çiya (1965-1970), Hêvî (1983,1992) û gelek kovarên kevin û nû de navê ‘çîrokê’ hatiye bikaranîn. Heta di kovara Rojî Kurd (1913) de Fûad Temo ku heta niha mîna çîroka kurdî ya pêşî dihat qebûlqirin, di bin sernava ‘çîrok’ de hatibû weşandin. Kurdên Sovyeta berê ji ‘çîrokê’ wêdetir, bêjeya ‘serhatî’ bi kar anîne. Bêjeya serhatî, çîrok, kurteçîrok, serpêhatî, serborî her maneya ‘story’ an jî ‘short story’ a îngilîzî dide ku tê maneya çîroka me. Digel vê jî, bi taybetî piştî salên 1990î, li ser hin kitêbên çîrokan, an jî di hin kovar û rojnameyan de ji berdêla ‘çîrok’ bêjeya ‘novel’ hat bi kar anîn û li ser vê gotinê carina devjengî çêdibe.”⁵⁹

Piştî van agahiyan Cewerî, gengeşî ya di derbarê çîrokê de di hin zimanên din de jî heye dibêje û di zimanê tirkî û zimanê swêdî de hinek mînakên dide. Piştî van agahiyan wisa berdewam dike:

“Lê ev jî rastiyeke ku gotina ‘çîrok’ ji aliyê gelek kesan mîna ‘masal’ a tirkî, an jî ‘saga’ ya swêdî tê fêhmkirin. Li gelek deverên Kurdistanê kurd ji ‘masal’ re jî dibêjin ‘çîrok’. Lê li hin deveran jî bêjeya ‘çîrçîrok’ heye ku ev gotin di kovara Hawarê⁶⁰ de jî hatiye bi kar anîn. Herçiqas ‘çîrok’ û ‘çîrçîrok’ li hin deveran were eynî maneyê, an jî mirov tu ferqê nexê navbera van herdu terman, lê di jiyana rastî de ev bi awayekî zelal ji hev vediqetin. Di jiyana rojane de, di danûstandinên civakî de gotina ‘çîrok’ di zimanê gel de pirr tê bi kar anîn. Gava yek ji yekî re behsa jiyana xwe an jî behsa jiyana hinên din bike û yê ku jê re tê behs kirin hê jî bipirse, yê ku

⁵⁹ Firat Cewerî, *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)*, I, Weşanên Nûdem, Stenbol 2003, r. 34.

⁶⁰ Di hejmarê 11em de ‘Çîrçîroka Bîngolê’ derbas dibe.

behs dike dibêje ‘ çîroka wan dûr û dirêj e’, an jî ‘ ev çîrok dirêj e’, an jî ‘ev çîrokeke dûrûdirêj e’.”⁶¹

Di mijara folklorê de xwedî cihekî girîng birêz Rohat Alakom di derbare vê mijarê de ramanên xwe wiha tîne zimên:

“Di nav folklorê kurdî ya devkî de dewlemendiyeke herî mezin bêguman çîrok in. Çîrok beşeke folklorê ye, nivîskarên wan ne kifş in, gel bi xwe ev berhem afirandine. Carcar di weşanên peryodîk de, peyva çîrok li şûna serpêhatiyan (kurteçîrok) tê bi kar anîn, lê belê ev yeka ne rast e. Ji ber ku nivîskarên serpêhatiyan kifş in. Serpêhatî berhemên nûjen in, bi tehr û naveroka xwe ve ji çîrokan gelek cuda dibin. Hin nivîskar û lêkolanan li şûna çîrok hikayat bi kar anîne. Ev yeka di warê navkirinê de tevliheviyeke mezin di zimanê kurdî de peyda dike. Carcar van herdu berhemên re jî çîrok tê gotin. Pêwîst e ev pirsê termînolojiyê bê çareserkerin û divê her tişt di cihê xwe de rûne.”⁶²

Ramazan Pertev di vî warî de dibêje ku: “Di her lehçe û di diyalekta zimanê kurdî de çîrok zêdetir berfireh bûye û di nava gel de zêdetir tê bi kar anîn, min jî di berhema xwe de navê çîrokê bi kar anî, di maneya ‘masal’ a tirkî de.”⁶³

Ayhan Gevêrî di Antolojiya Çîrokên Nûbiharê de dibêje: “Edebiyata kevin ya Kurdî gelek dewlemend bû, lê edebiyata nûjen hema em bibêjin van salên dawî ligel nivîsê ve muşerref û nasyar bûye. Wêca ev ‘dewrê transê’ ku di navbera edebiyata devkî û ya nivîskî de ye û hêj jî tesîra wê dewam dike, wekî gelek tevliheviyan meseleya ‘çîrokê’ jî bo me kiriye çîrok û mesele. Jixwe li cem me kelîmeya ‘çîr’ ku koka çîrokê ye, bi maneya ‘meselê’ ye û hêj jî mîsalên dihête gotin “Çîra wî gelek dirêj e.”⁶⁴

Di vê mijarê de ramanên Zeynelabidîn Zinar bi vî rengî ne: “Di rastiyê de berhemên gelêrî yên wekî ‘çîrok’ û ‘çîvanok’ ji hevdu zêde bûne. Lê di navbera wan

⁶¹ Cewerî, *h.b.*, r. 35-36.

⁶² Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, Çapa Duyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2013, r. 15.

⁶³ Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedogojîya Kurdî)*, Weşanên Doz, Stenbol 2009, r. 89.

⁶⁴ Ayhan Gevêrî, *Antolojiya Çîrokên Nûbiharê*, Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2008, r.12.

de ev ferq heye; di bingeha çîrokê de hîkayeke rasteqîne heye û ev di nava gel de hingî hatiye vegotin wekî şiklî hin gûherîn çêbûye. Bonimûne di hin çîrokan de em rastî navên padişah, qral, sultan têne. Ji van navan kêma zêde em texmîn dikin ev çîrok di kîjan zemanî de derbas bûye..., lê di çîvanokan de bûyereke rasteqîne nîne. Fantazî û pêşnumayên xeyalî hene ku ne diyar e ji layê kî ve hatine afirandin. Li hin herêmên Kurdistanê bo çîvanok, ‘çîrvanok, çîrçîrok, xeberoşk’ jî tete gotin.⁶⁵

Di vî warî de Hasan Kaya dibêje ku: “Wexta ku em biçûkbûn dayik û pîrikên me ji me re hinek tişt vedigotin, em ji wana re ‘çîrok’ an jî ‘çîrçîrok’ dibêjin.⁶⁶ Hinek kes çîrokê li şûna serpêhatiyan tîne bikaranîn.⁶⁷ Şerefxan, ji bûyerên dîrokî re dibêje çîrok û wî navê xebata xwe ya di derbarê dîrokê de kiriye, ‘Çîroka Hukumdarên (hokkam) Kurdistanê.⁶⁸ Carcaran serpêhatî (li vê derê serpêhatî di wateya ‘hîkaye’ ya tirkî de ye) jî di bin navê çîrokê de cih digire û hinek pirtûk bi navê ‘Çîroka jiyana min’ hatine çapkirin.⁶⁹ Hinek kes jî destanan wekî çîrok dihesibînin, yek ji wan kesan jî Roger Lascot e. Lascot wiha dibêje: “Mîrê ku Mişo di çîroka Memê Alan de wek Ezdîn bi nav dike, xuyaye ku yek ji wan herdu Mîr Ezdînan e ku navê wan di kronolojiya dîrokê de dibore.”⁷⁰ Destana Kela Dimdimê jî ji aliyê hinek kesan ve wek çîrok tê binavkirin û di derbarê vê de dibêjin: “Bûyerên Kela Dimdimê jî wek çîrokên devkî derbasî nav edebiyata kurdan bûne.”⁷¹ Jan Dost destana Mem û Zîn wek çîrok dihesibîne û dibêje: “Ev nav di çîroka Mem û Zînê de du caran derbas dibe.”⁷² Tevliheviya di navê destan û çîrokê di Destana Şerrê Kundan û Qijikan de jî tê pêşberî me û di vê berhemê de gotineke wisa derbas dibe: “Ev berhema me ya bi navê ‘Destana Şerrê Kundan û Qijikan’ ... Bingeha vê çîrokê min ji pirtûka Beydebayê Hindî ya bi navê Kelîle û Dimne ji beşa ‘Kundan û Qijikan’

⁶⁵ Zeynelabidîn Zinar, Axaftina di panela kurd-kavê de ya li ser “Folklorê Kurdî û Hunera di Folklorê de”. 2006. (nql. Pertev, h.b., r. 89.)

⁶⁶ Hasan Kaya, *Kürt Öykü Antolojisi*, Weşanên Ewrensêl, Stenbol 2005, r. 7.

⁶⁷ Haşîm Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, (wer. Fahriye Adsay), Weşanên Awesta, Stenbol 2011, r. 141.

⁶⁸ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, (wer. Ziya Avci) Çapa Sêyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2007, r. 12.

⁶⁹ Hans Christian Andersen, *Çîrok û Serpêhatî*, (wer. Ezîzê Gerdenzerî), Weşanên Doz, Stenbol 2011, r. 9.

⁷⁰ Roger Lascot, *Memê Alan*, Çapa Duyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2010, r. 10.

⁷¹ Casimê Celîl-Emerê Celalî, *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011, r. 8.

⁷² Exmedê Xanî, *Mem û Zîn*, (Şîrove û Kurdiya Îro. Jan Dost), Weşanên Awesta, Stenbol 2010, r. 45.

wergirtiye.”⁷³ Li aliyê din tişteki hîn cuda heye ku ew jî çîrok weke kilaman ji aliyê hin dengbêjan ve têne gotin:“ Çîrokên ku di vê pirtûkêde ne, ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin û hîna jî tên gotin.”⁷⁴ Li vê derê, bi awayekî zelal diyar e ku gengeşiyên li ser gotina ‘çîrokê’ cûrbecûr in. Divê di vî warî de lihevhatinek were çêkirin û li gor vê lihevhatinê gotina ‘çîrokê’ were bikaranîn.

Li vê derê ger em bipirsin gelo me ji bona çî gotina çîrokê pejirand? Bikaranîna peyva çîrokê di nava gel de, ji hemû bi navkirinên din (çîrçîrok, serpehatî hwd.) zêdetir tê bi kar anîn û zêdetir tê naskirin. Dema ku behsa çîrokê tê kirin di xeyalên gel de tişteki diyar peyda dibe. Ango dizanin wê behsa çî were kirin. Ji ber van sedemana me jî gotina çîrokê pejirand û me ev gotina çîrokê di wateya ‘masal’ a tirkî de bi kar anî.

Bi gelemperî naveroka çîroka Kurdî gelekî dewlemend e. Motîfên cûrbicûr û efsûnî derdikevin pêşberî me. Qesrên li ser ewran, bajarên heft tebeqan di binê erdê de, hûtên wekî çiyayan bilind, keçikên pêriyan, postên efsûnî, hewzên nemiriyê, beranên qemer yên dûvên wan wekî zinaran mezin, qehremanên birim, kevirên biefsûn, ajalên rê û rêberiyê nîşanî mirovan didin û her wekî din tiştên ecêb di çîrokan de cihê xwe yên taybet digirin.

Çîrok, dema ku mirov hate afirandin derketiye holê, mêjûyê çîrokê biqasî dîroka mirovahiyê dîrûdirêj e. Herçiqaş di vegotinê de hinek cudahî hebin jî çîrok hebûna mirovahî ya hevpar e. Naveroka çîrokeke swêdiyan dişibe yan ‘ereban, çîrokeke îskoçan dişibe yan kurdan, çîrokeke îngîlîzan dişibe yan rusan, ji ber ku çîrok ji heman çavkaniyan derdikeve holê. Ji bilî vê her çîrokek ji bilî cihanşumûliyê di naveroka xwe de hestên neteweyî jî vedişêre. Dema ku çîrok têne vegotin kêr zêde derdikeve holê ku ka ev çîroka ya kîjan welatî an jî kîjan gelî ye.

Çîrokên kurdî naveroka xwe ji taybetmendiyên gelê xwe distîne. Dema mirov bi çavekî zanistî, rexnevanî û lêkolînî li çîrokên kurdî mêze dike û babetên wan

⁷³ R. Yılmaz (Gernas Koçer), *Destana Şerrê Kundan û Qijikan*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2007, r. 7.

⁷⁴ Hogir Berbir, *Ji Dengbêj Fadilê Kufragî Destan û Çîrokên Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed 2007, r. 5.

analîz dike, mirov wê çaxê dibîne ku, ev berhem, afirandinên gelî wek destanên kurdî, gotinên pêşiya û stran ji me re dewlemendiyeke jiyana folklorîk pêşkêş dikin. Ev berhem li me şîretan dikin, rê nîşanî me didin. Fantazî, xewn, xewnerojên sedasalan di nav van çîrokan de her çûne dewlemend bûne. Beşek ji wan bi rastiyan jiyane ve gîhiştine hev, ji aliyê mirovan de têgihîştina jîyanê zêdetir hêsantir kirine. Di vî warî de çîrokên kurdî gelek hînkar û şîretkar in.⁷⁵

Di çîrokên kurdî de balkêşî, fentezî, têkiliya kulturî, hezkirina ji zimanê nijadî, nasîna nijada xwe, naskirina sirûştê, xweparastina li pêşberê bela û siqûmatan, baweriya bi xwe, şixulandina mejiyê mirov, terzên jiyana netewî, perwerdekirina mirovan, (bi taybet zarok), mirovatî, rêzgirtin, biratî û hwd.⁷⁶ mijar cihê xwe digirin.

Di nava çîrokan de ramanên dijber her dem di şer de ne. Rindî-nerindî, xweşî-nexweşî, qencî-xerabî, şer-aşitî, pakî-nepakî, xweşikî-bedî, ken-girî, dia-nifir û hwd. kêr zêde di her çîrokê de derdikeve pêşberî me. Her çîrokeke gelekî, urf-edet û jiyana wî gelî dihundurîne. Çîrok xewn e, xeyal e, xwegihîştina armancekê ye, şopên nifşên berê ne, çîrok bi xwe jiyana gelan e.

1.3. Li Dinyayê Çend Nûnerên Çîrokê

Hîn ku em derbasî çend nûnerên çîrokê nebûne em di derbarê çîroka nivîskî de agahiyeke kurt bidin wê baştir bibe. Çîrokên nivîskî bivê nevé (Ji sedî sed nebe jî) bingeha xwe ji çîrokên nehatine nivîsandin digire. Ev tişt li hemû dinyayê bi heman rengî ye. Ji ber ku em dizanin gotin, bingeha nivîsê ye. Dema ku gotin tunebe nivîs kêr dimîne. Nivîskar an jî lêkolîner dema li çavkaniyan digerin bivê nevé riya wan bi nava gel (gotinên devkî) dikeve. Di nava gel de ji xwe re bingehê amade dikin paşê nivîsê li ser wê bingehê ava dikin. Di vî warî de pirr mînak hene.

Li cîhanê pirr kesan çîrokên nehatine nivîsandin di nava gel de berevkirine û paşê nivîsandine. Di vî warî de em dikarin çend mînakên bidin. Nivîskarên Îngîlîz Wilhelm Grimm (1786-1859) û Jacob Grimm (1785-1863) (Ku ev her du kes bireyên hev in û bi navê “Birayên Grimm”, an jî bi Tirkî “ Grimm Kardeşler”tê zanîn) berê

⁷⁵ Alakom, *h.b.*, r. 15-16.

⁷⁶ Zeynelabidîn Zinar, “ Hunera Folklorê Kurdî” *Nûbihar*, j. 99, Stenbol 2006, r. 18.

çîrokên gel ên ku nehatibûn nivîsandin berevkirine paşê jî ev çîrokana nivîsandine. Ev xebata herdu birayan di warê çîrokên gelerî de, wekî klasîkên cîhanê têne pejirandin. Di vî warî de xebata Homerosê yewnanî, xebata nivîskarê Scotlandî Walter Scott (1771-1832) û hwd. xebat jî hene.⁷⁷

Li ser rûyê dinyayê hinek kes wek pêşengên çîrokê têne pejirandin. (Ev kesana em dikarin têxin beşa nûnerên çîrokên modern) Em ê li vê derê (Herçiqas çîrokên wan ji aliyê wan ve hatibe avakirin jî bi teqez em dikarin bêjin ku bingeha çîrokên wan cardin çîrokên devkî ne) behsa çend kesên sereke bikin. Yek ji wan kesan Nikolay V. Gogol⁷⁸ e, wer tê pejirandin ku Gogol li dinyayê hîmê çîroka modern daniye. Bandora wî him li ser nivîskarên welatê wî hebû, him jî li ser nivîskarên welatên biyanî hebû. Lehengên Gogol di nava jiyane de ne û kesên ji rêzê ne. Heta dema wî tu kesî leheng bi vî rengî di çîrokan de nedîbû. Motîfên gel û folklorê xwe jî dixwe nava çîrokên xwe û bi vî awayî xwe davêje nava behra wêjeyê û cihekî ji çîrokên xwe re vediqetîne. Yê din Edgar Allan Poe⁷⁹ ye. Di çîrokên vî de pêrew (hayalet), tiştên ecêb, titên dûrî heş, pêrî û hwd. hene. Di nava çîrokên wî de xeyal û rastî tevlihev e. Naveroka çîrokên wî ji tirs, xof, mirin, kabûs hwd. pêk tê. Herçiqas di nava çîrokên wî de tiştên ecêb hebin jî cardin rehê jiyane di nava çîrokên wî de diyar in ango rehên çîrokên xwe ji jiyane nabire.⁸⁰

⁷⁷ Şerefxan Cizîrî, *Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon*, Weşanên Aram, İstanbul 2011, r. 17.

⁷⁸ Nikolay Vasilyeviç Gogol: (1809-1852) bi êslê xwe Rûs e. Navê berhemên wî ev in: Çîrok, Soraxvan, Qapût, Canên Mirî, Lênûska Serpêhatiyên Kesekî Dîn, Portre, Taras Bûlba, Payton, Yên ku Qumarbaz, Mîrgorod û Erabesk, Civatên bişev yên ku Nêzikî Çewlikeke Dîkanka ye. Bnr: Anonim, *Edebiyat Ansiklopedisi*, Milliyet Gazetesi Armağanı, İstanbul 1991, r. 119-120.

⁷⁹ Edgar Allan Poe : (1809-1849) Helbestvan û çîroknivîsê Emerîkî. Navê berhemên wî ev in : The Angel of the Odd (Di vê çîrokê de bûyerên ku têne serê kesekî meyxur hatiye vegotin), The Balloon Hoax (Di vê çîrokê de geşteke ku bi balonê hatiye kirin tê vegotin), The Black Cat (Keskî meyxur tê vegotin), The Cask of Amontillado (Çîrokeke tolhildanê ye), Eleonora (Çîrokeke evîniyê ye), The Tell-Tale Heart (Çîrokeke mêrkujiyê û metaforîk e), The Pit and The Pendulum (Cercere-îşkenceyên ku di Engîzîsyona Spanyolan de hatine kirin tê vegotin), The Premature Burial (Nemirî binaxkîrn), The Meeting (Di vê çîrokê de hevdiîna mêr û jinekê tê vegotin), The Oval Portrait (Portreyeke di nava qesrekê -şato- tê vegotin). Bnr. http://tr.wikipedia.org/wiki/Edgar_Allan_Poe (10.09.2014)

⁸⁰ Ronî War, “Çîrok Pêşverû ye”, *Kovara W*, j. 18, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır, 2008, r. 36.

Ji bilî van her du kesan em dikarin li vê derê navê Guy de Maupassant⁸¹ û Anton Pavloviç Çehov⁸² jî bijmêrin. Di derbarê çîrokên van her du kesan de û di derbarê çîrokên Gogol û Poe de Ronî War wisa dibêje:

“Wan jî bi xebata xwe ruhekî nuh û xwîneke teze dane çîroka dinya yê. Maupassant, di hêla ‘çîroka bûyerî’ de mohra xwe li çîrokê xistiye. Çîrokên xwe bi awayekî temamkirî pêşkeşî xwendevanên xwe dike. Halekî, hêlekê ya jî hinekî bi tenê nabêje, tevdekî radixe ber çavê xwendevanên xwe. Berê xwe dide tiştên ku heta wê rojê nehatine qalkirin, hatine veşartin, durûtiyan û adetên ku însên diguvêşe ser hev û wan derdixwe pêşberî xwendevên. Bi saya vî hawî xwe dike ku xwendevanê çîrokê zêdetir bibin. Anton Çehov; bi ‘çîroka rewşê’ xwe daye qebûlkirin û bêhna çîrokê bêhtir aniye ber. Ew her tiştî dikesixîne û heta jê tê ji dirêjkirinê direve. Ango çîrokê mînimâlîze dike. Bi zimanekî sade dinivîse û bi hawî bêtir nêzîkî heyatê û rastiye dibe. Di navenda çîroka wî de germbûna heyatê û rastiye heye. Ji bûyerê û mijarê wêdetir însan li pêş e û çîroka psikolojiya wî vedibêje. Lehengên wî jî ji heyatê ne. Gava ku tu lê dinihêrî tu dibînî ku pêşengê çîrokê bi qasî ku tesîr li hev kirine li kesên dû xwe jî kirine û hê jî ew berdewam e. Gogol dest avêtiye dinyaya însanên ji rêzê, rê li ber çîroka dinyayê vekiriye, Poe him teknîka wê xurt kiriye him di hêla pênasa çîrokê de xebateke mezin kiriye û him jî di warê çîroka tirsê û fantastîkî de berhemninî giranbiha afirandiye, Maupassant temelê ‘çîroka bûyerî’ daniye, Çehov sadebûn aniye çîrokê, çîrok kin kiriye û ‘ çîroka rewşê’ afirandiye. Tu li gişa dinihêrî dema xwe û însanên xwe nivîsandine. Li heyat û pergala ku tê de dijîn nihêrîne û ew neecibandine, rexne kirine û nûbûnek dane çîrokê. Yê li dû wan jî hatine tecrubeyên xwe û yê kesên berî xwe tevlî hev kirine û ji wî sermiyanî çîroknî ku dema ew tê de ne ji wan dixwaze afirandine.”⁸³

⁸¹ Guy de Maupassant (1850-1893) : Romannivîs û Çîroknivîsê Fransîzî. Navê çend berhemên wî ev in: Şewqa heyvê, Jiyanek, Dilê Me, Wek Mirinê Bi Jan û hwd. Bnr. Anonim, *Edebiyat Ansiklopedisi*, Milliyet Gazetesi Armağanı, İstanbul 1991, r. 196.

⁸² Anton Pavloviç Çehov (1860-1904) Nivîskarê şanoyê û çîroknivîsê Rûsî. Navê çend berhemên wî ev in: Nivîngeha Şeşem, Qaqlîbaz, Xalo Vanya, Sê Xweh û hwd. Bnr. Anonim, *Edebiyat Ansiklopedisi*, Milliyet Gazetesi Armağanı, İstanbul 1991, r. 69.

⁸³ War, *h.b.*, r. 36.

1.4. Çend Nûnerên Çîroka Kurdî

Gelo çîrokên nivîskî di nava gelên biyanîde hene, ma qey di nava kurdan de ev xebatana tune ne? Di nava kurdan de çîrokên nivîskî cara ewil kê nivîsandine? Belê çîrokên nivîskî di nava gelê kurdan de jî hene. Mehmûdê Bayezîdî⁸⁴ yekem kese ku pexşana kurdî avakiriye.⁸⁵ Ji bilî vê çîroka nivîskî bi navê ‘Mem û Zîn’ aniye hole.⁸⁶ Çîroka nivîskî ya duyem jî Fûad Temo⁸⁷ bi navê ‘Çîrok’ weşandiye.⁸⁸ Çîroka Mehmûdê Bayezîdî ya bi navê Mem û Zîn⁸⁹ em li vê derê nanivîsîn, lê em ê cih bidinê beşeke çîroka Fûad Temo, ev beş jî ev e :⁹⁰ (Di nivîsandina wê de hinek kêmasî hene, lê me yeko yeko ji kovara Rojî Kurd girt û me destê xwe neda reseniya nivîsê)

⁸⁴ Mehmûdê Bayezîdî: Di sala 1797an de li Bazîde hate dinyayê. Lê wefata wî nayê zanîn. Di medreseyan kurdistanê de xwendiyê. Ji bilî kurdî bi zimanê erebî, farisî û osmanî dizane. Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî ji zimanê farisî werdigerîne zaravayê kurmançî. Hinek çîrokên kurdan bi navê Camî'ê Risale û Hikayeyan =civîna name û çîrokan nivîsîne. Dîroka Kurdistanê ya piştî Şerefnameyê jî bi navê (Tewarîxê Cedîdê Kurdistan= Mêjûya nû ya Kurdistanê) nivîsiye. Ji bilî van berheman kitêbokek di derbarê rêzimana kurdî de nivîsiye navê wê (Tuhfetul Xillan fi Zimanî Kurdan= yadigâra dostan di zimanê kurdan de) û pirtûkek ku urf û edetên kurdan tê de derbas dibe nivîsandiye navê wê ‘Adab û Risûma’ ye. (Adet û Rusûmatnameê Ekradiye) bnr. Mela Mehmûdê Beyazîdî, *Adet û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2010, r.15-16. Bnr. Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Çapa Yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 443.

⁸⁵ Abdurrahman Adak di derbarê pexşana kurdî de wisa dibêje: “Di sedsala XVIIem de Eliyê Teremaxî berhemek bi navê ‘Serfa Kurmançî’ an jî bi gotineke din ‘ Tefsîra Kurmançî’ (Em bawer dikin ku di vê derê de xeletiyek heye ji ber ku Serf û Tefsîr ne heman tişt in) nivîsandiye û meriv dikare vê berhemê wekî yekem berhema pexşanê bihesibîne. Di sala XVIIIan de jî nûnerê pexşana kurdî Mela Yûnisê Helqetînî û Mela mihemedê Erwasîye.” Bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2014, r. 241-242, 274. Li aliyekî din Jan Dost jî di derbarê dîroka pexşana kurdî de wisa dibêje : “Mîna herî kevn ya pexşanê pêşgotina Nûbihara Ehmedê Xanî ye. Pêşgotina Nûbiharê wisaye” : “ Bismillahirrehmanirrehîm. Mebdeê her ‘ilmekî navê ‘elîm. Hemd û sena û şukranî. Ji bo wî xaliqê rehmanî. Ku fêhat û beyan daye lîsanî. Lîsan daye însanî. Hindî selawatin hemî. Li Resûlê me yê ummî. Ku bûye peyrewêd-i wî, ereb û ecem û kurmanç û rûmî. Ji paş hemd û selawatan. Ev çend kelîmene ji lûxatan. Vêk êxistin Ehmedê Xanî. Navê Nûbihara biçûkan lê danî. Ne ji bo sahib rewacan. Belkî ji bo biçûkêd kurmançan. Wekî ji Qur’anê xilas bin. Lazim e li sewadê çavnas bin. Da bi van reşbelean. Li wan tebî’et melean. Derê zihnî vebîtin. Herçî dixûnin zehmet nebîtin. Umîda me ji tîfalan. Ku me ‘emel betalan. Di weqtê dewr û dersan. Bikin in’am û îhsan. Bi du’an me bîr ve bînin. Fatihan ji me re bixwînin.” Ev ne helbest e, ev pêşî pexşana kurdî tê jimartin. Bnr. Beyazîdî, *h.b.*, r. 21.

⁸⁶ Hinek kes Mehmûdê Bayezîdî wek çîroknûsê pêşîye napejirînin bnr. Serwet Denîz, “Destpêka Çîrokê” *Kovara W*, j. 48, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır 2013, r. 64.

⁸⁷ Fûad Temo: ji Wanê ye û di pir komeleyan de xebitiye.

⁸⁸ Sîdar Jîr, “ Çîrokeke Ciwan: Ji Agresîfîyê Diçe Henûniyê” *Kovara W*, j. 47, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır 2013, r. 35.

⁸⁹ Bnr. Cewerî, *h.b.*, r. 41.

⁹⁰ Çîrok di hejmarê kovarê ya ewil de bi dawî nabe. Di hejmarê duduyan de jî ev çîroka berdewam dike lê di hejmarê din de dawîya vê çîrokê tuneye. Ango em dikarin bibêjin ev çîroka nivîsê maye. (Kovara Rojî Kurd bi tevahî çar hejmar derketine.)

“Şewêş kurê şivanekî ye. Bi xa deh salî zarok e, belê pir çav vekiriye. Şewêş diya xwe nediye. Bavê wî reben û belengaz e, qet tişteki wan tune... Tenê meteke Şewêş hebû. Ew jî pîrek bû. Şewêş carna bal wê diçe. Dilê meta xwe hênik dikire. Şewêş nola sakûlê gundî teşqeletî nedikir. Bo kes da tişteki nedigo. Tum bi xa bi xa bû. Gel hevala xwe baş diçe. Bu wan ra gotina dilmayî nedigo. Heta êvarî da nav gundî bêdeng digere, dilîze roja xwe derbaz dikir. Ew çêbûna Şewêş pir xaşiya gundiyan diçû, hemû Şewêşî hez dikirin, rîspiyê gundî her ro ewî mala xu dibir. Xarina wî dida. Bo wî xuyîti dikir. Herkes da ew zarok qenc e jîr e digo. Şewêş her ro êvarî da ser rêyê bavê xu diçe. Hêviya wî dimîne. Wekî bavê wî tê, pêşiya wî dibeze, bu xa ser kêlekê bavê xu davêje. Destê wî digire. Maç dikir. Bavê wî jî herdu çavê kurê xu maç dikir. Dilhênik dibû. Rojekê dîsa Şewêş ser riyê çû. Hêviyê bavê xu bû. Gavek bihûrî. Roj çû. Hemûkî tarî ket. Bavê wî hêj nehatibû. Şewêş di nava wê tariyê da tenê ma. Dilê wî lez dike, carcaran guhdarî dikir. Bavê xu gazî dikir, tu derê da deng nedihat?.. Şewêş li cîkî rûnişt. Bona bavê xu girî, paşê bu xaw çûbû. Bavê Şewêş hêdî hêdî ji aliyê tewlêda dengê pezan deştê girtibû. Şewêş wî dengî bihîst. Rabû. Gazî bavê xu kir. Bavo! Bavo! Bavê wî jî, ah Şewêş law va tu yî. Tu li vê derê yî.

Şewêş:

Herê bavo ez im.

Bav: Were bal min mêrgem kurê.

Şewêş baziya bal bavê xu, çê destê wî girt. Maç kir. Paşî go: “ Bavo tu îro bo çi wisan dereng mayî? Bona çi zû nehatî?” Bavo go: “Kurê min; pezan têr nexaribû e jî piçek westî bûm, loma derengî mam.” Şewêş go: “ Bavo; ez gorî tu edî wisan derengî nemîne. Tu zanî ku di mal da kes tune. Ez bal kê bimînim. Girî.. Bav, girîna kurê xu dî. Birîndariyê dilê wî nû bû. Ava çavê wî jî vala bû... Şivanê kal bi xa hat. Serê Şewêşî nav her du destê xu îstand. Ava çavê wî paqij kir. Radimûsa paşî go: “Kurê min. Xuda mezin e. Mirazê ê me jî dide...” Paşî destê kurê xu girt. Hedî hêdî hatine gundî. Şivan pezan hewş da kir. Paşî gel kurî xwarinê çûn. Mala wa da lihêf, balgî tişteki wisan tunebû. Tenê melêkkî hebû bav û kur paxila hev ketin, bav milê xu bo Şewêşî balgî çêkir, Şewêş jî serê xu ser singa bavê xu danî, milê xu jî ustûyê bavê xu avêt... Dawî heye.”⁹¹

⁹¹ Fûad Temo, “Çîrok”, *Kovara Rojî Kurd*, (amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê), Çapa Yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2013, r. 121-122.

Di despêka sedsala XXem de di warê çîroka kurdî de hin kesin din jî derdikeve pêşberî me. Yek ji wan Qedrîcan⁹² e, yê din jî Nûreddîn Zaza⁹³ ye. Ev nivîskarana ne bi tenê çîrok nivîsîne helbest, gotarên siyasî û hwd. jî nivîsandine. Rewşa ku ev nivîskarana tê de bûn rewşeke awarte bû. Li her alî şer û pevçûn hebûn. Lê di vê rewşa xirab de jî ji nifşên ayende re pirr çîrok, helbest, lêkolîn hîştin. Ji bilî van kesana em dikarin bibêjin ku di warê çîrokê de, di piştî nivê sedsala XXem de wek kesên mîna Mehmed Emin Bozarslan, Zeynelabidin Zinar, Çiya Mazî, Enwer Karahan, Ronî War, Felat Dilgeş, Firat Cewerî, Hasan Kaya, Paşa Amedî, Rojbîn Ozkan hwd. hene.

1.5. Çavkaniyên Çîrokê

Di derbarê çavkaniyên çîrokê de hinek sinifandin hene. Ev sinifandina di bin navên dibistanan de derdikeve pêşberî me. Li gor lêkolînên zanistî çavkaniyên çîrokan ev in:

1. Dibistana Mîtolojiyê: Baweriya vê dibisitanê di vî warî de ye ku çavkaniyên çîrokan mîtolojî ye û ev mîtolojiya jî mîtolojiya Hînd-Ewropayê ye. Bi borîna demê re mîtolojiyên Hînd-Ewropayê guherîne û bûne çîrok. Nûnerên vê ramanê Jacob Grîmm, Wilhelm Grîmm, G.V. Cox û Max Muller in.

⁹² Qedrîcan: Navê wî yê rast Abdulqadir Ezîz Can e. Di sala 1916an de li Dêrika Mêrdînê hatiye dinê. Li Îzmîrê Zanîngeha Bilind ya Mamostetiyê xwend. Li Anteqayê û li Îskenderûnê mamostetî kir. Nivîs û helbestên wî di Kovara Hawarê de derketin. Piştî şoreşa Agiriyê mecbûr ma û çû Suriyeyê. Li Suriyê jî zor û zehmetî dîn û çend salan mecbûr ma ku li Lubnan û Iraqê bijî. Di 9 Tebax 1972an de li Şamê wefat kir. Bnr. Mehmed Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, (amd. Mehmed Uzun) I, Tûm Zamanlar Yayıncılık, İstanbul 1995, r. 358. Bnr. Qedrî Can, *Guneh*, Çapa Yekem, Weşanên Lîs, Stenbol 2007, r. 7-8.

⁹³ Nûreddîn Zaza: Navê wî yê rast Yûsuf (Ûsiv) e. Di sala 1919an de li Madena Elezîzê hatiye dinê. Piştî şoreşa Şêx Seîd diçe Suriyê. Nivîsên wî di kovara Hawar û Ronahî yê de hatine weşan. Piştî şerê cihanê yê duyem diçe Lozanê, li Lozanê xwendina xwe ya bilin diqedîne û doxtoraya xwe li ser "Herikana Personalîst di Ramana Filozofê Frensî Emanuel Monnier" dike. Zaza, pir pirtûk nivîsnadine Memê Ala, Şerê Azadî, Jiyana Min a Kurdî (bi fransî çap kiriye û navê wê yê resen ev e: Ma Vîe de Kurde ye). Di sala 1988an de li Lozanê wefat dike. Daxuyaniya wî ya ji bo kurdan pirr bi nav û deng e. Zaza, di daxuyaniya xwe de wisa bangî kurdan dike: "Gelî Kurdan! Heke hûn naxwazin ji hev taromar û wînda bibin, berî her tiştî zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê heke dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin; û bi hevaltî û dostaniya milletên din ra pêş ve herin; û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin!" bnr. Zeynelabidin Zinar, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, (amd. Mehmed Uzun) I, Tûm Zamanlar Yayıncılık, İstanbul 1995, r. 376.

2. Dibistana Hîndolojiyê: Li gorî vê ramanê çavkaniya çîrokê Hindistan e. Di sedsala Xem û vir de çîrok ji Hindistanê belavî dinyayê bûye. Nûnerên vê ramanê Î. Kunoş, Theodar Benfey û Emanûel Cosquîn in.

3. Dibistana Antropolojiyê: Li gor vê ramanê çîrok jêmayiyên jîna hov e. Nûnerên vê ramanê Edward Taylor, Andrew Lang, Franz Boaz û Paûl Saintyness in.

4. Dibistana Derûniyê: Li gor vê ramanê çavkaniyên çîrokê xewn in. Nûnerên vê ramanê Von der Leyen e.⁹⁴

Wer tê xweyakirin ku çavkaniyên çîrokê ji Hindistanê derketine. Em dikarin bibêjin ku çîrok rojhilatî ne. Nimûneya herî girîng ya çîrokê Kelîle û Dîmneya Beydebaye û em dikarin bibêjin di warê çîrokê de behrema yekem ya rojhilat e. Li Ewropayê çîrok B.Z. di sedsala VIem de bi Ezop (bi Yewnanî Aîsopos) dest pê kiriye. Piştî Ezopî, di sedsala XVIIem de Jean de La Fontanê yê fransî çîrokên ajalan ‘fabl’ amade kirine. Li Asyayê di dewra dewleta Ûygûran de çîroka Kalyanamkara û Papamkara (Şehzadeyê xwedî hizrên baş û Şehzadeyê xwedî hizrê nebaş) mîna keke balkêş e. Di nava wejeya tirkan de jî em di *Harname* ya Şeyhî û *Mesnewî* ya Mewlana de rastî çîrokên ajalan tên. Di nava kurdan de jî mînakên çîrokan zêdene. Di kovarên weke Hawar, Ronahî de pîrr çîrok hatine nivîsandin, ji bilî vê Feqî Husên Sağniç⁹⁵, M. Emîn Bozarşan⁹⁶ û hwd. kesan çîrokên fablê berhevkirine û weşandine.

1.6. Cûreyên Çîrokê

Li gorî lêkolîneran teşeya çîrokan têvel (ji hev cuda) e. Hinek lêkolîner di bin pîrr beşan de çîrokan disinifînin, hinek jî hejmara sinifandinê kêr dikin. Ji bona ku gotinên me zelal were fêmkirin em li gorî çend lêkolîneran cûreyên çîrokê bibînin.

Nivîskar Muhsine Helimoğlu Yavuz çîrokan wisa vawêr (tesnîf) dike.

1. Çîrokên Awarte (Neasayî)

⁹⁴ Zeki Gürel, F. Temizyürek, N. K. Şahbaz, *Çocuk Edebiyatı*, Weşanên Öncü Kitap, Ankara 2007, r. 48-49.

⁹⁵ Feqî Huseyn Sağniç, *Çîrokên Kurdî (Fabl)*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol 1999.

⁹⁶ M. Emin Bozarşan, *Gurê Bilûrvan*, Weşanên Deng, Amed 2000.

2. Çîrokên Cin û Pêriyan
3. Çîrokên Mirovên Neasayî
4. Çîrokên Sêhr û Efsûnê
5. Çîrokên Cinawir, Dêw û Pîrhevokan (Pîrebotk)
6. Çîrokên Padîşah, Siltan, Şehzade, Keybanû û Paşmîran(Wezîr)
7. Çîrokên Dewlemendan, Bazirganan, Axa û Began
8. Çîrokên Mirovên Xizan
9. Çîrokên Ajalan
10. Çîrokên ku mijara wana Biwêj û Gotinên Pêşiyane.⁹⁷

Hinek nivîskar hejmara cûreyên çîrokê hîn hindik dikin û raveyî xwendekaran dikin. Li gorî Yalçın û Aytaş cûreyên çîrokê vana ne:

1. Çîrokên Ajalan
2. Çîrokên Aferîdeyên Neasayî
3. Çîrokên Kawikan (Kesên heşşivik- Mirovên saf)
4. Çîrokên ku behsa sêhr, efsûn û tiştên neasayî dikin.⁹⁸

Di derbarê folklorê de hinek nivîskar henin ku berhemên giranbaha amade kirine. Yek ji wan kesan jî Pertev Naili Boratav e. Li gorî Boratav cûreyên çîrokê bi vî rengî ne:

1. Çîrokên Ajalan
2. Çîrokên Neasayî

⁹⁷ Muhsine Helimoğlu Yavuz, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Weşanên Wezaretê Çandê, Ankara 2002, r. 17-18.

⁹⁸ Alemdar Yalçın, Giyasettin Aytaş, *Çocuk Edebiyatı*, Weşanên Akçağ, Ankara 2002, r. 50-55.

4. Çîrokên Rasteqîn
5. Çîrokên Kenhar (Pêkenok)
6. Çîrokên Zincîreyî⁹⁹

1.6.a. Çîrokên Ajalan

Çavkaniya van çîrokan li gorî pirr kesan rojhilat e. Lehengên van çîrokana ajal in. Peyama ku dixwaze were dayin bi rêya ajalan ve tê ye dayîn. Ajal di van çîrokan de diaxivin. Herçiqas weke fabl werine bi navkirin jî carcaran bi direjîya mijara xwe û di naveroka vana de hebûna serpîhatiyan hene, ji ber van herdu sedemana hinekî ji fablan cuda ne. Çîrokên ajalan hem bi şêweya pexşanê hem jî bi şêweya helbestkî têne nivîsandin. Di van çîrokan de hînkarî û şîretên sincî, cewherên dostaniyê, hogirî, qencî, xweşî, dilsozî li hemberî wana durûtî, neyarî, hevxiyandin, dijminî, hesûdî, çevnebarî hene. Di vî warî de li Ewropayê Ezop, La Fontanie, Jacop Grimm û Wilhelm Grimm (Mizikavanên Bremenê), li Hindistanê Mahabharata û rêze çîrokên Pançatantra (yek ji wana Kelîle û Dîmne¹⁰⁰), Li Tirkîyeyê Şeyhî (Harnâme) û Mewlana (Mesnevi), di nava kurdan de jî M. Emîn Bozarşan, Zeynelabidîn Zinar û hwd.

1.6.b. Çîrokên Neasayî

Di nava cûreyên çîrokan de ya herî zêde tê zanîn ev cûre çîrok in. Naveroka van çîrokan neasayî ne. Bûyer carcaran heft tebeqe di binê erdê de, carcaran li ser çiyayekî di nava ewran de, carcaran li welatê pêriyan diqewimin. Lehengên van çîrokana cin, pêrî, dêw, hût, cinawir, pîrhevok, pîreke sêhrbaz li aliyê din lawikê padîşah, keybanûyek, nêçîrvanek, belengazek hwd. in. Lehengên van çîrokana li hember mehlûqatên ecêb dikevin têkoşînên hebûn û nebûnê. Lê dawîya dawî van çîrokana bi serkeftina lehangên bi dawî dibe. Di van çîrokan de mirov têkoşî, sebr, lehengî bi awayekî zelal li ber çava têne raxistin.

⁹⁹ Ali Fuat Bilkan, *Masal Estetiği*, Weşanên Timaş, İstanbul 2009, r. 20.

¹⁰⁰ Di 2001an de Mucteba Baravî beşek (Ku ev berhema ji çar beşan pêk tê) ji vê berhemê wergerandiye kurdî û di nava weşanên Nûbiharê de derketiye.

1.6.c. Çîrokên Rasteqîn

Li gorî cûreyên din, di van çîrokan de leheng, bûyer, cih û dem hîn nêzîkî rastiye ye. Di nava van çîrokan de bi gelemperî dijberî hene. Dewlemend-xizan, rindnerind, bihêz-qels, axa-gel her tim di van çîrokan de tê pêşberî me. Di dawiya van çîrokan de peyam, rastî, durustî, bêqîmetiya mal û milk, hezkirina mirovan, qedirzanîn e.

1.6.d. Çîrokên Kenhar (Pêkenok)

Ev çîrokana kurt in. Di naveroka wan de meselokên tûman (komîk) hene. Lehengên van çîrokana kesên ji rêzê ne. Hêmanên pêkenîne di nava van çîrokan de gellek in. Herçiqas bûyer biqewimin û ev bûyerana li dijberî leheng be jî dawiya dawiyê lehengên van çîrokan bi ser dikevin û bextewarî dimînin. Zimanê van çîrokana hêsan in, hemû kes dikare ji mijarê fêhm bike.

1.6.e. Çîrokên Zincîreyî

Ji rêze çîrokan pêk tîne ku di navbera wan de rist û pevgirêdanek mantiqî heye. Bûyer û rûdanên çîrokê li dû hevdu tîne gotin. Her yek ji wan, hem dewama yê dî ye û hem jî bi serê xwe çîrokeke.¹⁰¹ Lehengên van çîrokan hema bi gelemperî ajal in. Ev cûre çîrokana ne pirr dirêj in.

1.7. Beşên Çîrokê

Bi gelemperî lêkolîneran beşên çîrokê di bin sê sernavan de berhevdişin. Ev beşanan jî ev in:

1. Çîvanok (Serê Çîrokê- Destpêka Çîrokê)
2. Beşa Hîmî (Gewde- Bingeha Çîrokê)
3. Encam¹⁰²

¹⁰¹ Pertev, *h.b.*, r. 95.

¹⁰² Ahmet Yaşar Zengin-Nesrin Zengin, *Çocuk Edebiyatı*, Çapa Duyem, Weşanên Bizim Büro, Ankara 2002, r. 82.

1.7.a. Çîvanok (Serê Çîrokê - Destpêka Çîrokê)

Despêka çîrokê, di nava çîrokê de cihê herî balkêş, cihê herî bicoş û rengîn e. Di vê beşê de huner û hostatiya çîrokbêj derdikeve holê. Çîrokbêj ji bona bala guhdaran bikêşînê di vê beşe de bi bêjeyan dilizê, bêjeyên sosret li dû hevdu rêz dike û bi hostatî û hunermediyeke mezin van bêjeyana lihev tîne. Çend mînak ji van çîvanokana ev in: “ Hebû tunebû”, “ Hebû tunebû, carek ji caran, li welatekî bi daran...”, “Hebû tunebû, carek ji caran rehmî li dê û bavê guhdaran...”, “Hebû tunebû, carek ji caran rehmî li dê û bavê guhdaran, xwelî li serê Bekoewanê li ber dîwaran...”, “Hebû tunebû, ji Xwedê mezintir kes tunebû...”, Paşî hinek çîvanokên xweş, lehengên çîrokê yê sereke di vê beşê de ji guhdaran re tê pêşkeşkirin.

1.7.b. Beşa Hîmî (Gewde- Bingeha Çîrokê)

Vegotina çîrokê hemû di vê beşê de ye. Vegotin cardin li vê derê bi hunermendiyeke mezin û ji bona balkişandina guhdaran bi şeweyeke edebî tê vegotin. Hemû bûyer di vê beşê de bi rêk û pêk tê honandin. Vegotina çîrokbêjan ewqas xweş e ku ew ê ku çîrokê guhdarî dikin bi lengên çîrokê re dibin heval, bi hestên xwe ew jî di nava bûyeran de cih digirin. Çîrokbêj vê rastiye dizane, ji bona vê dixwaze bala guhdarvanan hîn zêde bikêşîne. Ji bona vê yekê carcaran ji nişkave dengê xwe bilin dike û dibêje: “ Ha ha ha li wir”, “Bavooo”, “ Keso kes nebîne”, “ Çû bi şev çû, çû bi roj çû, çû, çû, çû.”

Çîrokbêj tu cara mijara çîrokê belav nake, hemû bûyer bi hev re girêdayîne. Bûyer ew qas dijwar dibe jî lê çîrokvan qet ji gotina xwe danakeve, dawiya dawiyê pirsgirêkên mezin bi hostatî çareser dike û bêhna guhdaran fireh dike.

1.7.c. Encam

Ev beşa dawiya çîrokê ye. Çîrokbêj di vê beşê de bi hemû hostatiya xwe çîrokê bi hev girêdide, kesên rind û rast bi mirazê xwe şa dibin, kesên xerab û neqenc cezaya xwe dibînin. Careke din li vê derê jî çîrokbêj weke edetê kevnare çîrokan bi hinek gotinan diqedînin: “ Çîroka min li diyaran, rehmî li dê û bavê guhdaran...”, “ Çîroka min li mişka, rehmî li dê û bavê we gişka...”, “ Çîroka min li diyaran, rehmî li dê û bavê guhdaran, ji bilî cenderme û tehsîldaran...”

1.8. Naveroka Çîrokan

Bi taybet di naveroka çîrokên kurdî de gelek motifên ji hev cuda ji xwe re cihêkî dibîne. Bingeha naveroka çîroka kurdî civata kurda ye. Di her warî de civata kurd gelekî dewlemend e. Em di wê baweriyê de ne ku çîrokên kurdî jî sûd ji vê dewlemendiyê girtiye.

“...Çîrokên kurdî gelek hînkar û şîretkar in. Di van çîrokan de li dijî bêgavî, neçarî tunebûn û xizaniyê, çawa em dibînin îmkan û mecalên nedîtî, nebihîstî ji aliyê mêrxasên çîrokî de tînin afirandin. Di nav van berhemana de ew şerê pakî-nepakîyê, qencî-xirabîyê, xweşî-nexweşîyê her diçe tûj dibe. Herçiqas dilsar û rûsar be jî, dawîya beşek van çîrokan carcar bi mirin-kuştinê diqedin. Ew şer-dew, teqereq, xirecir, serpehatî, bûyer û qewimandinên mezin ên ku di çîrokên kurdî de tînin pêşkêşkirin, ji alîkî de jî wek neynikekê, janên civatê, serêşiyên civatê û rewşa civatê nîşan didin. Pêwendî û hevgerêdanên mirovî radixin ber çavan. Di çîrokên kurdî de gelek erf-edet, rêvaçûn, karakter, nêrîn û dîtinên ser jiyane hene. Civatê bi rêke hunerî, artistîk, bi alikariya zimanê çîrokan, daxwazî û hêviyên xwe yê sedsalan ji nûve civatê re pêşkêş kiriye. Civatê bi dirêjahiya salan, bi hezaran çîrok afirandiye, angorî sal-zemanan hewcedariyên me yê hunerî bi cih anîye, di vî warî de em têr kirine. Hûnera çîrokbêjiya kurdî di jiyana rastîn de nîn be jî, qet nebe ji me re cihaneke çîrokî wek mîrate hîştîye, pêşkeş kiriye. Dema em naveroka çîrokbêjiya kurdî raçav dikin, em dibînin ku gelek babet û motifên ji hev cuda di nav van berhemana de cih girtine. Ev dewlemendîya motifan nîşanî me dide ku, civat bi her alî bûye babeta çîrokan. Bi kurtî mirov nikare peyvên çîrok û civatê ji hev cuda bike.”¹⁰³

Bi zelalî tê xweyakirin ku çîrok ji civatê ne cuda ne. Reng, deng, bang, hêvî, rindî, nerindî, camêrî, xirabî û xeyalên civatekê di nava çîrokên wê civatê de olan dide.

1.9. Di Çîrokê de Bûyer

Naverokên çîrokê li gorî cûreyên çîrokê tînin guherîn. Di çîrokên neasayî de mijar bûyer tiştin nerojane ne, bûyer tiştên neasayî ne. Di çîrokên ajalan de mebest

¹⁰³ Alakom, *h.b.*, r. 16-17.

ders dayîne ji ber vê yekê di nava van çîrokan de pîrsgirêkek heye û ev pîrsgirêka li aliyê kesên qenc, rast tê çareserkirin. Em dikarin bibêjin ku kêma zêde bûyerên di hemû çîrokan de ramanên dijber (qencî-xerabî, rastî-nerastî hwd.) şer dikin û çîrok bi serkeftinên ramanên baş diqedin. Di çîrokên rasteqîn de bûyerên ku rojane têne qewimîn derdikeve pêşberî me.

Di çîrokan de bûyer, bi tevahî li ser zemînekî der rastî û neasayî hatiye damezirandin. Dibe ku di çîrokan de bûyerên dîrokî yê qewimîni jî têne vegotin, lê ev bûyerana di atmosfera çîrokan de nayên naskirin ango edî rengê çîrokê girtine. Di hinek çîrokan de mimkûne ku em rastî mîtên hinek mîtolojiyan jî werin.¹⁰⁴

1.10. Lehengên Çîrokê

Di çîrokan de leheng li gorî cûreyên çîrokan de têne guherîn. Di çîrokên neasayî de ger leheng mirov be, ew kesa kesekî xurt û bi hêz e. Tu caran çavê xwe ji riya xwe bernade. Çi derkeve pêşberî wî/wê dawiya dawî ew bi ser dikeve. Tirs tu caran nabe mêvanê van kesan. Di çîrokên ajalan de leheng ajal in. Lê di çîrokên din de ajal alîgirên lehengane. Bi piranî ev ajalana hesp, tajî, şêr, balinde, teyr, beq û hwd.

Di çîrokan de bi piranî taybetmendiyên lehengan yekaliye. Hetanî dawiya çîrokê, kesên rind rind in, kesên nerind jî nerind in. Lê pîr kêma be jî carinan hinek kesên xerab berve dawiya çîrokê qenc dibin û derbasî aliyê rastiyê dibin.

Di çîrokan de bi piranî ev lehengana derdikevin pêşberî me: Dêw, pîrhevok, pêrî, , kur an jî qîzên padîşahan, wezîr, dêmarî, ap û amojin, , pîremêr, şivan, gavan, efrîd, beran, tîremar, pepûk, şêr, tajî, teyr, beq hwd. di çîrokan de rolên lehengan jî ji hev cuda ne. Yê ku rolên wana erênî bi piranî ev in: Padîşah (em bawerdikin ku ê di çîrokan de xwedî du rol padîşah in, carinan qencin, carinan sîtemkar in) kur an jî qîzên padîşahan, kesên xizan, şivan, gavan, pêrî, şêr, tajî, teyr, beran, beq; yê ku rolên wana neyênî ev in: Dêw, pîrhevok, efrîd, wezîr, dêmarî, ap û amojin.

¹⁰⁴ Hamdi Güleç, *Halk Edebiyatı*, Weşanên Çizgi Kitapevi, İstanbul 1988, r. 65- 89.

1.11. Fonksiyonên di Derbarê Lehengên Çîrokê de

Proop di derbarê lehengên çîrokê de sih û yek fonksiyonan bi kar tîne. Fonksiyonên ku Proop bikaranîne ev in:¹⁰⁵

I. Ji malbatê yek bi dûr dikeve

Salix: Dûrketin

Sembol: e

1. Ew ê ku bi dûrdikeve dibe ku kal/pîr be. Dê û bav ji bo xebatê ji malê bi dûr dikevin. Ji ber divêtiyê ji malê bi dûr ketin. Cûreyên dûrketinê: Çûyîna xebatê, çûyîna daristanê, ji bo bazirganiyê çûyîn, çûyîna şer (e^1).
2. Bi mecbûrî dûrketin: Mirina dê û bavê (e^2).
3. Ew ê ku bi dûrdikeve dibe ku ciwan be (e^3)

II. Leheng rastî qedexekirinekê tê

Salix: Qedexekirin

Sembol: k

1. Qedexekirina sêv berevkirinê, qedexekirina derî vekirinê, qedexekirina vekirina qutiyê (k^1).
2. Emir dan yan jî dawet kirin (k^2).

III. Qedexe binpêkirin

Salix: Qedexe binpêkirin

Sembol: q

IV. Riyên ku dijmin agahiyan bi dest dixê

Salix: Jêpîrsîn

Sembol: v

Dijmin dibe ku şeytan, ejderha, dêmarî, rêbir, pîra sêhr be.

¹⁰⁵ Berivan Can Emmez, *Sözlü Gelenekten Modern Masala: Çocuk Edebiyatında Masal Üzerine Halkbilimsel Bir İnceleme*, (Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi), Ankara 2008. r. 68-99.

1. Armanca lêpîrsînê, ji bo dîtina cihê zarokan an jî tiştên biqîmet e. “ wê kî behsa cihê zarokên paşê bike, gelo wan xwe li ku veşartine?” (v¹)

2. Dema ku dijmin ji aliyê kesên qenc ve were girtin û kesên qenc dijmin bide axavtin, rewş berovajî dibe icar dijmin dibêje: “ Hespa we çiqas beza ye! Mirov ma qey dikare hepsek weke vê bi dest bixe ?” (v²)

3. Di hinek bûyeran de jêpîrsîn ji aliyê hinek kesên cuda ve tê kirin (v³)

V. Di derheqê leheng de agahî dayîna dijmin

Salix: Agahî dayîn

Sembol: W

Dijmin ji hinekan pîrsan dike, ew jî di derbarê leheng de agahiyan dide dijmin.(W¹)

VI. Riyên xapandinê

Salix: Riyên xapandinê

Sembol: J

Ji beriya her tiştî dijmin şiklê xwe diguherîne. Ejderha xwe dike bizineke zêrîn.

1. Dijmin li riyên qanîkirinê digere: Pîra sêhr gustîlekê diyarî leheng dike. (J¹)

2. Dijmin rasterast riyên bisêhr bikar tîne: Dêmarî ji bo leheng razê, av an jî cûreyên avê dide leheng (J²)

3. Dijmin li riyên cuda yên xapandinê digere: Xwişkên nebaş, ji bona leheng birîndar bikin tiştên tûj dikin şibakê (J³)

VII. Leheng dixapin û bê xwesteka xwe alîkarî dijmin dike

Salix: Tevlîbûna tawanê (bê xwesteka xwe)

Sembol: g

1. Leheng, dikeve dafika dijmin (dixape): Gustîlê dipejirîne. (g¹)

2. Leheng li hember sêhrê û hinek riyên din bi avayekî xwebar (otomatîk) bertekê dide. Mînak, ji nişkave dikeve xew, bîrîndar bûn. Ev tiştana carcaran bi xwe jî dibe, carna qet kesek têkilî leheng nabe lê ew bi xwe radikeve. (g^2 û g^3)

Bi rêyeke taybet leheng tê xapandin li aliyê din leheng li gorî vê xapandinê tev digere. Ji vê rewşê re “ amadekariya xerabiyê” tê gotin. Bi sembola (h) tê nîşankirin.

VIII. Dijmin ziyanê dide endamekî/eke malbatê

Salix: Xerabîkirin

Sembol: X

1. Dijmin ji malbatê yekî/yekê direvîne (X^1)
2. Dijmin, bi rîya sêhrê yekî/yekê direvîne an jî vedişêre (X^2)
3. Dijmin, tene (zevî) talan dike an jî ziyanê dide tene (X^3)
4. Dijmin, rojê tarî dike (X^4)
5. Dijmin, diziyê dike (X^5)
6. Dijmin, ziyanê dide bedena mirov (X^6)
7. Dijmin, bi derbekê re hin kes/tiştan wenda dike (X^7)
8. Dijmin, ji leheng tişteki dixwaze an jî leheng ber bi xwe tîne (X^8)
9. Dijmin, yekî/yekê diqewirîne (X^9)
10. Dijmin, dixwaze ku yekî/yekê biavêje nava behrê (X^{10})
11. Dijmin, bi bandora sêhrê şiklê tişteki an jî kesekî/kê biguhere (X^{11})
12. Dijmin, yekî dike şûna yekî din (X^{12})
13. Dijmin, ji bo kuştinê emir dide (X^{13})

14. Dijmin, yekî/yekê dikuje (X^{14})
15. Dijmin, bi darê zorê hinekan digire an jî binçav dike (X^{15})
16. Dijmin, bi darê zorê dizewice (X^{16})
17. Dijmin, hinekan bi yamyamtiyê (dibê ez ê we bixwim) ditirsîne (X^{17})
18. Dijmin, bi şevê leheng ditirsîne (X^{18})
19. Dijmin, herbê didezanîn (danzanîn) (X^{19})

VIII. Di malbatê de hinek kes ji tiştêkî bêpar dimînin û dixwazin wî tiştî bidest bixin

Salix: Kêmasiya tiştêkî

Sembol: x

1. Leheng azeb e û dixwaze ji xwe re yekê bibîne (x^1)
2. Leheng dixwaze bibe xwediyê sêv, av, hesp, şûr hwd. tiştên efsûnî (hewcedariya van tiştan) (x^2)
3. Kêmasiya çûk, werdeka pûrt zêrîn, alavên efsûnî (x^3)
4. Teşeya taybet: Hêka ku di hundurê wê de eşqa qîza padîşah heye (x^4)
5. Teşeyên tîn zanîn: Dirav û ji bo debara jiyanê alavên din (x^5)
6. Hinek teşeyên cuda (x^6)

IX. Belavbûna nûçeya kemasî an jî xerabiyê; emir dan an jî ricakirina ji leheng, şandina leheng ya rêwîtiyê an jî çûyîna wî ya bi dilê wî.

Salix: Navbendî, dema têkiliyê

Sembol: Y

1. Li ser banga bangewaziyê, ji bo rêwîtiyê leheng tê şiyandin (Y^1)

2. Leheng, ji bo rêwîtiyê rasterast tê şiyandin (Y^2)
3. Destûrdayina ji bo ku leheng ji malê biçe (Y^3)
4. Bihîstina karesatê (Y^4)
5. Leheng ji malê tê qewirandin (Y^5)
6. Lehengê ku cezaya mirinê girtiye, bi dizî tê berdan (Y^6)
7. Lawij gotin (Y^7)

X. Lehengê lêger, an lebitînê dipejirîne an jî biryarê dide ku bilebite

Salix: Biryardayîna leheng

Sembol: W

XI. Dûrketina leheng a ji malê

Salix: Bi rê ketin

Sembol: ↑

XII. Ji bo alîkariya alavên bisêhr an jî alîgirên bisêhr bigire, leheng tê ceribandin, tê jêpîrsîn û rastî erîşan tê.

Salix: Fonksiyona yekemîn a di derbarê bexşanker de

Sembol: D

1. Bexşanker, leheng diceribîne (D^1)
2. Bexşanker, slavê li lehneg dide û lêdipirse (D^2)
3. Kesekî li ber mirinê an jî yekî mirî alîkariyê ji leheng dixwaze (D^3)
4. Girtiyek ji bo filitandina xwe ji leheng alîkariyê dixwaze (D^4)
5. Ji leheng daxwaziya bexşandinê (D^5)

6. Dijber, hinek mal nikarin di nava xwe de parve bikin, ji bo parvekirina vî malî alîkariyê ji leheng dixwazin (D⁶)

7. Xwestekên din (D⁷)

8. Dijminek, dixwaze leheng bikuje (D⁸)

9. Dijminek, bi leheng re şer dike (D⁹)

10. Ji bo ku bi hevdu biguherin, hinek kes alavek bisêhr pêşniyarî leheng dikin (D¹⁰)

XIII. Bertek nîşandana leheng ji bo tevgerên bexşanker (Ev bexşankera wê di demên pêş de wê ji bo leheng hinek tiştan bibexşîne)

Salix: Berteka Leheng

Sembol: H

1. Qayîlbûna bi ceribandî (H¹)

2. Li hember slavê slav dayîn (H²)

3. Daxwaza kesekî li ber mirinê tê pejirandin (soz dayîn) (H³)

4. Leheng kesê ku girtî rizgar dike (H⁴)

5. Leheng, kesê ku lawayan jê dike serbest berdide (H⁵)

6. Leheng, tiştan li dijberan parve dike (H⁶)

7. Leheng xizmeteke din dike (H⁷): Qîza ciwan, nanî dide parsekan.

8. Ji êrîşê filitîn (H⁸)

9. Leheng, dijmin têk dibe (H⁹)

10. Leheng, guherîna alavên bisêhr dipejirîne lê hêza alava ku bisêhr hema li hember dijmin bikar tîne (H¹⁰)

XIV. Ji aliyê leheng ve bidestxistina alava bisêhr

Salix: Bidestxistina alava bisêhr

Sembol: Z

1. Rasterast dayîna alava bisêhr (Z^1)
2. Rêdayîna cihê alava bisêhr (Z^2)
3. Çêkirina alava bisêhr (Z^3)
4. Kirîn an jî firotina alava bisêhr (Z^4)
5. Ji aliyê leheng ve dîtina alava bisêhr (Z^5)
6. Bi derbekê re, derketina xwebixwe ya alava bisêhr (Z^6)
7. Alava bisêhr tê xwarin an jî tê vexwarin (Z^7)
8. Dizîna alava bisêhr (Z^8)
9. Hinek kes bi daxwaza xwe dikevin bin xizmeta leheng (Z^9)

XV. Tiştê ku leheng lê digere, cihê wî tiştî rê leheng didin û ji bo dîtina wî tiştî alîkarî û rêberiyê ji leheng re dikin

Salix: Ji şahitiyekê çûyîna şahitiyeke din (Ji welatekî diçe welatekî din)

Sembol: R

1. Leheng, di hewa re difire û diçe (R^1)
2. Leheng, li ser erdê an jî li ser behrê de rêwîtiyê dike (R^2)
3. Ji leheng re rêberîkirin (R^3)
4. Rê nîşandana lehng (R^4)
5. Leheng, ji alavên statîk sûd digire (R^5): Bi ben xwe bera jêr dide, diçe ser derenceyê.

6. Leheng, dewsa dilopên xwînê dişopîne (R⁶)

XVI. Leheng û dijmin rasterast dikevin nava têkoşînê

Salix: Têkoşîn

Sembol: L

1. Li erdekî berdayî têkoşîn (L¹)
2. Pêşbazî (L²)
3. Lîstina xumarê (L³)
4. Ceribandina giranî rakirinê (L⁴)

XVII. Ji bo nasînê li ser leheng, hebûna nîşaneke taybet

Salix: Nîşana taybet

Sembol: M

1. Nişêta/nîşana li ser bedena leheng (M¹)
2. Ji bo nasînê leheng gustîl an jî hinek kinc/cil distîne (M²)

XVIII. Têkçûna Dijmin

Salix: Serfîrazî

Sembol: V

1. Têkçûna dijmin ya li erdekî fireh (V¹)
2. Têkçûna dijmin ya di pêşbaziye de (V²)
3. Dijmin di xumarê de wendadike (V³)
4. Têkçûna dijmin a di xwe wezinandinê de (V⁴)
5. Kuştina dijmin ya bê têkoşîn (V⁵): Dijmin di xewê de tê kuştin.

6. Qewirandina dijmin (V⁶)

XIX. Neyîniya di serê çîrokê de ji holê tê rakirin

Salix: Ji holê rakirina nerindiyê

Sembol: E

1. Bi darêzorê an jî bi fenekî bidestxistina tişteki (tišta/ê ku lê tê gerîn) (E¹)
2. Tišta/ê ku lê tê gerîn, di encama têkoşîna pirr kesan de tê bidestxistin. (E²)
3. Tišta/ê ku lê tê gerîn, bi riya kêşweriyê(cazîbe) tê bidestxistin (E³)
4. Tišta/ê ku lê tê gerîn, bi encama bizavên berê tê bidestxistin (E⁴)
5. Tišta/ê ku lê tê gerîn, bi riya alava sêhrê û bi carekê de tê bidestxistin (E⁵)
6. Bi bikaranîna alava sêhrê re ji holê rakirina xizanî yê (E⁶)
7. Tišta/ê ku lê tê gerîn, tê bidestxistin (E⁷): Leheng, hespa ku giha wî diziye digire.
8. Ji holê rabûna sêhrê û azadbûna kesê ku di bin bandora sêhrê de (E⁸)
9. Vejîna kesê/a mirî (E⁹)
10. Rizgarkirina kesê/a girtî (E¹⁰)

XX. Vegerîna leheng

Salix: Şûnda veger

Sembol: ↓

XXI. Li peyçûn (şopandin) û girtina leheng

Salix: Peyçûn (şopandin)

Sembol: P

1. Bi riya firîne şopîn (P¹): Pîra sêhr li pêy leheng difire û ji jor de leheng dişopîne.

2. Xwestina kesê sûcdar (P²)
3. Ketina şiklê ajalan û bi vî awayî şopîn (P³)
4. Şopîner, bi teşeya hinek objeyên kêşwerî derdikeve şer riya leheng (P⁴): Şopîner dibe mêrgeke hêşîn, dibe goleke avxweş hwd.
5. Şopîner, dixwaze leheng daqurtîne (P⁵)
6. Şopîner dixwaze leheng bikuje (P⁶)

XXII. Ji şopandinê Filitîna leheng

Salix: Filitîn

Sembol: S

1. Birin jorîna leheng (leheng bi alikariyê diçe ezmana) (S¹)
2. Leheng, hinek asteng dixwe riya dijmin û direve (S²)
3. Leheng, dema ku direve ji bo ku neyê naskirin dikeve teşeya hinek objeyan (S³)
4. Di dema revînê de xwe veşartina leheng (S⁴)
5. Ji aliyê hesinkera ve veşartina leheng (S⁵)
6. Di derbekê de leheng xwe dike teşeya kevir, ajal hwd. û ji şopîner difilite (S⁶)
7. Têkoşîna leheng li ber kes/tiştên kêşwerî (S⁷)
8. Dijmin dike leheng daqurtîne lê leheng têdikoşe û destûrê nade (S⁸)
9. Filitîna leheng a ji bedkujî yê (S⁹)
10. Leheng xwe davêje (diavêje) ser dareke din û difilite (S¹⁰)

XIII. Leheng nasnameya xwe vedişêre û yan diçe welatê xwe yan jî diçe welatekî din

Salix: Nasname veşartin û hatin

Sembol: O

XIV. Dozên bêbingeh ên lehengê sexte (dixel)

Salix: Dozên bêbingen

Sembol: F

XV. Ji bo leheng pêşniyarîkirina erkeke dijwar

Salix: Erka dijwar

Sembol: T

XVI. Pêkanîna erkê

Salix: Pêkanîn

Sembol: A

XVII. Nasîna leheng

Salix: Diyarkirina nasnameyê

Sembol: I

XVIII. Daxistina rûpûşa lehengê sexte

Salix: Daxistina rûpûş

Sembol: Dv

XIX. Leheng dikeve dirûvekî nû

Salix: Guherîn

Sembol: Tr

1. Bi têkilahiya (mudaxale) efsûndarê alîgir guherîna leheng (Tr¹): Leheng dikeve guhê hespê û paşê dibe kesekî qeşeng û ji guhê hespê derdikeve.
2. Leheng qesreke rewneqdar çêdike (Tr²)
3. Leheng, kinc/cilên nû li xwe dike (Tr³)
4. Guherînên asayî (nêzî heş) (Tr⁴)

XXX. Cezakirina (sezakirin) dijmin

Salix: Cezakirin

Sembol: Pu

XXXI. Zewaca leheng û derketina ser text

Salix: Dawet

Sembol: N

1. Bûk û şahitî, di heman demê de dê bidin leheng, an jî berê nivê şahitiyê, an jî piştî mirina dê-bavê re leheng dibe xwediyê her tiştî (N^{**})
2. Carinan leheng dizewivce lê bûk ne qîza paşê ye. Bûyera derketina text jî tune ye (N^{*})
3. Car caran jî hew bi tenê bûyera derketina text tenê heye (N_{*})
4. Bidestgirtî bûn (n¹)
5. Leheng jina xwe wenda dike (dimire), ji nû ve dizewice (n²)

6. Leheng, ji bo xelata xwe dirav an jî hinek tiştên din dixwaze (ji bo dewlemend bibe tiştan dixwaze) (n⁰)

Ji bilî van nîşanan hinek nîşanên din jî henin: (i¹⁰⁶), **mot**¹⁰⁷, **pos**¹⁰⁸, **neg**¹⁰⁹, <¹¹⁰, §¹¹¹

Proopp, di paşiya xebata xwe de digihêje çar cûre çîrokan.

1. Çîrokên ku L - V yê di hundurîne (vedihewîne)
2. Çîrokên T - A yê di hundurîne
3. Çîrokên ku L - V û T - A yê bi hevdu re di hundurîne
4. Çîrokên ku va tîpana (tîpên cot) nahundurîne¹¹²

1.12. Di Çîrokê de Cih û Dem

Bi piranî di destpêkê de behsa cihê ku buyer lê qewimîye tê kirin. Ev cihana, derên ku tu caran mirovan bi çavên xwe nedîne. Cihên wek welatê pêriyan, qesra padîşahê pêriyan, paş çiyayê qaf û hwd. tê xweya kirin ku ev hemû der derên xeyalî ne. Ya rast ev derên xeyalî bala mirovan (bi taybet zarokan) dikêşîne û hîn zêde guhê xwe didin çîrokbêjan.

Li aliyê din di çîrokan de dem jî nayê zanîn. Di destpêka çîrokê de çîrokbêj dibêjin: “Hebû tunebû...”, “carekê ji caran”, “di wexteke nediyar de li welatekî”, “di zemanê berê de”, Li vê derê jî diyar e ku dema ku çîrok tê de qewimiye nayê zanîn. Lê belê em dikarin bibêjin demên çîrokê bi “dema boriya dûdar û dema fireh” têne vegotin.

¹⁰⁶ Rewşa destpêkê

¹⁰⁷ Motivasyon

¹⁰⁸ Pozîtîf

¹⁰⁹ Negatîf

¹¹⁰ Li xaçerêyan ji hev veqetin

¹¹¹ Hêmana yekkirinê

¹¹² Emmez, *h.b.*, r. 99.

1.13. Di Çîroka Kurdî de Hinek Sembol

Di çîroka kurdî de bi sedan sembol têne bikaranîn, hinek ji wana nûnertiya tînetiyê, bêkesiyê, belengaziyê; hinek jî nûnertiya xayinî, tarîfî, neqencî û hwd. dikin. Em ê li vê derê çend mînakên rêz bikin.

Porkur: Nîşana belayê û cezaya qebhetê ye. Bêçaretî ye, li ber belayê giran tiştê ji destê ewên ku bela bi serde hatine nayê û bi tenê ji wê kerbê porên xwe kur dikin. Bi taybet ev tiştê ji aliyên jinan ve tînetî kirin an jî ev tiştê li ser jinê tînetî kirin. Porkurî ji namûsê tînetî. Gava di zewacê de keç ‘ ne qîz be’ porê wê tînetî kurkirin û bi ser mala bavê wê de tînetî şandin. Porkurî jî vê edetê derketiye.¹¹³ Dema ku belayê bi ser lehangên çîrokê de tînetî, dayik an jî xwişkên wana porên xwe kur dikin, ev jî nîşana belayê ye.

Beranê reş û yê spî: Sembola tiştên dijberî hev in. Ronahî û tarîfî, şev û roj, xweşî nexweşî, qencî xerabî, mirin jiyar, hebûn tunebûn, mêranî tirsonekî, bedewî bedî, hêz bêhêzî. Ev sembola dibêje ku di ruh û fitrata mirov de her xislet heye, ev xisletana li hember hev in û wek beranê reş û spî her dem di tînetî de ne li ber hev didin.¹¹⁴

Tîremar: Tîremar neyarê piçûk e. Li aliyê din xerabiyên piçûk in, lê belê bi borîna demê re ev xerabiyên piçûk dikevin ser hevdu û giran dibin û dawîya dawiyê dibê sedeme canê mirovan.¹¹⁵ Tînetî wê wateyê ku xerabî piçûk be jî ger neyarê kirin. Di çîrokan de tîremar temsîliya xerabiyên piçûk dike lê di dawiyê de ev xerabiyên wer mezin dibin ku edî sererastkirina wana mimkûn (pêkan) nabe.

Yek: Di çîrokan de derbasdibe lawekî padîşah, lawekî pîrê, lawekî beg hwd. yek tenêfî û delalîbûn e.¹¹⁶ Tînetî wê wateyê ku dema kesekî bi tenê be xwedî qîmet e.

¹¹³ Ronî War, “ Şaristanî” Kovara W, j. 25, Adar-Avrêl, Stenbol 2009, r. 38.

¹¹⁴ H.b., r. 39.

¹¹⁵ H.b., r. 40.

¹¹⁶ H.b., r. 41.

Sê (Sisê): Di çîrokan de ev gotina wiha cihê xwe digire: Sê qîzên pêrî, sê lawên paşê, sê bira hwd. Sisê ji çêbûna mirov hetanî mirina mirov temsîl dike. Zayîn, jiyan û mirin.¹¹⁷

Heft: Di çîrokan de ev gotina wiha cihê xwe digire: Heft bira, heft tebeqe binê erdê, heft sal, heft roj, hûtê heft serî, heft şev û heft roj û hwd. Heft roj in, mirov bi heft bavê xwe tê nasîn, heft qat û tebeqeyên dinyayê hene, Xwedê di şeş rojan de alem afirandiye û roja heftan bêhna xwe berdayê loma hejmara heftan pîroz e. Ji ber pîrozbûna wê, ev hejmara di pirr çîrokan de derdikeve pêşberî me.¹¹⁸

Morîka Xewê: Xapandin e. Bextxerakirin e. Ev simbol li şûna waran û ji mexsedan hiştinê tîne bîra mirov. Dema ku morî dikeve guhê leheng tamara xewê li leheng radibe û dikeve xeweke giran. Di vê navberê de leheng ji miradê xwe dimîne.¹¹⁹

Teyrê baz: Hêz e, mêranî ye.¹²⁰

Hesp: Xwedîtî, esalet û ji xetereyan xelasî û rizgarî ye.¹²¹

Kund: Sembola warwendabûn, kavihbûn û bêyomiyê ye.¹²²

Şêr: Sembola hêz û serdestiyê ye.¹²³

Gur: Sembola xetereyê ye.¹²⁴

Hirç: Sembola dijiwariyê, hêz û girbûnê, girbûneke nelihev û hovîtiyê ye.¹²⁵

Pîra Mirovxwer: Xirabiyê temsîl dike. Bingeha hemû xerabiyên ev e.¹²⁶

¹¹⁷ *H.b.*, r. 41.

¹¹⁸ *H.b.*, r. 41

¹¹⁹ *H.b.*, r. 42

¹²⁰ *H.b.*, r. 42.

¹²¹ *H.b.*, r. 42.

¹²² *H.b.*, r. 42.

¹²³ *H.b.*, r. 42.

¹²⁴ *H.b.*, r. 42.

¹²⁵ *H.b.*, r. 42.

¹²⁶ Dilxwaz Herdem, “Di Gotinên Devkî de Hişmendiya Gel”, *Kovara W*, j. 25, Adar-Avrêl, Stenbol 2009, r. 45.

2. BEŞA DUYEM (EŞİRA ŞÊXAN)

2.1. Herêma Şêxan (Eşîra Şêxan)

Em ji aliyê erdnîgariyê ve gotina herêmê bikar nînin. Qesta me ji herêmê, cihê ku kesên ji heman sulaleyê (soy) tên, tê de dijîn. An jî bi gotineke din qesta me mintîqa ye. Herêma Şêxan¹²⁷ navê xwe ji Eşîra Şêxan digire. Sînorên vê herêmê bi fermî nediyar e. Li aliyê din kêma zêde ji aliyê gel ve tê zanîn. Li gorî erdnîgariyê Herêma Şêxa ji aliyê çend bajaran ve hatiye dorpeçkirin. Li Bakur Siwêreg, li başûr Riha û Wêranşar, li rojava Curnêreş (Hêlewan), li rojhilat bi Çiyayê Qerejdaxê ve cîran e.

Di dema Paleozoyîkê de, bi bandora orojenezê Kaledoniyen û Hersînyenê li vê herêmê mermer, kuvarsit şist, hatine holê. Di dema Mesozoyîkê de kevîrên bi karbonat (berespî- kêreçtaş), di Tersiyerê de kevîrên tort, di Kuvaternerê de kevîrên bazalt û aluvyon derketine holê.¹²⁸

Di demsala havînê de li vê herêmê dûkelîn (buharlaşma) zêde ye, bayên germ ji aliyê başûr ve tên, toz û hecaca havînê pirr e. Zivistanê baran dibare, sermayeke hişk heye lê ev sermaye pirr nadome. Berf li vê herêmê kêma dibare.

Erdên vê herêmê sor in û navên van erdan vertîsol in. Havînê ji ber germahiyê diqelişin zivistanê jî dema av lê dibe diwerimin. Xêliya darûberên vê herêmê step (rehekên bejkin û gîhayî), gonî (geven- Astragalûs), kelem, darên zeytûnan, darên fistiqan, darên tû hene.¹²⁹ Li vê herêmê çandiniya nok, nîsk, ceh, genim, pembo, garis, kuncî hwd. tê kirin li aliyê din di bîstanan de şamîk, bahcan, îsot, bamî, xitî, xiyar tene çandin. Ji bilî çandiniyê gelên vê herêmê debara xwe bi ajalvaniyê dikin. Ajalên weke mange, ga, mîh, bizinan xwedî dikin. Li herêmê kêma zêde 20-25 gund hene û serjimara van hemû gundan kêma zêde 7-8 hezar kes in. Rêjeya xwendinê li vê herêmê zêde ye. Ji vê herêmê hunermend, parlamenter, parêzer, bijîjk, mamoste, îlahiyatnas, endazyar, beydar û hwd. derketine. Em dikarin


¹²⁷ Bnr. Nexşe 1.

¹²⁸ İbrahim Atalay – Kenan Mortan, *Türkiye Bölgesel Coğrafyası*, İnkılap Yayınevi, İstanbul, 1997, r. 259-260.

¹²⁹ H. b., r. 270-271.

Şivan Perwer, Guler Işık, Necmettin Cevherî, Seydî Eyuboğlu, Fevzi Şeyhanlıoğlu (31 Rêbendan 2001ê de li parlamentoyê hate kuştin) mînak bidin.

Ji ber ku ev herêma navê xwe ji Eşîra Şêxan digire, em di derbarê vê eşîrê de agahiyan bidin wê taybetmendiyên vê herêmê jî derkevin holê. Beriya ku em hîn derbasî Eşîra Şêxan nebûne ger em di derbarê eşîrê de hinek agahî bidin. Eşîr çi ye? Hêmanên ku eşîran pêk tîne çine? û hwd.



Şekil 1: Nexşeya ku Herêma Şêxan Nîşan Dide.

2.2. Eşîr çi ye?

Ev pirseke dijwar e. Ji ber ku hîn li ser pênasî eşîrê konsensusek tune ye. Di derbarê eşîrê de wê gelek pênas werin (heta ku ên em gihiştinê) dayîn, da ku ji bo nasîna eşîrê asoyek li ber nerînên me vebe. Gotina eşîrê ewqas elastîkî ye ku dema behs tê kirin her kes dikare bi hêlekê bigire û ber bi xwe kaş bike. M. Emîn Zekî Beg taybetmendiyên eşîran di bin sê beşan de kom dike.

“Beşa yekem: Kurdên li deşt û çiyayên başûr dijîn. Ev kurdana nîvgerok in. Tebî’et û edetên eşîrên di vê beşê de pirr nêzîkî hev in. Çandiniyê zêde dikin û erdê wana gelekî bi bereket e. Di konçêkirinê, hesingeriyê, secade çêkirinê de xwedî hûner in. Ji aliyê xwendinê ve û di aliyê kar û bar kirinê de gelekî bi fam in û li gorî kurdên din gelekî bi pêş ketine. Şerker in û di rêveberiya serokên xwe yên irsî (ew û serokê wana ji heman xwînê ne) de dijîn. Nasnavê van kurdana Bebe ne, rêbir in, siwarên baş in, xwedîtiving in û karakterê (rewişt) wana bilind in. Mezinê van kurdên Bebe, Xalid Kurê Welîd e. Xalid Kurê Welîd li cem wana gelekî pîroz e û bawerîya wana ew e ku di saya serê Xalid de bûne misilman. Eşîrên di vê beşê de hemû Sunnî ne. Ji meha kewçêrê heta meha sibatê li gundên xwe rûdinin, di meha adarê de dikevin konan û diçin zozanan. Gelek serokên van eşîrana bi Ereban re zewicîne û bi vê sedemê têkiliyên van eşîran û Ereban gelekî hene. Jinên wana ciwan in, gelekê wana dixwînin û wekî mêran diçin nêçîrê.”¹³⁰

“Beşa duyem: Eşîrên ku li nav çiyayên bi cih bûne. Taybetmendiyên wana û yên beşa yekem ji hev cuda ne. Çandiniyê dikin, di av anîn û av parvekirinê de jêhatî ne. Titûnê û pirr cûre teneyan (hûbûbat) diçînin. Debara van eşîrana ji aliyê serokê wan ve tê kirin. Eşîrên şervan in, tîfingên xweş bikar tînin, nêçîrvanên bi nav û deng in. Di hemû gundên wan de kelehên wan hene, dema ku şer çê dibe xwe davêjin hundurê van kelehên û berevaniya xwe bi vî awayî dikin. Di nava van eşîran de hinek cihû hene. Lê eşîr pirr ji van cihûyan hez nakin. Ev cihûyana çekan hilnagirin (

¹³⁰ Mihemed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, (wer. Ziya Avcî), Çapa Yekem, Weşanên Awesta, Stenbol 2002, r. 223.

mafê çekhilgirtina wana tune ye) û beşdarî şerên eşîrê nabin. Cihû bi hespan re mijûl in û bazirganiyê dikin. Di nava van eşîran de bê cihûyan, nestûrî jî henin.”¹³¹

Beşa sisêyan: Ev eşîrana çiyayî ne. Him rûniştîyên wan hene û him jî nîvgerokên wana hene. Di nava van eşîran de hinek ajalvaniyê dikin, hinek jî bi çandiniyê mijûl in. Ji herdu beşên din zêdetir şervan in. Jinên wana gelekî karker in. Hêstir û keran jî xwedî dikin. Bi şikil û qelafetên xwe ji herdu beşên din cuda ne. Endamên van eşîran bi xoftir in. Mêraniya wana hîn zêde ye. Çekên wana yên baş tune ne, zexîreyên wana kêr in. Baweriya wana ola Îslamê ye, lê belê di warê mezheb û ol de agahdariyên wan kêr in.¹³²

Eşîr gotineke erebiye û ji bona kesên ku koçer û nîvkoçer tê bikaranîn.¹³³ Şemseddin Samî dibêje ku eşîr; ji eslekî derketiye, bi hev re dijîn, bi hev re koç dikin û bi hev re li cihekî biwar dibin, di teşeyê civat an jî di teşeya êlan de dijîn. Eşîrên Erebi, Kurd, Tirkman.¹³⁴ Pênasa têgeha eşîrê ji aliyê civaknasiyê de net nehatiye kirin. Ji ber vê sedemê pirr caran têgeha eşîrê, bi têgehên wek Qebîle, Oymak (eşîr), Cemaet, Boy (Ber) tîr îfadekirin. Di derbarê vê mijarê de M. Halil Yinanç di vê baweriyê de ye ku peyva “eşîr”ê ne ji “qebîle” ya erebî tê, ji peyva erebî ya ku “aşîra” ye tê. Bi vî awayî peyva eşîrê ya di tirkî de di wateya “Malbata Mezin” de nayê bikaranîn. Peyva eşîrê ji bona kesên koçer an jî nîvkoçer tê ye bikaranîn.¹³⁵

Ji aliyê civaknasiyê de Ziya Gökalp, bi awayekî sistematîk cara yekem di derbarê eşîran de agahî dane. Li gor Gökalp eşîr “civakên qewmî” ne (kavmi zümreler). Ji bilî vê navkirinê Gökalp ji eşîran re dibêje “ji aliyê siyasî ve qewmên malbatî” (siyasiyen ailevi zümreler). Ji ber ku eşîr ji aliyekî ve dişibe malbatan, ji aliyekî din ve ji dişibe desteyeke siyasî. Li gorî Gökalp pênc cûre eşîr hene:

1. Eşîrên Semiyevî

¹³¹ H.b., r. 223-224.

¹³² H.b., r. 224.

¹³³ Ahmet Çetintaş, *Aşiretlerin Sosyal Yapısı Üzerine Sosyolojik Bir İnceleme (İzollu Aşireti Malatya Örneği)*, (Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi), Isparta 2002, r. 44.

¹³⁴ Şemseddin Sâmî, *Kâmûs-ı Türkî*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1989, r. 938.

¹³⁵ Orhan Türkdoğan, *Güneydoğu Kimliği Aşiret-Kültür-İnsan*, 2. Baskı, Alfa Yayınları, İstanbul 1998, r. 20.

2. Eşîrên Batnî
3. Eşîrên Amarevî
4. Eşîrên Qebîlewî
5. Eşîrên Navenda Giraniya wê Şa'b' yên ku jê re dibêjin Parêzgeh (Îl)

Giraniya eşîrên semevî ji klanan pêk tê. Eşîrên parzemîna Avustralya yê ev cure eşîr in. Ji vana re “ eşîrên totemî yên asan” jî tê gotin. Eşîrên batnî ji yekbûna eşîrên semiyevî pêk tê û ji van eşîrana re “ eşîrên totemî yên geş buyî” jî tê gotin. Hîndî yên bakurê emerîkayê dikevin cureyên vê eşîrê. Eşîrên amarevî bi yekbûna eşîrên batnî pêk tên. Eşîrên Afrîkayê dikevin vê beşê. Eşîrên qewmî bi yekbûna eşîrên amarevî pêk tên. Eşîrên kurd û Ereban dikevin vê beşê. Beşa dawiyê yan eşîra, eşîrên şa'b in. Parêzgeh (Îl) dikevin vê beşê.¹³⁶ Li vê derê Gökalp bi çavê civaknasiyê li eşîran neriye.

Hinek nivîskaran dema ku pênasaya eşîrê kirine behsa xînamîtiyê û qebîleyê kiriye. Yek ji wan nivîskaran İsmail Beşikçi ye, Beşikçi pênasaya eşîrê bi vî rengî dike. Eşîr zêdetir, ji xînamîtiyên bi saya zewacê hatine çêkirin pêk tê. Ango eşîr tevahiya xînamîtiyê ye. Eşîr bi yekbûyîna qebîleyan derdikeve holê.¹³⁷ Ev pênasaya herçiqas bi qîmet be jî hinekî kêma xwuya dike. Li vê derê nivîskar cih, aborî, malbat, axa hwd. taybetî kêma hiştine. Dema ku ev taybetmendiyana bi temamî li ber çavan neyên raxistin, dibe ku nasîna eşîrê kêma bimîne. Ji ber ku van kêmasiyana ji holê rabe em ê hin nerînên din jî mînak bidin.

Ahmet Özer di derbarê Eşîra Burukan de (niha piraniya vê eşîrê li Wanê û gund û navçeyên wanê dijîn) berhemeke xweş amade kiriye. Di vê berhema xwe de di derbarê eşîrê de wisan dibêje: Kesên bi riya xwîne girêdayî hev in eşîrê pêk tînin. Li ser axeke diyar dijîn. Âjalvaniyê dikin û jiyana xwe bi koçerî diborînin. Ji bilî

¹³⁶ Ziya Gökalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, (amd. Şevket Beysanoğlu), Sosyal Yayınları, İstanbul 1992, r. 18-21.

¹³⁷ İsmail Beşikçi, *Doğuda Değişim ve Yapısal Sorunlar (Göçebe Alikan Aşireti)*, Doğan Yayınevi, Ankara 1969, r. 68-69.

eşîrên koçer, eşîrên niştecih û nîvkoçer jî hene.¹³⁸ Em dibînin ku pîrr nivîskaran jî pîrr aliyê ve pênasên eşîran dane, di van pênasan de nerîn hemû erênî ne, lê li aliyên din em dinêrin ku pênasa eşîran jî aliyê dewletê (Dewleta Osmanî) ve hînekî tûnd û nebaş hatiye kirin. Dewleta Osmanî pîrr caran bi guman li eşîran nihêriye. Ji ber vê sedemê peywirdarên dewletê yê li navendê û parêzgehan dixebitîn pênasa eşîran nebaş didan. Bi vî rengî behsa eşîran dikirin: “ Wehşî ne û di nava cehaletê de ne, tevgerên wana ne şarezayî ne.”¹³⁹

Nivîskar, zanyar, lêkolînerên Kurd, Tirk, Ereb û hwd. Di derbarê eşîran de bi sedan tişt gotine, bi dehan pirtûk û bi dehan gotar nivîsandine. Lê ger em hew bi tenê bi vana îqtîfa nekin. Ka gelo nivîskarên biyanî di derbarê eşîran de çi gotine? Nerînen wan bi çi awayî ne? Em çend mînakên ji kesên biyanî jî bidin.

Tevgera eşîran li gorî hîmê xinamtiyê hatiye avakirin. Bav û kalên eşîrê hevbeş in. Bi gelemperî hemû li ser erdekî dijîn. Tevgerê wana ya nevxweyî heye û li gorî vê nevxweyî yê beşeke sosyo polîtîk e.¹⁴⁰ Eşîr endamên xwe ji êrîşên derveyî diparêzin, armaca eşîran ya sereke domandina urf-edet û jiyana berê ye. Eşîr temamiya civatekê an jî civata ne.¹⁴¹

Di nava eşîran de nasnav girîng in. di nava eşîran de çend nasnav ev in:

Reyîs (Reîs)¹⁴²: Serokê eşîrê yê gelemperî ye.

Malmezin: Kesê ku nûnerê qebîleyê ye.

Mezin: Kesê ku serokê Bavê ye.

Pêşî: Serokê malbatê ye.

Egît: Qehremanê eşîrê ye.

¹³⁸ Ahmet Özer, *Doğu'da Aşiret Düzeni ve Brukanlar*, Elips Kitap, İstanbul 2003, r. 8.

¹³⁹ Alişan Akpınar- Eugene L. Rogan, *Aşiret Devlet, Osmanlı Devleti'nde Aşiret Mektebi*, Aramtöplüm yayınları, İstanbul 2001, r.15.

¹⁴⁰ Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (wer. Banu Yalkut), İletişim Yayınları, İstanbul 2003, r. 82.

¹⁴¹ Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, (wer. Kamuran Fıratlı), Doz Yayınları, İstanbul 1997, r. 135.

¹⁴² Bi gelemperî di nava eşîrên kurdan de li şûna gotina Reyîs (Reîs), gotina Axa tê bikaranîn.

Mele: Kar û barê eşîrê yê olî dike.

Şêx: Şêxê eşîrê

Arif: Berdevk, pisporê ayîna ye.

Ûtfa: Jina ku dikare hawarê ji eşîrên din bixwaze.

Şixxar: Pisporê dîrokê ye.

Çerqhecvan: Yê ku di şer de alayê radigire.

Şivan: Şivanê eşîrê ye

Abid: Yên ku qehweyê dikelînin û postageriyê dikin.

Hirobvan: Yê ku di herbê de defê lê dide.

Şînvân: Berpirsiyarê/a şîn girêdanê ye.

Gewende:¹⁴³ Yên ku di şahiyên de û merasîmên sunetê de def û zurneyê lê didin.

Serwan¹⁴⁴: nihêrvanê hespan.¹⁴⁵

Li gorî hemû van pênasan em dikarin çend taybetmendiyên eşîrê wisa rêz bikin:

1. Kesên ku ji heman bav û kalî hatine (sulaleya wana yek) eşîrê derdixin holê.
2. Xwedî serok in. Di nava eşîrên kurdan de her çikas hêza bavkanî yê (ataerkil) zêde be jî, hêza jinan jî ger neyê ji bîrkirin. Em dikarin bêjin ku car caran di

¹⁴³ Li welatê me ji bo kesên ku def û zurnê lê didin pirr nav tînan bikaranîn. Mînak: Pepe, Nikiltorî, Aşiq, Surum, Qereçî, Mîtrib û hwd.

¹⁴⁴ Herçiqas ku nivîskar dibêje Serwan nihêrvanê hespa ye jî ev tişt xeleq e. Ji ber ku kesên ku nihêrvaniya hespan dikin (Seyîs) in. Kesên ku nihêrvaniya hêştiran (deve) dikin Serwan in.

¹⁴⁵ İbrahim Bozkurt, *Tarih Boyunca Aşiretçilik ve Şanlıurfa Aşiretleri Tarihi*, İmaj Yayıncılık, Birecik 2003, r. 5.

nava eşîran de hêza pîrekan ji yan mêran zêdetir jî dibe. Mînak: Li bajarê Siwêregê Ayten Kırvar, Yıldıza Elî Axa hwd.

3. Rezîkên urf-edetên wana hen in.

4. Tekiliyên xinamtiyê yên di navbera wan de bi hêz in. Biraxwetî (kan bağı) gelekî girîng e.

5. Ji endamên xwe re weke sîwana ewlehiyê ye.

6. Eşîr piştewan e. Dema ku endamekî wê, xetereyek hate serî, eşîr vî kesî an jî kesan diparêze.

7. Hinek eşîr rûniştewan in (Şêxî, Qeregêçî), hinek koçer in (Bêrîtanî), hinek jî nîvkoçer in (Tirkan¹⁴⁶).

8. Di nava eşîran de biryara dawiyê Axa dide.

9. Devokên eşîran ji hev û din hinekî cuda ye. Mînak: Eşîra Pînyanişiyân di pîrr gotinên xwe de tîpa “r” bikarnînin, lê belê eşîra Mamxurana “r” bikartînin.

Bêje	Eşîra Pînyanişî (Hekkarî)	Eşîra Mamxuran (Hekkarî)
Erê	Heyê	Erê
Derî	Deyî	Derî
Serî	Seyî	Serî

Tablo 1: Cudahiyên di navbera zaravayên eşîran de

10. dijminahiyên di nava eşîrê de bi rêveberî û serokatiya axa têne çareserkirin.

¹⁴⁶ Ev eşîra li herêma Qerejdaxê ye.

11. Derindêzên (ayîn-toren) zewac, mirin û sunnetê di nava her eşîrê de cuda cuda ne.

2.3. Hêmanên Ku Eşîrê Pêk Tînin

2.3.a. Mal

Di nava eşîrê de hêmana sereke û ya piçûktirîn mal e. Bav, dê, keç, law, kal, pîr, nevî, neviyê neviyan û hemû zarokên ji vana çê bibe Malê pêk tînin. Di hinek lêkolînan de li şûna malê kon¹⁴⁷, çadır¹⁴⁸, akev¹⁴⁹, hatine bikaranîn. Ev binavkirina wisa tê xweyakirin ku ji bona eşîrên koçer hatine kirin. Di nava malê de ji her bavekî re pişt (göbek) tê gotin. Dema ku pênc pişt hatin bal hev, ev piştana dibin malek.¹⁵⁰ Di nava cihê ku mal tê de dijîn kesên xerîb tune ne, ger kesên xerîb hebin jî van kesana yan xulam in, an jî berdestî ne.

2.3.b. Malbat

Hêmana duyem ya ku eşîrê pêk tîne malbat e. Ji malekê zêdetir mal werin bal hev, malbat derdikeve holê. Ango ger malbatek were avakirin ji malekê zêdetir mal werin bal hev. Ji bo malek (malek ji pênc piştan pêk tê) bibe malbatek kêma zêde 100 sal hewceye. Li gorî hesabê eşîrê ji bona avabûna her pişteke 20 sal hewceye.¹⁵¹ Me berê jî gotibû ji bona pênasê eşîrê û hêmanên wê ramanekê hevbeş tune ye ji bona vê sedemê ger lêkolînek ji bona hemû eşîrên kurdan were kirin û hemû eşîr bi taybetmendiyên xwe were naskirin. Ger wisa nebe ev aloziyên di derbarê eşîr û hêmanên wê de wê wer berdewam bike. Ji ber ku di nava hinek eşîran de mal û

¹⁴⁷ Musa Taşdelen, *Göçerlerin Şehirleşmesi (Beritanlı Aşireti Örneği)*, Turan Yayınları, İstanbul 1997, r. 22.

¹⁴⁸ Beşikçi, *h.b.*, r. 76-77.

¹⁴⁹ Gökalp, *h.b.*, r. 18.

¹⁵⁰ Bozkurt, *h.b.*, r. 5.

¹⁵¹ Bozkurt, *h.b.*, r. 5.

malbat ji hev cuda ne,¹⁵² lê li aliyê din di nava eşîrekê de mal û malbat bi heman pênasê tê tarîfkirin.¹⁵³

2.3.c. Bav - Babik¹⁵⁴

Ji bona çêbûna Bavê, divê herî kêr du an jî hîn zêde malbat werin bal hevûdin. Ji bona bavek were holê divê 10 pişt derbas bibe. Li gorî vê yekê ji bona derketina Bavekî kêr zêde pêwîstî bi 200 salî heye.¹⁵⁵ Lê bavik di pir eşîran de nayê bikaranîn, an jî di hêmanên eşîrê de nayê hesabandin. Di nava hinek eşîran de Bav di wateya Ata (bi tirkî) tê bikaranîn. Di nava Eşîra Şêxan de Bav bi tena serê xwe nayê bikaranîn. Endamên eşîrê dema ku behsa nesla xwe dikin dibêjin: “Em ji piştta filan Bav û Kalî ne.” Em li vê derê dibînin ku Eşîra Şêxan li kêleka Bav, Kal jî bikartînin lê em di wê baweriyê de ne ku qesta ji vê bêjeyê xwepesin e, ango bikaranîna bav û kalan a di nava Eşîra Şêxan de nakeve kategoriyeke hêmanên eşîran.

2.3.d. Qebîle (Ber)

Ji bona qebîleyê ger herî kêr, du an jî hîn zêde malbat û bavek were bal hev. Dema ku vana hatin bal hev qebîle derdikeve holê. Ji bona qebîleyek were holê 30 pişt hewceye. Ev jî derdixe ber çava ku ji bona qebîleyek derkeve holê 300 sal hewceye.¹⁵⁶ Îcar çend qebîle tene bal hev û eşîrê derdixin holê. Li Rihayê Eşîra Şêxan ji pir qebîleyan hatiye holê. Qebîleyên mîna Haca, Mûska, Qubata, Binkasima, Şêxîmama, Kosa hwd. hatine bal hevûdin û Eşîra Şêxan derxistine holê.

Ger em hêmanên eşîran li gorî çend lêkolîneran bidin, wê tabloyeke wisa derkeve holê.¹⁵⁷

¹⁵² Li Rihayê Eşîra Şêxan

¹⁵³ Li Miksê (Wan) Eşîra Mûsayan mal û malbatê bi heman wateyê bikartînin.

¹⁵⁴ Li Hekkariyê dibêjin babik.

¹⁵⁵ Bozkurt, *h.b.*, r. 5.

¹⁵⁶ Bozkurt, *h.b.*, r. 5.

¹⁵⁷ Türkdöğän, *h.b.*, r. 27. (Em ê tabloyê bi reseniya wê bidin. Em wernagerînin Kurdî)

Li gorî Ahmet Özer	Li gorî Ziya Gökalp	Li gorî İsmail Beşikçi
Aile (Hanedan)	Ayal (Akev)	Çadır
Çadır	Ocak	Zoma
Zom	Soy	Kabile
Oba	Yarım Tire	Aşiret
Taifa (Tayfa)	Tire	
Kabile	Bölük (Amar)	
Aşiret	Boy	
Kol (Kabile)	İl	
	Uruk	

Tablo 2: Li Gorî Ahmet Özer, Ziya Gökalp û İsmail Beşikçi Sinifandina Eşîrê

Li aliyê din A.Vahap Uluç ji bo eşîrê, sinifandineke wisa derdixe holê: Emirlik, Aşiret, Kabile, Sülale/Mal, Mal, Şeni.¹⁵⁸ Li gor van agahiyan tê xwuyakirin ku her kesî li gorî xwe tiştek gotiye. Li gorî xebata ku me kiriye, sinifandina Eşîra Şêxan bi vî rengî ye.

Li gorî Mehmet Bozkoyun	Mînak
Mal	Mala Sînanê Xerîb Mala Ezîzê Hemê Eyo
Malbat	Malbata Heciyê Elî Malbata Eyê Sînan
Ber	Bera Haca Bera Mûska
Eşîr	Eşîra Şêxan

Tablo 3: Sinifandina Eşîra Şêxan

¹⁵⁸ A. Vahap Uluç, “Kürtler’de Sosyal ve Siyasal Örgütlenme: Aşiret”, *Mukaddime*, j. 2, Mardin 2010, r. 52. (Me navên di vê sinifandinê de wernegerandin kurdî)

2.4. Eşîra Şêxan

2.4.a. Eşîra Şêxan Ji Ku Hatiye?

Di derbarê vî tiştî de di destê me de tu çavkaniyên nivîskî tune ne. Lê belê li gorî gotinên mezinên vê eşîrê em dikarin bi şeweyeke sîstematîk rehên vê eşîrê derxînin holê. Mezin an jî zanayên eşîrê dibêjin ku: “ Em ji nesla Hezretî Husên¹⁵⁹ in. Şêxê me Sîn û Seydoş¹⁶⁰ e. Em berê li Kûfa¹⁶¹yê dijiyan, paşê, peşiyên me hatine Reqqa¹⁶² yê.^{163,164} Piştî wefata Mûawiye (Serokê Dewleta Emewiyan) kurê wî Yezîd (Yezîdê I. 646-683) hate ser textê Emewiyan. Yezîd piştî hemû hêza dewletê bi dest xist û xelîfetiya xwe dazanîn. Hezretî Husên xelîfetiya Yezîd nepejirand. Li aliyê din waliyê Kûfeyê jî xelîfetiya Yezîd nepejirand û ji Hezretî Husên re bî`at kir. Ji ber vê bûyerê di nava Yezîd û Hezretî Husên de şerê Kerbelayê qewimî. Di vî şerî de Hezretî Husên şehîd dikeve. Piştî Şhadeta Hezretî Husên alîgirên wî yên li Kûfeyê, pirr zilm û zora Yezîd dibînin. Di wê demê de pêşiyên Eşîra Şêxan jî li Kûfeyê dijiyan û ew jî alîgirên Hezretî Husên bûn. Pêşiyên Eşîra Şêxan ji ber vê zilmê dî-nedîn koçî Bexdadê kirin. Bi qasî sed salî li Bexdadê man. Di dewra xelîfeyê Ebbasî Harûn Reşîd (763- 809) de, ji bona teblîxkirina Ola Îslamê, bi destûra Harûn Reşîd hatine Reqqa yê.

Piştî Reqqayê hatine derdorê Çiyayê Maziyê (Mêrdîn), paşê ji vê eşîrê hinek li Mêrdînê mane, hinek jî çûne Bêcirmanê¹⁶⁵ û Begaz ê (Qercos- Elîh). Li gorî gotinan, ên li Mêrdînê mane sê bira ne. Ji van sê birana yekî keçikeke êzîdî revandiye piştî vê bûyerê ji Mêrdînê barkirine hatine Qerejdaxê. Dema tîna Qerejdaxê herdu

¹⁵⁹ Zarokê Elî Kurê Ebûtalib e (r.x.l.). Neviyê Hezretî Pêxembere (s.x.l.)

¹⁶⁰ Sîn û Seydoş: Di derbarê van herdu kesan de wesîqayêke dîrokî tune ye. Niha qebra wan li gundê Qumtereyê ye (Mêrdîn-Dêrik). Tê texmîkirin ku di sala 1280 yî de ji Bexdadê hatine vî derê. Ji bona belavkirina Ola Îslamê xebitîne û hatine kuştin. Nesla van herdu kesan wisaye: Sîn û Seydoş kurê Şad Ebûbekîr, kurê Elî Taqî, Kurê Mûhammed Hadî, kurê Hesên ‘Eskerî, kurê Mûsa Riza, kurê Elî Taqî, kurê Mûsa Kazim, kurê Cafer Sadiq, kurê Mûhemmed Baqir, kurê Zeynelabîdîn, kurê Îmam Husên, kurê Îmam ‘Elî.

Bnr.<http://www.semskiasireti.com/?Syf=18&Hbr=486428&/%C5%9EEYHANLI,->

%C5%9EEYHAN,-%C5%9EEYX%C4%B0-A%C5%9E%C4%B0RET%C4%B0, (2 Adar 2014)

¹⁶¹ Bajarekî li Îraqê ye. Li kêleka Çemê Feratê ye. 170 km yî li başûrê Bexdadê ye.

¹⁶² Bajarekî li Sûriye yê.

¹⁶³ Hevpeywîna bi Evdilqadir Akborû re, (11.07.2012)

¹⁶⁴ Hevpeywîna bi Sînan Buğdaycı re, (30.08.2013)

¹⁶⁵ Hinek kesên ‘eşîrê di wê baweriyê de ne ku Seyîd Bîlalê Bêcirmanê, mezînekî Eşîra Şêxan ye.

bira ji yê ku keçika êzîdî revandiye re dibêjin: “ Te tiştêkî di ola me de tune ye kiriye. Ji ber vê em ê terka te bikin. Tu bi me re nê.” Ji wan herdu birayan yek dihere Herranê yek jî dihere Deşta Pirsûsê (Sirûc). Di nava vana de (birayê ku li Qerejdaxê ma) bapîrên bera Haca ye. Ev kesa tevî malbata xwe ji Qerejdaxê bar dike û têne gundê Hêgiç¹⁶⁶ ê, paşê têne zuxurê paş gundê Begeliyê bi cih dibin. Wê demê gundê Taşli yê Qeregêçiyên bû û ev gunda hemû lewe (bataxlix) bû, kesek nikarî bû li vir bijiya. Axayê Qeregêçiyên Ayib Beg, ev gund diyarî mezinê Haca, Mihoyê Elî kiriye. Paşê malbata Mihoyê Elî hatine û ev leweya (bataxlix) hemû hişk kirine û êdî di vî gundî de bi cih bûne.¹⁶⁷

2.4.b. Berên Eşîra Şêxan

Eşîra Şêxan eşîreke mezin e. Li pîrr deran dijîn. Di vê demê de li Bexdadê, li Heseke (Sûriye- li derdorê Çiyayê Kurmanca), li bajarên Serhedê, li Haymanayê û Cihanbeyliyê (Konya), li Polatliyê (Enqere), li Mêrdînê, li Elihê (Batman), li Siwêregê, li Curnêreş (Hîlvân-Riha), li Hewagê (Bozova- Riha), li Wêranşarê, li Pirsûsê (Sirûc- Riha), li Bîracikê (Bîrecîk-Riha) Eşîra Şêxan hene. Piraniya vê eşîrê li Rihayê dijîn. Li Herêma Rihayê ev eşîra bûye çar beş û her beşek ketiye bin federasyona eşîrekê. Beşek li Wêranşarê dijîn û di bin Federasyona Eşîra Milî de ye. Beşek di nava Federasyona Eşîra Beraziyan de ye. Beşek di nava Federasyona Eşîra Bazikiyan de ye. Beşa dawiyê jî di nava Federasyona Eşîra Qeregêçiyên de ye.

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg di pirtûka xwe de,¹⁶⁸ Bazikiyan û Qeregêçiyên wek federasyon nabîne, van herdu eşîrana û bi dehan eşîrên din dixê nava Federasyona Eşîra Milî. Ji bilî vê yekê Eşîra Şêxan di nava van eşîran de nayê jimartin. Ji bo nimûne em ê navê çend eşîran bidin.

¹⁶⁶ Gundekî Curnêreş e.

¹⁶⁷ Hevpeywîna bi Evdilqadir Akborû re, 11.07.2012

¹⁶⁸ Mihemed Emîn Zekî Beg, *h.b.*, r. 254-255.

FIRQEYÊN KU GIRÊDAYÎ EŞÎRA MILIYAN			
EŞÎR	TAYBETMENDIYÊN EŞÎRA	EŞÎR	TAYBETMENDIYÊN EŞÎRA
Wanan	250 mal in û koçer in	Îsyadat	75 Mal in û koçer in
Seydan	450 mal in û koçer in	Terkan ¹⁶⁹	700 Mal in û koçer in
Kerran	550 mal in û koçer in	Nasiryan	75 Mal in û koçer in
Dodîkan ¹⁷⁰	Hejmara malên wan ne kifş e, koçer in	Çewan	210 Mal in û koçer in
Xelecan	700 mal in û koçer in	Sartan	80 Mal in, koçer in û nêzîkî Resûl'eynê rûdinin.
Keliş	Eşîreke koçer e	Ûsbaxan	70 Mal in û koçer in
Mendan	Eşîreke koçer e	Matemiye	800 Mal in û koçer in
Komereş ¹⁷¹	350 mal in û gerok in	Çemikan	250 Mal in û koçer in
Şerkeyan	80 mal in û koçer in	Bergewan	150 Mal in û koçer in
'Elekwat	Koçer in	Hesûliye	550 Mal in û koçer in
Daşî	Koçer in	Çiyareş	Hejmara malên wan ne kifş e û koçer in
Meşkênî	Koçer in	Zebrofkan	2000 Mal in û nivkoçer in. Li Qerejdaxê rûdinin.
Kalindelan ¹⁷²	Koçer in	Zaxaşî	Eşîreke nivkoçer a mezin e û li rojhilatê Siwêregê rûdinin

¹⁶⁹ Navê vê eşîrê yê rast Tirkan e.

¹⁷⁰ Navê vê eşîrê yê rast Dodikan e.

¹⁷¹ Navê vê eşîrê yê rast Kumreşan e.

¹⁷² Navê vê eşîrê yê rast Qelenderan e

EŞÎR	TAYBETMENDIYÊN EŞÎRA	EŞÎR	TAYBETMENDIYÊN EŞÎRA
Hacî Bayram	Koçer in	BESKÎ ¹⁷³	800 mal in rûniştî ne. Rîwayete xerîb di derheqê vê firqeyê de heye, ku eslê xwe fransîz an îngilîz bûne û navê wan ê qedîm Salargan bû ye.
Hesenekan	260 Mal in û koçer in	QEREKÊÇÎ ¹⁷⁴	1700 mal in, nîvkoçer in û nêzikî Siwêregê rûdinin. Dirr, çiyayî û xerabker in. Piraniya wan zazakî ¹⁷⁵ diaxivin. Di navbera Diyarbekrê û Turabidînê de jî gelek kurd hene ku bi zahirî ji Qerekêçiyânin.
Xelecarî	700 Mal in û koçer in		
‘Elya	Koçer in		
Bûcaq	Hejmara malên wan ne kifş e û koçer in		
Hoşyan	Hejmara malên wan ne kifş e û koçer in		
Merdîs ¹⁷⁶	1000 Mal in û îhtîmal e gerok bin		

Tablo 4: Firqeyên girêdayî Eşîra Miliyan¹⁷⁷

¹⁷³Navê vê eşîrê yê rast Bazikî ye. Ji ber ku ev jî federasyoneke ku Eşîra Şêxan di nava vê federasyonê de cih digire.

¹⁷⁴Navê vê eşîrê yê rast Qeregêçî ye. Ji ber ku ev jî federasyoneke ku Eşîra Şêxan di nava vê federasyonê de cih digire.

¹⁷⁵ Ev gotina qet ne rast e. Qeregêçî ji sedî sed bi Kurdiya zazakî ne, bi Kurdiya kurmançî diaxivin

¹⁷⁶ Navê vê eşîrê yê rast Mirdêsî ye.

¹⁷⁷ Mihemed Emîn Zekî Beg, *h.b.*, r. 254-255.

Li aliyê din Mihemed Emîn Zekî Beg, Eşîra Beraziyan weke federasyonekê dibîne, Eşîrê Şêxa jî, ji eşîreke vê federasyonê dihesibîne.

FIRQEYÊN KU GIRÊDAYÎ EŞÎRA BERAZIYAN (9000 MAL)	
EŞÎR	TAYBETMENDIYÊN EŞÎRA
Keytikan	700 Mal in
<u>ŞÊXAN</u>	<u>600 Mal in</u>
Okyan (Ewkiyan)	700 Mal in
Şeddadan	700 Mal in
Milîdinbilî	700 Mal in
Me'afan	700 Mal in
Zerewan	500 Mal in
Pîcan	700 Mal in
Qerekêçan	500 Mal in
Denyan	1000 Mal in
Mîr	1000 Mal in
Dîdan	300 Mal in

Tablo 5: Firqeyên ku girêdayî eşîra Beraziyan¹⁷⁸

¹⁷⁸ Mihemed Emîn Zekî Beg, *h.b.*, r. 258.

Me berê jî gotibû Eşîra Şêxan eşîreke pîrr mezin e. Ji ber vê sedemê ne pêkan e ku em hemû berên vê eşîrê bizanibin û binivîsînin. Me bi tenê Berên ku li derdora bajarê Rihayê ne¹⁷⁹ koland, tabloyeke bi vî rengî derkete holê.

BAV	BER
Şêx Cafer	Bilqasiman ¹⁸⁰ , Şêxka, Dewara, Şêx Heydera,
Şêx Şefqet	Haca (Donikî ¹⁸¹), Hemza, Şêxîmama, Mûska, Beşaltiya
Şêx Weys	Şêxşeda, Qubata, Hirdoya, Qasoya, Leliya, Hekanan, Çapoya, Nikija
Şêx Seyfeddîn	Serxweşa, Qota, Şêx Eliya, Şêx Remed(z)ana, ‘Elûşa
Îzeddîn Ebû Hemra	Ni’ema ¹⁸²

Tablo 6: Berên Eşîra Şêxan¹⁸³

¹⁷⁹ Ber yên ku di nava Herêma Şêxan de.

¹⁸⁰ Navê vê berê yê rast “*Bînqasiman*” (gotineke erebî ye) ango “*kurên Qasim*” in, lêbelê di nava eşîrê de pîrr kes vê rastiyê nizanin û dibêjin “*Bilkasiman*”

¹⁸¹ Li Sûriye yê ji Hacan re dibêjin Donikî yan. Li gorî gotinê, îftereyek li pîreka Şêx Şefqet dibe, Şêx Şefqet ji millet re dibêje, ez ê pîreka xwe têxime nav agir ger gotinên we rast be wê bişewite, ger gotinên we ne rast be wê neşewite. Şêx Şefqet hinek don bi ser pîreka xwe de dirjîne û wê davêje nava êgir, lê belê agir pîreka wî naşewitîne. Tê fehmkirin ku îftere li vê pîrekê bûye. Ji vê bûyerê şûnda ji vê berê re dibêjin bera Donikî yan.

¹⁸² Ev bera niha li Herranê li gundê Xizanê bi cih bûye. Li gorî gotinan kurên Îzeddîn Ebû Hemra tunebûne, ev bera ji nesla qîza wî tê.

¹⁸³ Hevpeyvîna bi Îbrahîm Kîrmızıgöz re (25.09.2014)

Li pir cihên Anatolya yê, li Sûriyê, li Îraqê bi sedan gundên Eşîra Şêxan hene, lêbelê ger em bizanibin ku di hinek gundan de hejmara vê eşîrê kêr e, di hinek gundan de hejmara vê eşîrê zêde ye, hinek gund jî hene bi tevahî endamên vê eşîrê tê de dijîn. Lê ne mimkûne ku em hemû gundan zanibin. Em ê li vê derê ji bona nimûneyê hinek gundên ku Şêxa lê dijîn li ser tabloyekê bidin. Ger em li vê derê navê hinek gundan nedin, em bawer dikin ku wê mijar kêr bimîne.

BER	GUND
Haca	Taşli, Beg Elî, Qizirelî, îsk, Kepez
Şêxîmama	Çiraxim, Tahtok, Deliqulî, Qosarî, Çetelox, Ûzimqar
Hirdoyî	Gogmûs, Simaqî, Gêçilî, Şiket, Kosecix
Qubata	Dêlo, Dolablî, Qapaxlî, Kurot, ‘Enzelî, Qeynter, Nano, Axizbûk, Hemedîxan, Şebeke, Qosariya Jêr
Mûska	Bozq
Beşaltiya	Xirbê Zerê
Hemza	Êrdîk, Çetelox, Qûç
Dewara	Silûlî, Qurtênî, Salor, Qurbaxlî
Bektoya	Xirbê Kewa, Xirbê ‘Aşîqa
Hêcî	Sulêmanfeq, Xirbê Mara, Sarîncî Qirêc
Leliya	Ziftîl, Qilîçek
Şêxşeda	Buxdûkan, Bazin, Xirbê Zêra, Oxlan, Xanik, Qewaxlî, Axsarînc, Buxdûşan, Qeyntera Îsê, Qeyntera Şêxê Şeddo, Xirbê Moriya, Dawûdî

Tablo 7: Çend gundên Eşîra Şêxan¹⁸⁴

¹⁸⁴ Hevpeyvîna bi Eyyûp Bozkoyun re (03.08.2010)

2.4.c. Şecereya Eşîra Şêxan

Şecere di nava eşîran de gelekî girîng e. Li cem hemû eşîran, şecere an nivîskî ne an jî ji aliyê hinek kesan ve hatiye ji ber kirin. Bi vî awayî ji nifşekî derbasî nifşekî din bûye. Li gorî ku şecereya di destê me de 41 bav hene. Min bi xwe ev şecereya nivîskî nedî, lê yê ku ev şecereya li cem xwe tomarkiriye¹⁸⁵, şecereya nivîskî bi xwe dî ye. Ev şecere di nava sînoren Tirkîyeyê de tune ye, şecere li Sûriyeyê, li bajarokê Kobanê li gundê Zor Mixarê ye.¹⁸⁶ (Mixabin ji ber şerê ku di nava Suriyeyê de aqûbeta ew kesên ku li Zor Mixarê dijîn ne diyar e.) Li gorî şecereyê nîjada Eşîra Şêxan (Bera Haca- bi tenê bavek) ev e:

Sînanê Xerîb, Xerîbê Demo, Demoyê Hecî, Heciyê Elî, Eliyê Bişêr, Bişarê Hemed, Hemedê Husên, Husênê Mehmûd, Mehmûdê Hecî, Heciyê Seyîd Ehmed, Seyî Ehmedê Kalê, Kalêyê Kalhecî (Hec Miz- Hecî Mislim), Kalhecîyê Hec Hesên,¹⁸⁷ Hec Hesênê Seyîd Îbrahîm, Seyîd Îbrahîmê Seyîd Şêx Şefqet, Şêx Şefqetê Şêx Muhammed Selîm, Şêx Muhammed Selîmê Seyîd Seyfettîn, Seyîd Seyfettînê Seyîd Îmam Evdillah, Seyîd Îmam Evdillahê Seyîd Ehmed Rufaî, Seyîd Ehmed Rufaiyê Seyîd Hesên, Seyîd Hesênê Seyîd Elî Rufaî, Seyîd Elî Rufaiyê Seyîd Yehya, Seyîd Yehyayê Seyîd Muhammed Sadiq, Seyîd Muhammed Sadiqê Seyîd Elî Huzzam, Seyîd Elî Huzzamê Seyîd Ehmed, Seyîd Ehmedê Seyîd Elî, Seyîd Eliyê Seyîd Hesên Mukerrem, Seyîd Hesên Mukerremê Seyîd Muhammed Mehdî, Seyîd Muhammed Mehdiyê Seyîd Muhammed Qasim, Seyîd Muhammed Qasimê Seyîd Hesên, Seyîd Hesênê Seyîd Husên, Seyîd Husênê Seyîd Mûsa Sanî, Seyîd Mûsa Saniyê Seyîd Îmam îbrahîm, Seyîd Îmam îbrahîmê Seyîd Murtez(d)a, Seyîd Murtez(d)a yê Seyîd Mûsa Kazim, Seyîd Mûsa Kazimê Seyîd Îmam Caferê Sadiq, Seyîd Îmam Caferê Sadiqê Seyîd Îmam Muhammed Baqir, Seyîd Îmam Muhammed

¹⁸⁵ Hevpeyvîna bi Îbrahîm Kırmızıgöz re (25.09.2014)

¹⁸⁶ Hevpeyvîna bi Îbrahîm Kırmızıgöz re (25.09.2014)

¹⁸⁷ Hevpeyvîna bi Mehmet Bozkoyun re (07.07.2014), Hevpeyvîna bi Hasan Bozkoyun re (08.07.2014), Hevpeyvîna bi Şemseddin Bulut re (10.07.2014)

Baqirê Seyîd Îmam Zeynelabidîn, Seyîd Îmam Zeynelabidînê Seyîd Îmam Husên, Seyîd Îmam Husênê Îmam Elî.¹⁸⁸

2.4.d. Di Nava Eşîra Şêxan de Lîstik¹⁸⁹

Qesta me li vir ne bi tenê lîstikên gel in, qesta me ji lîstikan hem lîstikên gel û hem jî lîstikên zarokan e. Berê berê em ê behsa lîstikên gel (halk oyunlari) bikin paşê em ê behsa lîstikên zarokan bikin.

Lîstikên gel bi taybetî di dema bûk derxistinê (şahî) de tê leyîstin. Ev lîstikana di qadeke fireh de tê leyîstin. Jin û mêr hemû bi hev re dileyîzin. Govend her tim bi hêla rastê de diçe. Ê/a ku li serê govendê ye jê re dibêjin “*ser govend*” ê/a ku li dawiya govendê ye jê re dibêjin “*boçik*”. Ser govend rê ji govendê re vedike û govendê bi xwe re dibe. Boçik jî dema ku govend xwaro-maro dibe bangî govendê dike dibêje: “*Çep lêxin, çep lêxin*”, bi vî awayî dawiya govendê sererast dike. Di govendê de tevgera daholvanan jî pîr girîng e. Dema ku daholvan hate ber yekî û ji wir neçû û qolîkê daholê di ser serê wî zilamî re doş bike, ger zilamê ku dahol li ber lêdikeve hinek bexşîş bide daholvan da ku daholvan ji hinda wî biçe. Daholvan tu caran ji pîrekan bexşîşê naxwazin. Roja dawiyê ya şahiyê rojêke taybet e. Ji wê rojê re “*roja şabaşê*” tê gotin. Roja dawiyê ya şahiyê daholvan, kesên ku di govendê de ne, yek bi yek dihere bal wana, li cem wana disekine qolîkê daholê di ser serê wana re doş dike, hinek laqirdiyan dike û dibêje : “*Şabaş, şabaş*”, daholvan dema ku go şabaş ew ê ku li ber wî dahol lêdikeve hinek pere dide daholvan, daholvan ji cem wî diçe cem ên din û bi vî awayî govend diqede. Hinek cûreyên lîstikên gel ev in: Giranî, Kerê Boz, Dûzo, Holbanî, Delîlo, Lorkê, Du Nig.

Li aliyê din di nava zarokên eşîrê de hinek lîstikên tene lîstin, em çend mînakên li vê derê bidin.

Berdonek: Bi êvaran dihate leyîstin. Zarok dibûn du beş, her beşek ji pênc, şeş an jî ji heft hevalan pêk dihat. Her beşekê serokekî wê hebû. Di vê lîstikê de

¹⁸⁸ Hevpeyvîna bi Îbrahim Kırmızıgöz re (25.09.2014), (Vî zilamî ev şecereya li gundê Zor Mixarê – Sûriye, Kobanê-, Ji mala Şêx Mihemedê Narîkê ji cem Mistefayê Hec Silêman aniye)

¹⁸⁹ Di lîstikên gel de jin û mêr bi hevûdin re dilîzin lê belê ev tişt li gorî Ola (Dîn) Îslamê tiştêkî xelet e.

kevirekî mezin, weke keleha dihate hesêb û ji aliyê beşekê ve dihate parastin. Ji vî kevirî re digotin “*Qurm*”. Beşek di tariya şevê de diçû xwe vedişart, beşa din jî du heval li hinda kêvir diman, ên din jî diçûn li yê xwe veşartî digeriyan. Ji ewên ku xwe vedişartin yekî tenê bihata destê xwe bi wî kevirî bikira, careke din wana diçûn xwe vedişartin, ên din dîsa li wana digeriyan. Rêbazeke din di vê lêyîstikê de hebû, ewên ku xwe vedişartin ger her deh-panzdeh xûlekan carekê bi dengê bilind bang bikira û bigota “*em van in, em van in*” hetanî derengiya şevê ev lîstika berdewan dikir.

Germo Germo Qîjo: Bi êvaran dihate leyîstin. Hejmara lîstikvanan ne diyar bû. Bi dehan kes dikarîbû di vê lîstikê de bilîstana. Ji bo vê lîstikê, şekirek an jî kevirekî sipî û çargoşe hewcebû. Di tariya şevê de, hemû zarok li ciyekî diciviyan û di nava wan zarokan de, yekî kevir an jî şekirê sipî bi hêzekê diavête dûr. Paşê digot min avêt û hema hemû zarok diçûn û li wî kevirî digeriyan. Kê ew kevera bidîta bang dikir û di got “*Germo germo qîjo*”. Ewî ku kevir didît îcar wî kevir davêt û hemû zarok careke din li wî kevirî digeriyan. Lîstik bi vî awayî hetanî derengiya şevê berdewam dikir.

Qozî: Bi piranî piştî nîvro ji aliyê du kesan ve dihate leyîstin. Kevirekî çîmento û gilover li ser kevirekî dihate danîn. Ewên ku dikin vê lîstikê bilîzin her yekî jî kevirekî pahn ji xwe re diciband in. Herduyan kevirên xwe diavêtin hinda wî kevirê gilover, kevirê kîjanî nêzîkî kevirê gilover bûya wî dest bi lîstikê dikir. Ewî ku dest bi lîstikê kir kevirê xwe yê pahn davêt û di yê gilover de lêdixist. Dema ku kevirê gilover pekiya, lîstikvan diçû bi lingan navbera cihê ku kevirê gilover li ser û cihê ku kevirê gilover pekiyaye dijmart. Hejmara kîjanî pirr bûya ew biser diket.

Pişquto: Ji aliyê du qîzan, bi moriyan ve dihate leyîstin. Her yekê moriyên xwe beranber (Hejmara moriyan beranber bû yek bi yek, dudu bi dudu, sisê bi sisê) dikirin nava kayê, paşê ew moriyana di nava kayê de vedişartin. Morî û ka di nava herdu lepên xwe de dikirin mîna qûça, paşê her yekê qûçek hildibijart, di binê wan qûçan de çend morî derketa her yekê ji xwe re wan moriyana dibirin. Di vê lîstikê de navên moriyan hebû. Lek, Cînciq, Lîlo, Mircan. Cînciqek beranberî du lekan, Lîlo beranberî du Cînciqan, Mircan beranberî du Lîlo yan bû.

Delo:¹⁹⁰ Bi pênc keviran dihate leyîstin. Lîstikvanan her tim kevirek holî hewa dikirin û kevirên din radikirin. Ger ev kara bi destekî tenê bihata kirin. Du dest bihata bikaranîn ew kesa ji lîskê derdiket. Cara ewil “*yekik*” bû, lîstikvan, kevirek davêt hewa û kevirên jêrê yek bi yek radikirin. Cara duduyan “*duduk*” bû, lîstikvan, kevirek davêt hewa û kevirên jêrê dudu bi dudu radikirin. Cara sisêyan “*sisik*” bû, lîstikvan, kevirek davêt hewa û kevirên jêrê sisê bi sisê radikirin. Cara çaran “*tepiş*” bû, lîstikvan, kevirek davêt hewa û kevirên jêrê hemû bi hev re radikirin. Cara pêncan “*tilik*” bû, lîstikvan, kevirek davêt hewa, kevirên jêrê hemû di keva destê lîstikvan de bû û bi vî awayî tiliya xwe ya nîşanê di ‘erdê dida. Cara şeşan “*konçandir*” bû, tiliya nîşanê didan ser tiliya ortê, (destê çepê) tiliya beranekê û tiliya ortê ji hevdu vedikirin. Paşê çar kevir li ber van tiliyan belavdikirin. Kevirek diavêtin hewa û her carekê kevirekî jêrê di bin van tililiyan (weke çatmeyekê dihate vekirin) re dibirin aliyên din. Dawiya vî karî lîstikvan her pênc kevir dikirin kefa destê xwe û hemû bi hev re diavêtin ser destê xwe, çend kevir li ser destê lîstikvan bimana ew kevirana bi derbekê ve cardin destê xwe doş dikirin û dikirin kefa destê xwe. Di kefa destê wana de çend kevir bimana lîstikvan ew qas pûan qezenç dikir. Ji vê re digotin “*qal*”. Di daviya lîstikêde, kê hindik pûan bigirtana wana destê xwe li erdê dadanîn û ê lîstik qezenckirî kevirek holî hewa dikir û bi pênc awayî, li ser destê ku li erdê hatiye danîn dileyîst. Cara ewil “*perîncok*”, cara duduyan “*şûjinok*”, cara sisiyan “*derzîkok*”, cara çaran “*sabûnok*”, cara pêncan “*mêkutok*” bû.

Ka'nî : Ji qulaç an jî laç¹⁹¹ an dihate çêkirin. Ka'nî ji du baskan, kevikek û ji sîrçaqekê pêk dihat. Cureyên baskan hebûn : “ Baskê marikî, baskê topikî û baskê panikî.” Kefîkê, herdu bask bi hev re girê didan. Ji cihê ku bask bi kefikê ve dihate girêdan re “*kabok*” dihate gotin. Kefîk dişibiya kefa destê mirovan. Kefîk ji qulaçan dihate çêkirin carcaran ser van qulaçana bi eyarekî dihate rû kirin. Sîrçaq ji deziyên naylon dihate çêkirin û bi baskekî ve dihate girêdan. Peywira sîrçaqê deng derxistin bû. Dema ku kevir bi ka'nî dihate avêtin sîrçaq xweşbûya, ka'nî dengekî ecêb

¹⁹⁰ Wênayên ku di derbarê vê lîstikê de di pêvekê de (pêvek 1-14) hatiye dayîn.

¹⁹¹ Fahîke an jî gore dihatin vereşandin û deziyê fahikeyan an jî yên goreyan ji aliyê zarokan ve li hev dihate badan. Ji van deziyên badayî re digotin “*qulaç*” an jî “*laç*”, qulaçên herî bi qîmet yên arlo bûn. Qulaçên ji deziyê naylon dihate çêkirin pirr ne bi qîmet bûn.

derdixist. Ev denga kê m zêda wisa bû : “*Şirîqqqq*”. Lîstika ka‘niyan hêsan bû, her kesî kevirê di kaniyê xwe de davêt, kevirê kê zêdetir biçûya wî pêşbirk qezenç dikir.

Di nava Eşîra Şêxan de lîstikên bi navê “*qolçî-qaçaxçî*”, “*qît*”, “*tek*”, “*çurê*”, “*tekme*”, “*sobe*”, “*heft tûl*” jî hebûn.

2.4.e. Di Nava Eşîra Şêxan de Jûr (Ode)

Di şevên zivistanê yê dirêj de, qadên çanda kurdî jûr bûn. Li hemû gundan jûrên bi nav û deng hebûn. Mîna her eşîreke kurd di nava Eşîra Şêxan de jî jûrên bi nav û deng hebûn. Jûra Xelîlê Demo, jûra Husênê Bişo, jûra Hemê Seydo, jûra Sinanê Elî ji wan jûrên navdar bûn. Di şevên dirêj de Eyê Gerût bi laqirdiyan, Hemê ‘Arif bi stranên, Xelîlê Demo bi helbestên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, bi Rîsaleyên Nûr, Eyûbê Xelîl bi beytên ‘erbaneyê, Sînanê Reşo bi hewadîsên rojane, Seydoyê Hepoş bi dîroka Eşîran, jûr dikirin qadeke zanistiyê.

Herçiqas ku birêz Eyüp Kiran dibêje ku di odeyan de qehwe kelandin adetê axayan bû,¹⁹² lê ez ne di wê baweriyê da me ji ber ku di nava Eşîra Şêxan de jûrên min li jorê navên wana rêzkirine tenê odeyek ya axa ye. Di jûran de kelandina qehweya Yêmenê û Mirre¹⁹³ yê tiştê girîng bû. Weke rîtûelekê her sibe û êvaran dihate dûbarekirin. Rîtuel wisa bû: Berê berê hebin qehweyê yê gir di taweyekê de dihate qelandin, paşê qehweya qelandî dikirin dîbegê û bi ors qehwe dikutan. Hetanî ku weke kilê sibhanî hûr dibû, paşê di gumguman de av li ser arê sergînan dikelandin, piştî av kelandinê ava germ bera misînekî piçûk didan. Navê wî misînî “*eşra*” bû. Av ji ‘eşrayê bera cezweya qehweyê didan, qehwe ji cezweyê bera du cot *fîncanên mekawê* didan. Qehwe wekî mastê tîr dibû. Qehwe belavkirin ji aliyê rastê ve dest pê dikir. Qehwe berê para rûsîpiyan bû.

Mirre jî bi heman awayî dihate amadekirin. Yê ku Mirre belavdikirin hemû nezewicîbûn. Dema kesê ku Mirre vexwar ger fîncana xwe li erdê daneniya. Dema ku fîncan neda qehweger û fîncan danîbûya erdê ew kesa dihate cezakirin. Ceza bi du

¹⁹² Eyüp Kiran, *Dewrêşê Evdî, Kulîlka Bilbizêk û Rim*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011, r. 9.

¹⁹³ Qehweya tehl

awayî bû, an wê fîncana ku li erdê daniye, tije zêr bikira, yan jî wê hemû mesrefa
zewaca qehweger bida ser milên xwe.

3. BEŞA SÊYEM (ÇEND ÇÎROKÊN HERÊMA ŞÊXAN)

3.1. Çîrokbêjên Herêma Şêxan

Li Herêma Şêxan gelek çîrokbêj hebûn. Lê mixabin ji van kesan niha hindik manin. Bi borîna demê re xwestekên civakê jî hêdî hêdî guherîn, çîrokan cihê xwe ji alavên elektronîk re hişt. Beriya pazdeh-bîst sal berê bi dehan kes hebûn ku çîrokbêjên bi nav û deng bûn lê mixabin îro şûna wan kesan televizyon û compîtûrê girtine. Tişteki sosret e ku di nava çîrokbêjan de hejmara jinan zêdetir e. Li jêrê dema ku me navên çîrokbêjan rêzkerin wê ev rastiya derkeve holê.

Çîrokbêjên Herêma Şêxan yên ku em navên wana zanin û yên wefat kirine ev in: Wetha Şukrî, Zîna Xelîl, Fata 'Uno, Zîna Hemmê, Fata Qado, Zera Zeynê, Sita Hemo, Zera Wethê, Seydoyê Hepoş. Li herêma Şêxan mêrên ku çîrokan dibêjin hew bi tenê yek kes maye.

Li Hehrêma Şêxa çîrokbêjên ku niha dijîn û yên em navêna wana zanin ev in: Meyra Xerîb, Zera Fatê, Zekiyeya Sînan, Emîna Sînan (Temenê vê çîrokbêjê 30-35 e lê bi dehan çîrokan dizane) 'Hela Xelîl û Eyûbê Xelîl in.

Çîrok ji nivşekî derbasî nivşekî din dibe. Ev kesên ku me li jorê navê wana nivîsandine çîrok ji pêşiyên xwe (ji çîrokbêjên beriya xwe) hîn bûne û ev çîrokana hetanî roja îro anîne.

3.2. Dema Çîrok Vegotinê

Kurd bi roj dixebitin, li aliyê din xewn û xeyalên xwe dispêrin şevan. Dema ku çîrok di rewacê de bûn, bi piranî di şevên zivistanê de dihate vegotin. Çîrok di odayên axayan de pirr nedihate vegotin ji ber ku ew cihana cihên siyasetê û dîrokê bûn.

Dema ku êvar dibû, odeya mala ku çîrok tê de dikir bihata vegotin, dest bi seramoniya çira vexistini dikirin. Bi taybet di vê odeyê de jin û zarok berev dibûn, zatî çîrok ji bona zarokan dihate gotin. Têkiliya mêran pirr bi van odeyan re tunebû. Seramonî wisa bû: Şûşeya ser çiraya qazyaxiyê dihate derxistin, fetîlên çiraya bi qazyaxî yê dihate vexistin û şûşe careke din li ser çirayê dihate danîn. Hema bi

derbekê re agirê fetîlê zêde nedikirin ji ber ku digotin bila şûşe germ bibe paşê fetîlê bilind bikin, bi derbekê re fetîl bilind bikirana ji ber germahiyê şûşeya ser çirayê yan diderizî yan jî dişikiya. Piştî vê seramoniyê, zarok û jinên cîranan dihatin odeyê û li hêviya çîrokbêjê diman. Dema ku her kes hat û di odeyê de cihê xwe girt, îcar çîrokbêj dihatê odeyê, piştî slavdayinê û halpîrsînê hemû kes ku mîna di saloneke sînemayê de be li çîrokbêj dinêrîn û guhên xwe mij dikirin. Çîrokbêjê, bi navê Xwedê dest bi çîrokê dikir û digot : “Hebû tunebû...” bi vê gotinê re zarok û jinên guhdar diketine nava jiyana çîrokê heta ku bi gotina “çîroka min li diyara...”, paşê careke din xwe di nava odeya çîrokê de dihatê gotin didîtin.

3.3. Ji bo Çîrokbêjan Pere (Dirav) yan Xelat Dayîn

Dema ku em pirseke wisa bikin, gelo çîrokbêjên li herêma we ji bona çîrobêjiyê pereyan distînen an na? Ji ber ku xebata me li ser Herêma Şêxan (Eşîra Şêxan) ye em ê li gorî vê herêmê bersiva vê pirsê bidin.

Ya rast ew e ku min tu caran nebihîst û min nediye û kesekî jî ev tiştê ne bihîstiye; ne jî dî ye ku kesekî li Herêma Şêxan ji bona çîrobêjiyê pere an xelat girtine. Ya ku ez zanim û ya min diye, dema ku çîrokbêj çîroka xwe diqedîne xelata çîrokbêj kenê li ser devê zarokan û hêviya di çavên zarokan de ye. Xelata çîrokbêj ya din jî gotina “Xwedê ji te razî be” ye. Ji bilî van herdu xelatan min xelatên bi cûreyên din nebihîstine û min nedîne.

3.4. Baweriya Gel bi Çîrokan

Dema ku çîrok têne vegotin her kesek jî xwe re dersekê (wane) derdixe. Carcaran guhdar xwe wekî lehengê çîrokê dibîne û di dilê xwe û di heşê xwe de wekî lehengê çîrokê (ev lehengana neasayî ne û xwedî hêzên mezin in) ji serpêhatiyekê derbasî serpêhatiyekê din dibe. Li vê derê ger em bipirsin dema guhdar, vî tiştî dike, baweriya wî bi çîrokê heye an na? Li gor nerîna me û yê ku me diye, guhdar di vî warî de dibin sê cûr.

Cûreya ewil dibêjin ku, ev tiştê bi tenê çîrok e, bûyerên bi vî rengî xeyalî ne û tiştêkî wisa ne pêkan e ku biqewime. Cûreya din jî dibêjin ger ev bûyerana neqewimiyana ma, bi vî awayî wê çawa li hev bianîna û vebigotana? Ango xwediyê

ramana cûreya duyem bawer dikin ku ev bûyerana wextekê qewimîne û ji nifşekî derbasî yên din bûne û hetanî îro hatine. Cûreya sêyem jî dibêjin ku hinek tişt di çîrokan de rast in û hinek tişt jî ne rast in.

3.5. Çend Çîrokên Herêma Şêxan (Eşîra Şêxan)

Li Herêma Şêxan (Eşîra Şêxan) ji aliyê me ve hinek çîrok hatin berhevkirin. Taybetmendîya van çîrokan ew e ku hîn neketine lîteraturê. Ango heta vê demê ji aliyê kesekî/ê ve nahatine nivîsandin û nehatine weşandin.

3.6. Keleha (Kela) Gewhernigê¹⁹⁴

Hebû tunebû carêkê li welatekî padîşahek hebû. Bi tenê lawikekî wî padîşahî hebû. Navê lawikê padîşah Hemed bû. Rojekê ji rojan Hemed ji bavê xwe qeherî û serê xwe rakir, ji welatê bavê xwe derket. Çû welatekî xêr û xerîb. Dema ku çû wî welatê biyanî dît ku yek bang dike û dibêje:

- Kî hetanî evarî ji min re bixebite ez ê sed zêrî û keçikekê bidimê.

Hemed xerîbê welête, bê nan û bê av maye. Hema bi lez û bez çû bal wî kesê ku bang dikir. Ji ewî ku bang dikir re got: (Ew ê ku bang dikir navê wî Maro bû)

- Ez ê ji te re bixebitim tu sed zêrî bide min û êvarî karê me qediya tu yê keçikê jî bide min.

Hemed bi kefxweşî daxwaziya Maro pejirand. Piştî xebata Hemed a rojekê Maro sed zêrê Hemed danê. Paşê Maro ji Hemed re got de kurê min were ez peymanê xwe ya din jî bînime cih.

Hemed û Maro her yek li hespekê siwar bûn û hespek jî deskêşî xwe kirin û bi rê ketin. Çûn çûn çûn gihîştin dereke îpî îpsiz¹⁹⁵ -xalî- binya çiyayekî bilindeee bilindeeee. Maro bangî Hemed kir:

¹⁹⁴ Min ev çîroka ji Meryem DUSAK (Meyra Xerîb) wergirt. (12.07.2012) Meryem Xanim 70 salî ye, nexwendî ye û li gundê Taşliyê Şêxan dijî.

¹⁹⁵ Ji ber ku çîrokbêjê ev gotina resen got min nexwest ku ez vê gotinê biguherînim

- Kurê min ji bergîrê peya be, bergîrê serjêke, hûr mûrê bergîrê derxe, cil û bergên xwe ji xwe deyne, van cil û bergên kevn li xwe ke û zêrên xwe bide min û têkeve hundurê postê bergîrê, te di postê bergîrê de çî xewn dî ji min re bêje em ê li riya xwe berdewam bikin. Hemed bergîrê serjê dike, hûr mûrê bergîrê jê derdixe û cilên kevn li xwe dike, cilên xwe yên nû û zêrên xwe radestî Maro dike û dikeve nava postê bergîrê. Dema Hemed dikeve post û di xew re dihere, Maro li hespê xwe siwar dibe û ji wê derê diçe dihere.

Dem mîna çem û rûbaran herikî, roj hate nîvro. Li ezmanan balinde û qirik peyda bûn. Çend balindeyan dada postê ku Hemed tê de. Bi bayê bezê rakirin ezmana. Rakirin rakirin rakirin û post li erdê danîn. Dema ku Hemed hişyar bû û ji post derket hahoooo dîna dî li ser çiyayekî xir û xalî ye! bilindahiya çiyê hetanî nava ewrane. Bi mîtroyan nayê hesêb. (bi hezaran mîtroyan bilind e). Li ser çiyê mîna Qeysê bi çolan ke ve wa çû wa hat dî ku ser çiyê tije laşin, tije beratene, kesên hîn giyan tê de hene dinalin. Hemed ji xwe re got edî tu rê neman ez ê li vê derê bimrim û haca kesî wê ji min tunebe. Hemed li wê derê kir qêrîn û hawar.

Bila Hemed li wir be ka em binerin Maro çî dike ? Maro, dema ku Hemed di nava post de radizê, li hespê xwe siwar dibe û diçe xwe di ber zinarekî de vedişêre û ji dûr ve li Hemed temaşe dike. Dema ku balinde postê ku Hemed tê de dibe ser çiyê, Maro ji cihê xwe derdikeve tê ber çiyê û bi dengê xurt bang dike:

- Hemedoooo Hemed, Hemedoooo Hemed!

Hemed dema dest ji qêrîn û hawarê berda bihîst ku dengê ji jêr çiyê tê. Guhê xwe mij kir û ew denga guhdarî kir. Paşê fêm kir ku ev deng dengê Maro ye. Hemed bang kir û got:

- Law Marooo Maroyê heram te ez kirim vî halî û tu reviya! Law Maro ez ê çawa ji vir peya bibin lawo rê li ku ye?

Maro bersiva Hemed da.

- Hemedo tu çend kevirê gilover yên li ser çiyê ji bona min bavêje jêr, ez ê rêya ji jor peyabûnê nîşanî te bidim. (kevrên gilover kevirên cewherin ku pirr diravan dike)

Hemed dî nedî bi dehan kevirên gilover avêtine jêr. Paşê ji Maşo re got:

- Maro ew qas kevir bes e, de riya peyabûnê nîşanî min bide.

Maro gotin li Hemed vegerand.

- Hemedê min ka rê ez çi zanim li ku ye?

Hemed bersivand.

- Lawo ka te got ez rê dizanim?

Maro bi kenekî mizawirî keniya ha ha ha ha ha!

- Hemedê min li derdora xwe binere, min çiqas mirovên wekî te xapandine.

Hemed kete nava xelat û celatê, kete nava qîsawetan. Welleh wê li vê dera xalî, teyr û tû min bixwin û kesek jî pê nahese. Dî nedî dest bi lêkolîna riya ji ser çiyê peyabûnê kir. Geriya geriya geriya. Qederekê şûnda got welleh bêy ku xwe ji ser çiyê berdan, tu rê tune ne. Hema bi lez çavê xwe girêda, çû paşiya çiyê û ji ser çiyê berve jêr xwe berda. De de de de hate binya çiyê ket û xewirî.

Kalek (padîşahê teyr û tû ya), qesra kalê li binya wî çiyayî ye, kalê ji xwe re hatiye derdora çiyê digere, seyranê dike. Kalê dema ku digere hew nerî bavooo, laşekî mirovekî li erdê dirêj bûye. Kalê bangî vî zilamî kir:

- Lawê min tu çi îns e tu çi cins e (zayend) ?

- Kalo bi navê Xwedê ez însanek im. Kesekî zalim li min rast hat, ez bi zêr û keçikê xapandim. Di postekî hişk de ez kirim xew, teyran ez anîm ser vî çiyayî min çare nedî û min xwe ji ser çiyê avêt û tu halê min dibînî.

Kalê, Hemed rakir bir mala xwe, birînê wî derman kirin. Hemed sax bû. Kalê li bejn û bala reyhanî, çavên belek nêrî û got, tu lawê min ez jî bavê te. (Hemed hebekî fikirî paşê got vî kalî ew qas çêyî bi min kir ez jî vê daxwaza wî bipejirînim, bila kalê di taliya temenê xwe de dilşad bibe.)

- Dibe kalo ez lawê te, tu jî bavê min.

Kalê dilşad û bextewar bû. Hemed demeke dirêj li cem kalê ma, salê dor veda, kalê hedî hedî çend razên xwe ji Hemed re dibêje. Kalê got Hemedê min ez padîşahê teyr û tû ya me. Ev saleke ez neçûme cem teyr û tû yên xwe. Kanê gelo çend man, çend çûn ger ez herim çol û çolteran cem teyr û tû yên xwe. Ez dê herim bila qesr radestî te be. A ev qesra te ye. Kalê kilîlên qesrê hemû radestî Hemed kir û pend û şîretek lê kir.

- Hemedê min tu dikare hemû jûran veke lê belê vê jûra rojava vemeke. Ez di bextê te de me aman ha aman tu deriyê jûra rojava vemeke. Şîreta min li te.

Hemed peyman da kalê da ku qet wî dertiyî venake. Kalê xatir ji Hemed xwest û berê xwe da çol û çolistanan. Hemed bi tenê di binê qesrê de ma. Rojek, du roj, sê roj meraqa wî roj bi roj zêde dibe. Gelo çima kalê gotê deriyê jûra rojava vemeke? De keso kes nebîne ramanek li ser ramanekê êrîşî hev dikan.

-Ez derî vekim?

-Ez derî venekim?

-Ez derî vekim?

-Ez derî venekim?

Dî nedî, têkçûyî mereqa xwe bû, nifte da destê xwe, gav bi gav berve deriyê jûra rojava çû. Dilê wî gupegup e, xwîdanek tê yek dihere. Ji kelecana dest diheze, qey tu dibêje dilê wî dike ji qefesa wî derkeve. Hêdî hêdî mifte zivirand û derî vekir. Bavoooo! Dîna dî sê keçik, her yek mîna sterkekê ne, di hewzekî de ne. Serên xwe tê de dişon. Hemed lingê xwe hîn ne avitibû hundur van her sê keçik firrrrrr û firriyan! Hemed li cihê xwe mat mayî ma. Dî nedî deriyê jûrê girt. Hemed ji ber xweşikbûna wan keçikan kete nava xewn û xeyalan. Ji avê, ji nîn bû, bi tenê difikirî. Arê evîniyê rebeno kiribû halekî xerab. Çend rojan şûnda Kalê wegeriya qesra xwe. Halê Hemed ê perîşan dî, delalê ker veda bûyî.

- Hemedê min 'elamek ji te re çi bi te hatiye tu wisa perîşan bûye?

Hemed bersiv da.

- Kalo rûyê min ji te re reş e. Min peymanana ku dabû te negirt û min deriyê jûra rojava vekir. Min dîna dî sê keçikên mîna pêriyan di hewz de xwe dişon. Dema ku çav li min ketin bûn teyr û di şibakê re firiyan. Heş û dilê min bi xwe re birin.

Kalê bi dilekî şewitî:

- Lawê min wana pêrîne, ma qey tu dikarî wana bigire? Ez bi tenê me û ez edî kal im ji ber vê yekê ew bi serbestî tên vê derê û diherin.

Hemed:

- Êêê ez ê rebenê Xwedê çawa bikim. ku de herim?

Kalê:

- Encax salê tê wî çaxî sal dor vede wê cardin werin. Dema ku hatin ji bo girtina wana me çarek dî, jixwe me dî. Me çare nedî jixwe edî tu caran em nikarim wana bigirin.

De dilo bitebite. Wê sal çawa derbas be ? Çîrk bûn xûlke, xûlke bûne saet, Saet bûne roj, roj bûne meh, meh bûne sal. Qet tu bibêje dem û dewran li cihê xwe sekiniye û nazivire. Payîzê daran pel weşandin, xsirûşt hedî hedî berve mirin diçû, kewan, hehecikan, qulingan, teyran koçê xwe berve cihên germ barkirin. Zivistan hat her der û dor xemla spî girêdan, sirûşt mir, erdê ji bona sirûştê şîn girêda, berf barî, baran barî, zîpik (teyrok) barî, erd şil bû, erd hedî hedî şiyar dibû, bihar hat rûyê erdê dikeniya, sirûşt jînda vejîya, teyr û tuyûrên çolan berî dan cihê qesra kalê lê. Bi gotinê hêsan e, de gelo tu were van her çar demsalana ji Hemed bipirse temenekî wî çû yekî din hate şûnê. Hemed wekî dilên ku di qefesa xwe hilnayên bû. Bawer nedikir ku roj biçin (dixwest roj weke avê bihereikin da ku ew pêriyana li qesrê vegerin).

Salê dor veda cardin kalê xatir ji Hemed xwest û çû çol û çolistanan. Hemed fêhm kir ku dema hatina her sê pêriyan nêzik bûye. Dema Kalê xatir xwest û ji qesrê derket, Hemed deriyê jûra rojava vekir û kozikek tê de kola, Kola kola kola bi qasî bejneke. Xwarin, vexwarina ku qasî mehekê têrê bike kire kozikê. Paşê ser kozikê bi

qirş û qal girt hew bi tenê qasî cihê du çavan vekirî hîşt. Wekî nêçîrvanekî li benda nêçîra xwe be di kozikê de cih girt. Çend rojan şûnda, roj tê nivro.

Erêê Hemed dît ku her sê pêrî, di şiklê kevokan de hatin ser şibaka jûra rojava venîştin. Hersê pêrî qîzên Padîşahê Pêriyane. Dema li ser şibakê venîjtîn ji wana yekê got:

- Ez yeqîn dikim ku bêhna mirovan ji vê jûrê tê.

Ya din got:

- De here derewçîna min, ev qesra qesra kalekiye, kalê jî ne li qesrê ye, wê bêyî kalê kî li vir be? Ma qey mirov dikarin heta vê qesrê werin?

Paşê, qinyata hemûyan hate û ji şibakê ketin hundur. Hedî hedî post ji xwe danîn dema ku post ji xwe danîn, her sê mîna heyva çardeşevî biriqîn. Bedewiya wan derkete holê. Di vê navberê de jî Hemed hem li wan guhdariya dike hem jî li wan dinêre. Her sê pêrî hake haka wana ye di hewz de kefxweş in. Qet xema wan nake. Piştî demekê pêrîyekê got:

- Gelo edî bes e. Em derkevin û herin wê baş bibe.

Her du yên din gotin:

- Baş e em edî ji hewz derkevin û herin.

Dema Hemed van gotinana bihîstin, mîna birûskê ji kozikê derket û postê pêriya biçûk ji erdê rakir û kir paşla xwe. Her du pêriyên din bi lez postê xwe li xwe kirin û bûne du kevok di şibakire pirrrrrrrr û firiyên çûn.

Pêriya çûk mîna sewiyên li waran bimîne li ber Hemed geriya (lawa kirin).

- Lawo binêre wisa nabe ez pêrî me tu mirov î, welleh nabe, billeh nabe.

Hemed lê vegerand;

- Welleh nabe ez post nadime te. Waye saleke ez ji derdê te dinalim. Min bi dijwarî tu girtiye ma qey dibe ku ez te berdim?

Pêriyê axivî:

- Ê qenî te ez girtim, ez di şiklê mirovan de me, ez tazî me ji bona Xwedê hinek cil û berg ji min re bîne ez li xwe kim.

Hemed qatek çekên (cil û berg) herîr anîn ji pêriyê re pêriyê cil û bergên xwe li bejn û bala xwe kir. Xeşikiya wê heşê mirovan difirand û mirov dîn dikir. Çend rojan şûnda Kalê (Padîşahê teyr û tû yan) vegeriya qesra xwe. Kalê dî Hemed û keçikek bedew li cem hevdu rûniştine. Kalê pirsî:

- Hemedê min te pêrî ji xwe re girt?

-Erê Kalo tu dibînî li cem min rûniştiye.

-Bi navê Xwedê hûn li yaqî hev in

Mehekê duduyan Hemed û pêrî li cem Kalê man. Şûnda hemed ji kalê re got:

- (Hemed û pêrî hîn nezevicîne wek xwişk û bira ne)

- Kalo edî ez herim welatê xwe wê baş bibe.

- Aman Hemedê min ev pêriye wê te bixapîne, wê terka te bike.

- Meraq meke kalo tiştek nabe înşallah.

Kalê got:

- Ê tew nebe, ka ez postê wê bişewitînim da ku careke din nikaribe bibe kevok.

Hemed ev daxwaziya kalê nepejirand.

- Na na Kalo meraq meke tiştek nabe hewceyî post şewitandinê jî nake.

Kalê dî nedî çare tune. Got:

-Ka hûnê bi çi awayî ji vir herin?

Hemed:

- Kalo bi Xwedê ez nizanim.

Kalê (ji ber ku padîşahê teyr û tu yan bû) hema bangî du teyrên mezin kir. Paşê herduyan xatir ji hevûdu xwestin. Hemed û pêrî her yek li teyrê siwar bûn û berê xwe dane welatê bavê Hemed. Teyr firiyan firiyan, bi rojan bi şevan firiyan û firiyan, piştî çend rojan teyr hatin sînore bajarê bavê Hemed (Navê bajêr: Lûgî bû) venîştin. Hemed û pêrî ji teyran peya bûn teyr cardin bi şûnda veşeriyên berê xwe dane Qesra Padîşahê Teyr û Tu yan. Hemed li teyran dinerî teyr baskê xwe mîna pêlên behrê radikirin û dadanîn ber ve asoyê difiriyan, qederekê şûnda teyr di asoyê de wenda bûn. Hemed bi xemgîni serê xwe danî û hedî hedî da pêşiya pêriyê meşiyên çûn.

Dema Hemed û pêriyê nezîkî li bajêr kirin bajariyan Hemed naskirin û li zilxeta xistin bû hirobî. Mizgînî dane bavê Hemed. Dinê xera bû def (dahol) lêxistin, bû şahî. Hemed çû cem bavê xwe bavê Hemed bi dilgermî pêrgî wî hat herdu yan hevûdin himbêz kirin. Rondîkên çavan bû cem û herikîn.

Çend rojan şûnda bavê Hemed ji herduyan re qonaxek veqetand herdu ketin qonaxa xwe ya nû. Qonax ji herduyan re biçûk dihat. Hemed ji bo çen jûran li qonaxê zêde bike asasek (xîmek) kola. Hemed postê pêriyê kire xîmê qonaxê û qorên dîwarê qonaxê bilind kir. Rojê Hemed ji qonaxa xwe derdikeve diçe zozanan ji bona nêçîrê. Dema ku Hemed ji ber çavan wenda dibe, keçika pêrî li postê xwe digere. Herderê bêhn dike, bêhn dike, bêhn dike erêêêê! cihê postê wê lê veşartî dibîne:

-Erê bi Xwedê behna postê min ji bin vî asasî tê!

Keçika pêrî kêleka asasî dikole dikole dikole heta ku postê xwe dibîne. Erêêê hetanî binê asês tê:

-Aha postê min vaye!

Hema bi lez û bez postê xwe ji nava asês derdixwe. Cihê kolabû û kort bûbû bi xweliyê tije dike û postê xwe li xwe dike. Dema ku post li xwe kir dibe kevokek. Diçe li ser şibakê vedinîje û li hêviya Hemed disekine. Demeke dirêj li ser şibakê

berê wê li rêya Hemed sekinî sekinî. Berve êvarê ji dûrve Hemed hate xweyakirin. Hemed di nêçîrê de çend kevok girtine, lingên kevokan bi werisekî girêdaye û mîna stûpêçê bi ser her du milên xwe de berdaye û hedî hedî tê qonaxa xwe. Dema nêzîkî li qonaxê kir çî bibîne! Pêriyê postê xwe li xwe kiriye û li ser şîbakê venîştiye.

Pêriyê:

-Te xayintî bi min kir û ez revandim. Welleh ez dikim herim mala bavê xwe, ger tu mirovekî qenc bî, dema ez çûm tu jî were cem dê û bavê min, min ji wana bixwaze. Ger ez dame te ez ê bi te re werim. Ger ez nedame te hêviya xwe ji min bibire.

Hemed:

-Keçê aman-hawar tu here ez ê bimrim!

Pêriyê:

- Na, na, qethen nabe, ez diçim.

Hemed:

- Ê tamam tu diçî baş e. Ka ma gelo ez ê çawa werim cem bavê te? Mala we, welatê we li ku derê ye.

Pêriyê:

- Mala bavê min li Keleha Gewhernigê ye. Bavê min padîşahê pêriya ye.

Keçika pêrî berve mala bavê firiya, çiya û banî, deşt û newal, bajar û gund yek bi yek derbaskirin çû çû çû, bi rojan çû bi şevan çû. Serê sibekê gihişte keleha bavê xwe. Dê û bavê wê bi hesret qîza xwe ya biçûk hambêz kirin. Giryan û giryan. Demeke dirêş şûnde hemû hatin ser heşê xwe, hêsirên çavên xwe paqij kirin û hal û demê hevûdin pirsîn.

Bavê kekiça pêrî:

- Qîza min wî mirovî tu bi ku derê de bir? Tu çawa ji destî wî filitî? Tu çawa cardin hate vê derê?

Pirsan êrîşî ser hevdu kirin. Bavê wê bi dehan pirs pirsîn. Qeçikê bûyera ku bi serê wê de hat ji bînî hetanî serî ji bavê xwe re rave kir.

Pêriyê:

- Bavo hal mesele wisa bû. Min ji lîwik ra got ku tu ji min hezdikî were keleha bavê min, min ji dê û bavê min bixwaze. Dibe ku ew zilama were van deran. Bavo emir bide pêriyan, pêrî li havirdorê mirovekî dibînin bila têkilî wî nebin, bila bigrin û bînen kelehê huzûra te.

Padîşahê pêriyan emir li her derê belav kir da ku kes têkilî mirovên li herêmê nebin.

Hemed tebat nayê. xatir ji malbata xwe xwest û bi şopa pêriyê ket. Bi rojan, bi şevan geh li hespê xwe siwar bû, geh meşiya, bi dehan bajar, gund, newal, çiya, çol, çolistan derbas kir. Berve êvarekê hate bajarê ku Maro lê dijiya. Dihere bazarê dinêre Maro cardin bang dike:

- Kî hetanî êvarî ji min re bixebite, ez ê sed zêrî û keçikekê bidime wan.

Hemed bûyerê zane, hema diçe cem Maro (Maro sal di se re derbas bûne Hemed nasnake. Kî çi zane çend Hemed bi vî awayî xapanmdine?) dibêje ez ê ji te re bixebitim.

Dotira rojê her yek li hespekê siwar bûn û her yekî hespek jî destkêşî xwe kirin û berê xwe dane cihê xebatê. Herdu digihêjin ber çiyayekî.

Maro:

- Kurê min tu vê hespê serjêke, bigro, postê wê derxîne.

Hemed gotina wî dike. Maro sed zêrî didê.

Maro:

-Kurê min kincên xwe, biguhere bide min û zêrên xwe jî bide min, têkeve nava postê hespê te di wê derê de çi xewn dî ji min re bêje em ê riya xwe berdewam bikin.

Hemed:

- Ne ez kincên xwe datînim, ne jî zêran didime te. (Ji ber ku hemen carekê xapiyabû)

Hemed kete nava post û li benda teyran ma. Demekê şûnda teyr hatin Hemed rakirin û birin ser çiyê. Demekê şûnda Hemed ji nava post derket. Dît ku dengê ji jêr tê:

-Hemed! Hemed! Tu çend kevirên gilover lolî cem apê xwe ke ez riya ji wir peyabûnê nîşanî te bidim.

Hemed:

-Law nemerî ez va dek û dolabên te dizanim. Te bi vî halî çiqas lawê bavan kir xwarina teyr û tû yan. Ma qey ez keviran didime te. Ez cara berê bi te xapiyam edî bes.

Maro:

-Waaaa! Edî dek û dolabên min derketin holê, êdî tu kar di vê derê de nema.

Maro, dît ku dek û dolabên wî derketin holê, serê xwe rakir bi çolan ket. Dûr nêzîk ji qehran nexweş ket kişand kişand û mir.

Hemed riya ji çiyê peyabûnê dizanîbû. Çû hinda cihê ku dike ji çiyê peyabe, çavên xwe girtin û xwe ji jorê de şûş kir. Hat hat hat li binya çiyê ket. Çend rojan şûnda Kalê (Padîşahê teyr û tuyan) di ber çiyê re derbas dibû. Kalê dît ku Hemed li erdê xewiriye bedena wî hemû xwîn e. Kalê bangî teyrekî kir Hemed li piştê teyr kir û bire qesra xwe. Hemed bi mehan di nava nivînan de ma. Hedî hedî dihate ser hêla xwe.

Kalê;

- Lawo min ji te re negotibû, pêrî fennekin wê postê xwe ji te bidizin û te terk bikin. Bi çi awayî ji destê te filitî?

Hemed;

- Min postê wê kiribû esasê mala xwe, rojekê ez ne li malê bûm. Pêrî li postê xwe digere, postê xwe dibîne, li xwe dike. Dema ku ez vegeriyam min dî ku bûye teyr û li ser şibakê li hêviya min e. Dema ez dîm ji min re got ez diçim, ger tu dixwazî min ji xwe re bînî were Keleha Gewhernigê min ji bavê min bixwaze.

Kalê rabû li teyr û tû yan gazî kir;

- Qe we kesî Keleha Gewhernigê dî ye?

Hemû teyran gotin qesem bî navê Xwedê me Keleha Gewhernigê ne dî ye, ne jî bihîstiye.

Kalê;

- Gelo wekî din teyr man an na?

Teyran gotin teyrek tenê maye ew jî pîr e, di sarîncekê werbûye nikare derkeve. Kalê got herin wî jî bînin dibe ku ew cihê Keleha Gewhernigê zanibe. Çend teyr çûn ew jî anîn. Kalê demekê ew teyrê pîr xwedî kir. Tene dayê, av dayê. Piştî teyr hate ser heşê xwe, pûrt lê hêşin hat.

Kalê;

- Teyrê kal te qe Keleha Gewhernigê dî ye an na?

Teyrê Kal;

- Erê min dî ye. Dema ku em piçûkbûn dê û bavê me em di hêlînê de hiştin û çûn. Du rojan bi ser me de nehatin. Em dikira ji tîna û birçîna bimirana.

Kalê;

-Le we çer kir?

Teyrê Kal;

- Du rojan şûnda dê û bavê me hatin xwarin û vexwarin dane me em ji mirinê filitîn. Paşê dê û bavê ma ji me re gotin ku, pêriyên Keleha Gewhernigê em girtin em bi zor ê ji destê wan filitîn. Xêra Xwedê em nekuştin.

Teyrê kal got dê û bavê min ji me re rêya Keleha Gewhernigê salix dan. Ji ber vê ez dizanim Keleha Gewhernigê li ku derê ye. Kalê rabû Hemed li ser teyrêkî ciwan kir û Teyrê Kal jî ji wan re kire rêber. Hemûyan berê xwe dan oxirê piştî xwe dan felekê çûn, çûn, çûn, çûn, kanî, rûbar, gol, behr, çiya, deşt, zozan, çolistan derbaskirin. Bi şevan bi rojan çûn. Berbanga sibehekê gihîştin warekî, ji dûr ve keleheke spî xweya dikir. Ev qesra qesra pêriyan bû. Her du teyran ji Hemed re gotin em ê te li vê derê bihêlin. Em edî nikarin ji vir zêdetir werin. Ji ber ku dema pêrî teyrên wekî me dibînin me dikujin. Teryê Kal û Teyrê Ciwan xatir ji hemed xwestin û berve diyarê qesra padîşahê teyran firiyan. Hemed di paş de li wan mêzekir, mêzekir heta ku herdu teyr di asoyê de wenda bûn. Hemed berve keleha spî hedî hedî gav avêtin. Dema ku nêzikî li kelehê kir ji nişkave sê pêrî hatin bi destê vî girtin û yekî destê xwe kir qirika wî dike bikuje. Herdu pêriyê din ji ewî ku dike Hemed bifetisîni re got: “Law bise padîşê ma negotibû dema hûn mirovan dibînin mekujin û ji min re bînin. Dibe ku ev zavê padîşê be.” Pêriyan dest ji kuştinê kirin, bi destê Hemed girtin û birin nava kelehê. Piştî Hemed birin huzûra Padîşê.

Padîşah;

- Tu kî yî? Tu ji ku de tê, ku de diçî?

Hemed;

-Hemed ez mirovekim, min jina xwe ya pêrî wenda kiriye ez li wê digirim.

Padîşah;

- Ew pêriya ku tu lê digerî ji kîjan welatî ye?

Hemed;

- Pêriya ku ez lê digirim qîza padîşahê pêriya ye û ji Keleha Gewhernigê ye.

Paşê Padîşah bangî qîza xwe dike, Hemed rê dide.

- Qîza min a delal tu vî nas dikî an na?

Pêrî;

- Erê bavo ev hevjinê min bû.

Çendakî li Keleha Gewhernigê man, piştî bavê pêriyê postê pêriyê jê stend. Lawo ger ez vî postî jê nestînim wê tim li te wa bike, wê bireve were vê derê. Hemed û pêriyê xatir ji malbata pêriyê xwestin û her yek li piştî pêriyekî siwar bûn û berê xwe dane qesra padîşahê teyr û tuyan. Hatîn, hatîn, hatîn, bi şevan, bi rojan hatîn. Berve êwarekê gihîştin ber qesra padîşahê teyr û tu yan. Kalê dema ku çav li herdu yan ket kêfxweş bû.

Kalê;

-Te pêriya xwe anî Hemedê min.

Hemed;

- Erê kalo, erê.

Çendakî li cem kalê man. Piştî Hemed got kalo ger destûra te hebe ez ê edî herim welatê xwe. Kalê got, lawo mal û milkê min pirre, li vir bimîne bila hertişt ji te re be. Edî ez jî li ber mirinê me. Hemed lê vegerand, na welle kalo ez ê herim. Kalê dî nedî gotina Hemed pejirand. Herdu li ser teyrekî kirin û berve welatê wana şandin. Teyr firiya, firiya bi şev û rojan firiya. Di berbanga sibehekê de gihîştin bajarê bavê Hemed, nezîkî bajêr herdu ji ser teyr peyabûn. Xatir ji teyr xwestin û hedî hedî berve qesra bavê xwe çûn. Piştî demekê pêriyê ji bo destavê ji Hemed bi dûr ket.

Û qêrîn û hawarek! Hemed li du xwe zivirî bavooo! Gurekî dev kiriye qirika pêriyê û periyê bi erdê dide. Law law! Heta ku Hemed gihîşte gur edî derng bû, gur pêrî fetisandiye. Hemed kire qêrîn lê bê fêde ye. Xeber gihîşte bavê Hemed, hatîn pêrî rakirin û radestî gorê kirin. Hemed bi hesreta pêriyê roj bi roj heliya dawiya dawîn Hemed jî mir. Gora hemed li kêleka gora periyê vekirin. Herdu bi mirazê xwe

şa nebûn. Mesela min li diyara, rehmet li dê û bavê guhdaran, ji bilî cenderme û tehsîldaran.

3.6.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî

Bal: Cem, çûyîna cem hinekan.

Destkêş: Bi xwe re birin.

Îpî Îpsiz: Cihê ku kesek lê tune ye.

Xir û xalî: Cihê ku kesek lê tune ye.

Mizawir: Kesê fenek, fêlbaz.

Sal Dor Veda: Salek derbas bû sala din hat.

Hake hak: Kenîn, ken, kenê bideng.

3.6.b. Metelokên Herêmî

Keso kes nebîne.

Delalê ker wenda bûyî.

3.6.c. Di Çîrokê de Dem

Di vê çîrokê de dem ne diyar e.

3.6.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh

Welatê Padîşah

Deşteke îpî îpsiz

Welatê padîşahê teyr û tu yan

Zozan

Çol û çolistan

Bajarê bavê Hemed

3.6.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî

Pêşiya gund

3.6.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî

Qesr

Qonax

Jûra rojava

Jûrên qonaxa Hemed

Keleha Gewhernigê

3.6.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê

1. Lawikekî padîşahî hebû (i)
2. Hemed serê xwe rakir, ji welatê bavê xwe derket (e^3)
3. Kî hetanî evarî ji min re bixebite ez ê sed zêrî û keçîkekê bidimê (J^1)
4. Hemed peşniyara Maro dipejirîne (g^1)
5. Kalê bangî zilam kir (slav dayê) (D^2)
6. Hemed bersivê dide kalê (H^1_{pos})
7. Hemedê min tu dikare hemû jûran veke lê belê vê jûra rojava vemeke (k^1)
8. Hêdî hêdî mifte zivirand û derî vekir (q)
9. Arê (agirê) evîniyê rebeno kiribû halekî xerab (x^1)
10. Ji kozîkê derket û postê pêriya biçûk ji erdê rakir û kir paşîla xwe (E^7)
11. Biryarê dide û diçe pêriyê bîne (W)
12. Xatir ji malbata xwe xwest û bi şopa pêriyê ket (\uparrow)
13. Hemed li teyr suwar dibe diçe (R^1)

14. Teyrê Kal rêberiyê jê re dike (R^3)

15. Pêrî xwest û anî (A)

16. Hemed û pêrî vedigerin malê (↓)

17. Pêrî dimire (tê kuştin) (n^2)

Şemaya vê çîrokê wisa ye:

$e^3, J^1, g^1, D^2, H^1_{pos}, k^1, q, x^1, E^7, W, \uparrow, R^1, R^3, A, \downarrow, n^2$

3.6.h. Peyam

Di vê çîrokê de peyamên ku hatine dayîn ev in:

1. Kesên ku em nasnekin ger em pê bawer nebin.
2. Ger mirov tu caran bê hêvî nebe
3. Şîretên ku li te hate kirin guh bidêyî.
4. Meraq dikare her tîştî bi mirov bide kirin.
5. Kesên sebir bike digihêje miraza xwe.
6. Ger her kesek li gorî şert û mercên xwe tevbigere.
7. Dawiya xerabî û xapandinê tune ye.

3.6.i. Leheng

Hemed: Serlehengê çîrokê ye. Hemû bûyer di serê wî de tên. Kesekî rast e, durust e û girêdayî evîna xwe ye.

Maro: Mirovekî xapînok e. Bi dek û dolaban jiyana xwe berdewam dike. Ji bo kesan bixapîne zêr û qîzan we'd dike. Dawiya dawiyê ji poşmaniya û ji qehran dimire.

Padîşah (Bavê Hemed): Kesekî ji ewladên xwe hezdike. Ji bo lawê xwe hewl dide.

Kalê (Padişahê Teyr û Tû yan): Mirovekî dilbirehm e. Her dem ji kesan re arîkariyê dike. Dawiyê jî bi bextewarî ji hemed vediqete. Hemed cardin bi arîkariya wî dikare vegere welatê xwe.

Pêrî: Rindî û xweşikiyê temsîl dike. Ev bi welatê xwe û bi hemzayendê xwe re ne xayin e. Li gori urf û edetên pêriyan dijî. Lê mixabin dawiyê bi mirazê xwe şa nabe.

Padîşahê Pêriyan: Kesekî dilbirehm e. Xerabî ne para wî ye. Ji arikariyê hezdike û kesekî pêşbîn e.

3.6.1. Nirxan

Di vê çîrokê de pirr ders hatine dayîn. Ev dersana hemû civakî ne û her roj derdikeve pêşberî mirovan. Hemed dema ku hêrs bû û ji welatê xwe derket li derên xerîb pirr bûyer hatine serê wî. Hemed bawerî bi Maro anî ev çewtiyeke mezin bû li vê derê ji guhdar re dibêje, kesekî tu nasnakî pê bawer mebe. Di vê çîrokê de em fêhm dikin ku ger her kes têkiliyên wana bi hemniyadên wan re hebe. Li dawiya çîrokê jî em dibînin xerabî bê ceza namîne. Ewîndarî karekî dijwar e û hemû tiştan bi mirovan dide kirin. Di vê çîrokê de diyar e ku ji bo ders dayinê pirr mijar hene.

3.7. ‘Ereb Zengûrî û Rindika Çiya¹⁹⁶

Hebû tunebû carekê mêrikekî axa û du jinê wî hebûn. Ji jina biçûk lawikek hebû navê wî ‘Ehmed bû. Ji jina mezin du lawik hebûn navên wan ‘Elî û Sîno bûn. Her sê lawik ciwan bûn wexta wan û zewcê hatibû. Lê belê fedî dikirin ku ji bavê xwe re bibêjin. Car caran dihatine malê kevçî û sênî davêtin erdê, car caran hêrs dibûn lê dê û bavê wan qet tê nedigihîştine vî karî. Bavê zarokan, ji pîrekên xwere digote, keçê çi hal bi serê van zarokan de hatine, berê qet tiştekî wisan li bal wana tunebûn. Zarokan dî nedîn ji cîranên xwe re gotin, ji kerema xwe herin bal bavê min bibêjin ku, zarokên we dixwazin bizewicin.

Bi dotira rojê cîran çûne mala zarokan û hal mesele ji bavê zarokan re gotin;

¹⁹⁶ Min ev çîroka ji Wetha Bozkoyun (Wetha Şukrî) wergirt. (18.08.2007) Wetha Xanim nexwendî bû. Di 95 saliya xwe de wefat kir.

- Ma gelo cîrano, zarokên te kevçî avitên erdê, sênî şikandin qet te mebesta wana fêh nekir?

Bavê zarokan;

-Na welleh cîran.

Cîran;

- Ez ji te re bêjim, zarokên te doza zewacê dikin.

Bavê zarokan bi vê gotinê re kêfxweş bû, kire zilxet. Paşê bangî zarokên xwe kir;

- Lawo hûn kê dixwazin, em ê li gor ‘edetên me, bi dotira sibê re sêvan bidine we, we sêvên xwe avêtin pêş mala kê em ê qîzê wan kesanan ji were bixwazin. Sibe bi ûrîna dîkan dest pê kir. Hemû gundî li ber mala axa berev bûn. Sêv anîn berê dane ‘Elî, ‘Elî sêv avêt li pêş deriyê muftî xist. Sêva din dane Sîno, Sîno sêv avêt li pêş deriyê qêdî (qadî, dadger) xist. Sêva din anîn dane ‘Ehmed, ‘Ehmed sêv avêt dûr, sêv çû li ser tehtekê ket. Axê, qîza muftî ji ‘Elî re, qîza qêdî ji Sîno re anîn. Para ‘‘Ehmed qîz neketin, lê axê ji ‘Ehmed re li ser wê tehtê avahiyeke xweş çêkir. ‘Ehmed û diya wî kirine vê avahiyê.

‘Ehmed nêçîrvan bû. Bi sibehan ji bona nêçîrê ji mal derdiket êvarê dereng dihate malê. Dema ku dihate malê her tim dest vala bû. Rojekê dayika wî damîş nebû;

- Kurê min tu sibê derdikevî diçe nêçîrê, êvarê dereng tu teyî malê, lê min nedî ku te rojekê ne kurgî (kîvroşk) ne xezal, ne kewek anî malê. Ev çi hal e?

‘Ehmed;

- Dayê ez qurban! Welleh ez hogirî beqekê bûme, ez sibê diçim pê şa dibim hata ku ez êvarî vedigerim. Dema ku ez vedigerim ez wê bera avê didim û tê me malê.

Dayik;

- Lawê min ne rojêke, ne du rojin ev hala wisa nabe. Hema beqa xwe bîne malê, tembeqekê jê re tije av bike û bila beqa te her tim li malê be.

Ehmed bi gotina diya xwe kir. Sibeda beq anî malê. Dayika ‘Ehmed keseke ehlê Xwedê bû. Rojêke ji rojan bangî lawê xwe kir û çend pend û şîret lê kirin.

Dayik;

- Lawê min, mirina min êdî nêzîke. Ger tu dema dizewice ji ber çeman bizewice.

‘Ehmed;

- Dayê ji ber çeman zewac tê çî wateyê.

Dayik;

- Dûr nêzîk tu yê fêm bikî.

Demekê şûnda dayika ‘Ehmed wefat kir. Gundî û cîran çend rojan hatine sersaxiyê. Piştî wefata dayikê, ‘Ehmed bi tena serê xwe ma. Sibehan diçe nêçîrê, êvaran vedigere malê. Hemed dema ku tê malê dibîne ku mal hatiye paqijkirin, ava wî temame, nanê sêlê hatiye lêxistin. ‘Ehmed heyirî dimîne. Xwe bi xwe dibêje, mala min dûrî gund e, kilîla min di bêrîka min de ye, hevbeşê min tunene, ma gelo qey dêmariya min, an jî xwehê (xwehê ne ji dê) min têne mala min dikin dûzanê? Na na wisa nabe ez ê xwe li malê veşêrim da ku ez bibînim li mala min çî diqewimin. ‘Ehmed dotira rojê xwe li paş stêr veşart. Qederekê sekinî dî ku beqa wî ji nava avê derket, postê xwe ji ser xwe şeqitand, bû keçikeke mîna xezala, mal hemû malaşt, paqij kir. ‘Ehmed hema ji nişkave ji paş stêr derket;

- Le îcar!

Hema postê beqê girt û avête nava êgir.

Beq;

- Law law mala te şewitiyo wê va posta ji me re hewce be! (lazim be)

Beqa ma weke kareke xezala ye. ‘Ehmed bi dîtina wê gêj bû. ‘Ehmed bangî mele û çend feqîyan kir, bi qewlê Resûlê Xwedê keçik li xwe mar kir. ‘Ehmed çend rojan li malê ma. Rojekê keçikê ji ‘Ehmed re go, bû çend roje tu li malê yî, qe carê derkeve here nav merivên xwe,

‘Ehmed;

- Bi Xwedê ez terkî dîdara te nakim.

Keçik;

- Mahrûmû ma qey kes dîke min ji te bistîne, tu terka min nakî.

Axirê rojekê keçikê ‘Ehmed şande nêçîrê. ‘Ehmed çû nêçîrê, serê sê mehane, ‘Ehmed bi rojî ye. Li nêçîran geriya geriya qet tişteke nedî. Xwe bi xwe, mala min şewitî jina min xerîbe li malê bi tenê birçîye, ji sibeha Xwedê de min tu nêçîr nekir. Dî nedî li hespa xwe siyar bû berê xwe da malê. Di nivê rê de li baxçekî rast hat, dî ku di nava baxçe de hemû cûr fêkî hene. Rabû heqîba xwe tijî fêkî kirin û ji nava baxçe derket. dema ku ji nava baxçe derket, dî ku siwarek tê hespa wî reş, rimê wî reş, siwar bi xwe reş e. (dev û eniya xwe bi paçekî reş girêdaye bi tenê çav xweya dikin)

Siwar;

- Hêêê lawo min va baxçeya ji te re neçandiye! Em ê li hev xin. (bi hev re şer bikin) Min xaniyek ji laşan tijî kiriye, xaniyek jî ji seriyan tijî kiriye. Em ê lihev xin ka Xwedê da me kê. Xwedê ya wê bide min yan jî wê bide te.

Wê şevê şer dest pê kir, bi saetan berhev dan, yekî piştî yê din dananî. Şev dereng herdu yan dest ji şer berdan, tev nan (xwarin) çêkirin tev xwarina xwe xwarin. Herdu westiyabûn li nêzîkî hev dirêj bûn û ketine xew. Bû sibe cardin şer dest pê kir. Hevdu doş kirin (zîvirandin) berve nivro ‘Ehmed zora siwar bir û avête erdê. ‘Ehmed xençera xwe derxist da ku serê siwar bifirîne, ji xwe re got gelo, ka ez paçê ser rûyê wî rakim da ku ez zanibim dişibe çî. ‘Ehmed dema ku paç rakir, dî ku

keçikeke mîna heyva çardeşevî dibiriqe, mîna arwanekê ye. ‘Ehmed hema ji ser rabû, xençera xwe kir kalan.

- Tu kî yî?

- Ez qîza şêxê ‘ereba me. Ji min re dibêjin ‘Ereb Zengûrî. Min sond xwaribû dema kê pişta min danî ez ê bi wî re bizewicim. Te pişta min danî ez a te, tu yê min î.

‘Ehmed;

- Na, na tu diya min î, tu xwişka min î, ez berê zewicî me pîrekeke min heye.

‘Ereb Zengûrî;

- Ê wê demê tu yê min bibe, ez ê ji wê re bi carî bim.

‘Ereb Zengûrî çû malê têra xwe tişt li hespa xwe kir û da pê ‘Ehmed. Hatin ghiştin mala ‘Ehmed li derî xistin. Dema ku pîreke ‘Ehmed çav li herdu yan ket ji ‘Ehmed pirsî;

-Ev kî ye?

- Ev cariyêke min ji te re anî.

- Na, bila li ber dilê Xwedê çetin nê, ez çawa me, ew jî bila wisa be.

Hîn kesek nizane ‘Ehmed zewiciye. Hemû gundî dibêjin qey hîn bi tena serê xwe ye. Rojêkê ‘Ehmed ji herdu jinên xwe re dibêje ez ê herim berxekî bikirim û serjêkim paşê ez ê bangî bavê xwe, birayên xwe û hevbêşên wana kim. Dema ku mêvanên me hatin Rindika Çiya tu musun bigire avê li destê bavê min bike, ‘Ereb Zengûrî tu jî pêşgîrê (xawlî) bigire bila ku bavê min dest û rûyên xwe pa ke. ‘Ehmed nan çê kir bangî bav, bira û hevbêşên wan kir. Mêvan dest bi xwarina nanî kirin, lê belê di vê navberê da çavê hemûyan li herdu pîrekên ‘Ehmed in. Rindika Çiya û ‘Ereb Zengûrî wekî heyva çardeşevî dibiriqin. Bavê ‘Ehmed ji ber xweşikbûna wana rep û ket xewirî. Çûne ser dest avêtin zend û bendan qey tu yê bibêjî va heft sale miriyî. Ji kêfan re. Paşê av li ser çavan kir, bavê ‘Ehmed şiyar bû. (lê carekê dilê wî li herdu pîrekên ‘Ehmed xerab bû. Yanê dil kete herdu yan.)

‘Ehmed;

- Bavo xêre, çi qewimî tu bi vî awayî xewirî?

Bavê ‘Ehmed;

- Lawê min çergî tu ji cem min çûye êşek bi canê min ketiye, ez her tim dixewirim.

Piştfî sohbe dîrûdirêj xatir ji hev xwestin, hîn bavê ‘Ehmed bi rê neketibû;

- ‘Ehmedê min bi destûra xwedê şîva sibe êvarê tu were li cem min bixwî.

‘Ehmed;

-Dibe bavo!

Dotira rojê ‘Ehmed ji herdu pîrekên xwe re got, îşev ez diçim mala bavê xwe şîvê li gorî xwe tenê çêbikin. Rindika Çiya tebatî nehatê,

- ‘Ehmedo dek û dolabên mêrê axa pirrin, ullim tu yê pisîka me bi xwe re bibî. Pisîka te ji kî derê xwar tu jî ji wir bixwe.

Mebesta Bavê ‘Ehmed xerab bû. Karek serjê kir. Birinc amade kir û sêniya ku dike bide ber ‘Ehmed hemû kire jehr. nîvê goştê dike bide ber ‘Ehmed jî kire jehr û li heviya ‘Ehmed ma.

‘Ehmed da pêş pisîkê û heta mala bavê xwe herdu bi hev re çûn. Dema çavê bavê ‘Ehmed li pisîkê ket;

- Lawo, aman aman ev çi pisîk e?

- Bavo xatirê min li bal te hebe tu têkilî pisîka min mebe. Ev bû çend sal e, li wê kerbelayê wê pisîkê derdê min dikişand. Sebra min pê dihat.

Pisîkê ji seniya jehrkirî û goştê jehr kirî nexwar, ‘Ehmed jî ji wana nexwar. Herdu yan ji seniyeke din xwarin. Bavê ‘Ehmed hêrs bû lê tiştek ji dest nedihat. Dî nedî jehr kire qehweya ‘Ehmed, dema ku qehwe hate jûrê pisîk hol bû û qehwe rijand. ‘Ehmed bi slametî vegeiya malê. Dema ku ghişte malê got:

- Rindika Çiya xêra Xwedê min gurî te kir (guh da te) ne wisa bûya ez nima mirî bûma.

Dotira rojê Bavê ‘Ehmed bi qerwaşê xwe re xeber ji ‘Ehmed re şand, got: Sibe hespa xwe amade bike em ê biçin nêçîrê. Dema ku Rindika Çiya ev gotin bihîst;

- ‘Ehmedo dek û dolabên mêrê axa pirrin, ava xwe, nanê xwe bi xwe re bibe. Bi bavê xwe bawer mebe.

- Ma keçê mal ava! Ez ê çawa bi bavê xwe bawer nebim. Em ê sibê herim êvarê vegezin. Bi destûra Xwedê qet titştekan nabe.

Li aliyê din Bavê ‘Ehmed emir da xizmetkaran, ji wan re got: “Xwê û êrd berberî hev bikin û bikin nan em ê sibê herin neçîrê.” Xizmetkaran xwê û ard qasî hevdu kirin û kirin kehke, du cewdik av tije kirin, kirin heqîba hespê. Dotira rojê ‘Ehmed û bavê xwe derketin nêçîrê. Ha li vir û ha li wir û ha li vir û ha li wir. ‘Ehmed ji hal de ket. Qet hêza wî nema.

- Apo em li ser hespan leqiyên, em ji nêza ketin.

- Wîî ‘Ehmedê min vaye min kehke amade kirine!

‘Ehmed kehke xwarin. Demekê şûnda;

- Bavo ez ji tîna ketim-fetisîm. Hinek av bide min.

- De kanê çavekî xwe derxe bide min, ez jî hinek av bidime te.

De bê lome be. Havîn e, ger me, xwê xwariye û tî bûye. Xwedê rê gawiran nede. ‘Ehmed dî nedî çavekî xweyî rastê derxist û kire berîka xwe ya çepê û cardin meşîyan. Çûn çûn çiya û banî derbaskirin, li bin darekê rûniştin. ‘Ehmed careke din;

- Bavo ez belavbûm hinek av.

- Lawo de ka tu çavê xwe yê din jî bide min, ez ê hineke av bidime te.

‘Ehmed dî nedî çavên xwe yî çepê jî derxist û kire berîka xwe ya rastê. Paşê, ‘Ehmed û tajiyê wî li bin darê hîşt. Li hespa xwe siyar bû hespa ‘Ehmed destkêşî xwe kir û bi

rê ket. Hat hat hat bi rojan bi şevan hat. Dema ku gihişte diyarê gund kire qêrîn û hawar;

- Haho haho, xeziyek hate pêş me ‘Ehmed kuştin, ez jî bi nigê hespê filitîm!

Çend rojan şûnda ji xizmetkarên xwe re got;

- Herin herdu jinên ‘Ehmed bînin ez wana li xwe mar kim.

Rindika Çiya derket ser banê qonaxa xwe şûşeke jehr bi xwe re bir;

- Qet nabe, ez wî kalê pîs û heram qebûl nakim. Dek û dolab anî serê ‘Ehmed îro jî hatiye dawa me dike. Nabe nabe bi navê Xwedê û pêxember nabe.

‘Ereb Zengûrî jî rabû, hespa xwe ya reş girê da, çekên xwe yê reş li xwe kir, ber devê xwe girêda, rima xwe ya reş ji kalanê derxist;

- De ka kî mêre, wê were me ji xwe re bibe!

Bavê ‘Ehmed ev gotinana bihîstin. Bangî cengawerên hemû welatan kir, sond xwar;

- Kî herdu jinan ji min re bîne, ez ê barê sed deveyî (Hêştir) zêran bidime wan.

Ji hemû welatan cengawer hatin kesekî nikarîbû zora herdu jinan bibe şerê jinan û cengawaran sê mehan berdewan kir.

Li aliyê din ‘Ehmed hîn li bin siya darê ye. Nenûk lê bûne dehs, por bûye hirî, mêşan li ser gimine, rî bûye gebe. Tajiyê wî dihere nava gundan jê re yek kurtêyl nan tîne, ‘Ehmed bi wan kurtêylên nanî dijî. Rojekê cardin ‘Ehmed li bin siya darê rûniştiye. Bi emrê Rebbê ‘Alemê du kevok têne ser wê darê. Kevok ji hev re dibêjin;

- Ev mêrê Rindika Çiya û ‘Ereb Zengûrî ye bavê wî, seba kevneke jin lê wiha kir. Ger niha şiyar bûya û li me guhdarî bikira, wê di çilo ji darê ve û du per jî ji me bikeve. Ger herdu çavên xwe ji berîka xwe derxe û têxe cih paşê jî herdu çilo û peran bi çavên xwe bide wê bi destûra Xwedê herdu çavên wî sax bibin.

‘Ehmed şiyar e û li wana guhdariyan dike;

- Hi hi we go çi?

Hema bi vê gotinê re herdu kevok ji ser darê firriyan. ‘Ehmed destê xwe peland hema du çilo û du per ketine destên wî. ‘Ehmed ji kêfa re çavê rastê kire şûna çavê çepê, çavê çepê kire şûna çavê rastê û raza.

Li aliyê din keraşoyek çûye ber çem û cilên xwe dişo. Li kêleka xwe bûkimek nan daniye. Tajiyê ‘Ehmed hema ji nişkave di nan dada û bire ji ‘Ehmed re. Dema gihişte binê darê dî ku ‘Ehmed raza ye. Serê xwe bi ‘Ehmed da, ‘Ehmed hêrs bû (Çavên xwe hişk girtiye newêre veke);

- Xêr e te kurm vêketo!

Ê ma tajî fêm dike? Paşê hedî hêdî çavên xwe vekir bavoooo dî ku dinya ron e. Êdî çavên ‘Ehmed dibîne. Rabû û berê xwe da malê. Bi şevan bi rojan, çiya û banî, deşt û newal derbaskirin hat hat hat! Li çolekê li şivanekî rast hat;

- Şivano ma qey tu nikarî berxekê bide min. Ez ê roviyên wê tenê jixwe re bibim, goştê wê û vî tajiyê xwe jî bidime te.

Şivan;

- Dibe baş e.

‘Ehmed berxa xwe girt serjêkir. Berx post kir roviyên berxê derxistin rovî paqij kirin û rovî kişande serê xwe, goştê berxê û tajiyê xwe da şivên û ji wir jî bi rê ket. Hat hat hat! Bi rojan bi şevan bi rê hat berve nîvro gihişte gundê bavê xwe. Bavooo dî ku qiyamete Rindika Çiya li ser banê, ‘Ereb Zengûrî jî di qadê de, di şerekî giran de ye. Li wir dageriya mala bavê xwe. Keçel e. (rovî kişandibû serê xwe) kesên di mala bavê wî de;

- Law law law va çi keçel e!

‘Ehmed;

- Xatûn ji beg re bêje, ji bona Xwedê ez bibime şivanê qazên we da ku ez karibim pariyek nan bixwim. (qezenc bikim)

Xatûn (Dêmariya ‘Ehmed);

-Temam tamam, hewceyî beg nake, qaz wane de hema niha here ber wana. êvarî dema ku tu vegeriya em ê cihekî jî bidine te, da ku tu jî bisitirî. ‘Ehmed qaz dane ber xwe û çû ber qazan. êvarî vegeriya malê dema ku beg (Bavê ‘Ehmed) keçel dî;

- Ev kî ye? Ev keçela li vir çî dîke?

Xatûn;

- Seba pariyek nan edî wê here ber qazên me.

Beg;

- Baş e.

Çar rojan, şeş rojan, deh rojan ‘Ehmed li ber qazan ma.

Şervan ji welatan dihatin ji bona Rindika Çiya û ‘Ereb Zengûriyê di qada şer de têk bibin.

Rojekê ‘Ehmed ji Beg re got:

- Axa tu min rind têr bikî û hespeke rind bide min ez ê vî siwarê di meydanê de bikujim.

Ev gotina ‘Ehmed kete serê axê. Axê ferman kir got, zû vî keçelî bibin hemamê bira serê xwe pak bişo, hinek kincên pak li vî keçelî kin û bibin nava hespên tewilandî bira ev keçela ji xwe re hespeke baş biecibîne. Xulaman gotinên axê bi cih anîn. ‘Ehmed di nava hespan de hepsek ji xwe re ‘eciban. Axê careke din ferman kir got, şûna avê hespa keçelê min bi şîr av bidin, şûna êm mewîj û kêsmeyan bide hespa keçelê min.

Heftek derbas bû ‘Ehmed li hespa xwe siyar bû di nava gund re çû- hat piştî qederekê hate ber mala Axê rima xwe di ‘erd’e de daçikand û ji axê re got, Axayê min qesem bi navê Xwedê hîn ji bona amadekariya min hefteyek heye, ez ê hefteyekî din bixebitim û wisa derkevîm qada şer.

Hefteyekî şûnda ‘Ehmed car din li hespa xwe siyar bû, di nava gund re çû-hat û berê xwe cardin da mala axê li ber deriyê mala axê sekinî, rima xwe di ‘erd’e de daçikand û ji axê re got, axayê min ez edî amade me. Axa kefxweş bû.

‘Ehmed dotira rojê kete qada şer. ‘Ehmed dema ku zora ‘Ereb Zengûrî dibe axa bang dike:

- Ha keçelê min ha! Ha de rima mirinê, ha de rima mirinê.

‘Ehmed guhê wî ne li ser axê ye. Tam dike rimê li ‘Ereb Zengûriyê bide, lê vê yekê nake şûnda vedigere. Şer bi vî rengî hetanî êvarê ber dewam dike. Daviya rojê kes zora kesî nabe gel hemû li malên xwe belav dibin.

‘Ereb Zengûrî û Rindika Çiya jî diçin mala xwe. ‘Ereb Zengûrî ji Rindika Çiya re dibêje:

- Welleh Rindika Çiya wê va keçela sibe zora min bibe û wê axa te ji xwe re bike bûk. Haa ez qesem dikim ev keçela dişibe ‘Ehmed lê çavên wî şaş in. Ez heyirî mame !

Rindika Çiya bersiva ‘Ereb Zengûriyê dayê:

- Lê ez kur û kem kirimê ma niha qirik û qertelan ‘Ehmed xwarine, ‘Ehmed ma hal ma.

‘Ereb Zengûrî;

- Ez qesem dikim ev keçela ‘Ehmed e, lê qe ji min bawer meke.

Dotira rojê qada şer careke din giran bû. Hinek tîlîliyan dikşînin, hinekan dane hurobiyan, halanan di şervanan hildidin. ‘Ehmed cardin zora ‘Ereb Zengûriyê bir lê tu tiştek nekir. Li aliyê din axa bang dike:

- Ha keçelê min ha! Ha de rima mirinê, ha de rima mirinê.

‘Ehmed weke birûskeke sayî ji qada şer derdikeve û rima xwe di pêşîra axê re dike di pişta wî re derdixe. Zaroyên axê, xulam û gundiyên axê kirin haho haho;

- Haho haho vî keçelî axa kuşt!

- Law zalimo axa tu xwedî kir te jî axa kuşt!

‘Ehmed bangî gundiyan, xulaman û birayên xwe kir;

- Ez ‘Ehmed im lawo kilê çavên ‘Ereb Zengûrî û Rindika Çiya.

Hemû kes matmayî man! ‘Ehmed çîroka ku di serê wî re derbasbûyî ji hemûyan re vegot. Paşê gundiyan axa birin dûrî gund veşartin û tu kesî li ser ne Qur’an ne jî Fatîha xwendin.

‘Ehmed û herdu hevjinên wî bi miradê xwe şa bûn.

Xevrîşoka (çîrok) min li diyaran rehmî li dê û bavên guhdaran bêyî cenderme û tehsildaran.

3.7.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî

Hal mesele: Bûyer vegotin

Hogir bûn: Banîn, hewisîn

Stêr: Cihîn ku nivîn li ser tê danîn

Qederek: Hinekî, demekê

Doşkirin: Zivirandin

Xezî: Talan

Kurtêyl: Perçeyek nanî, hinek nanî

Bûkim: Perçeyek nanî, hinek nanî

Keçel: Kesê/a ku porê wî/wê tune

3.7.b. Metelokên Herêmê

Xwedê da me kê

Bila li ber dilê Xwedê çetin neyê

Qet tu yê bibêje heft sale mirî ye

Ha li vir û ha li wir

De bê lome be

Por bûye hirî

Nenûk bûne dehs

Kurm vêketo!

Te ez kur û kem kirimê

3.7.c. Di Çîrokê de Dem

Dema çîrokê ne diyar e.

3.7.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh

Çol

Banî

Deşt

Newal

3.7.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî

Qada şer

Ber mala axê

Pêş deriyê qêdî

Pêş deriyê muffî.

3.7.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî

Mala bavê ‘Ehmed

Avahiya li ser tehtê.

3.7.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê

1. Mêrekî axa, du jînên wî û sê zarokên wî hebûn (i)
2. Hersê lawên axê dixwazin bizewicin (x^1)
3. ‘Ehmed postê beqê diavêje êgir (Z^3)
4. Bavê ‘Ehmed dibêje em herin nêçîrê (J^1)
5. ‘Ehmed ji bo nêçîrê peşniyara bavê xwe dipejirîne (g^1)
6. ‘Ehmed û bavê xwe diçin nêçîrê (e^3)
7. ‘Ehmed ji bo nêçîrê ji malê diçe (\uparrow)
8. Ji bo vexwarina avê bavê ‘Ehmed herdu çavên ‘Ehmed derdixe (X^6)
9. Axa dixwaze bi darê zorê bi herdu jinên ‘Ehmed re bizewice (X^{16})
10. ‘Ehmed vedigere malê (\downarrow)
11. ‘Ehmed deşt, newal, baniyan derbas dike (R^2)
12. ‘Ehmed di şiklê keçelekî de vedigere mala bavê xwe (O)
13. ‘Ereb zengûrî li çavê ‘Ehmed dinêre û wî nas dike (M^1)
14. ‘Ehmed bavê xwe dikuje (Pu)

Şemaya vê çîrokê wisa ye:

$x^1, Z^3, J^1, g^1, e^3, \uparrow, X^6, X^{16}, \downarrow, R^2, O, M^1, Pu$

3.7.h. Peyam

1. ‘Edetên gelêrî.
2. Qîmeta cîrantiyê.
3. Di nava kurdanda girîngiya nêçîrvaniyê.
4. Oldarî pêşbînî ye.
5. Soz dayîn tiştêkî girîng e
6. Xwedê carinan mirovan şaş dike
7. Axa xwedî dek û dolab in
8. Hezkirina ajalan
9. Şêr şêr e çi jin e çi mêr e
10. Dawiya xerabiyê tune ye.

3.7.i. Leheng

Ehmed: Ji bo qehreke demî ji malê bi dûr dikeve û bûyerên cûr be cûr tene serî.

Dayika Ehmed: Keseke oldar e. Pend û şîretên baş li lawê xwe dike. Keseke pêşbîn e.

Bavê Ehmed: Bi fen û fûtan Ehmed dixapîne. Dawiyê ji aliyê Ehmed ve tê kuştin.

‘Ereb Zengûrî: lehengeke bêtirs e. Keseke bi xwe bawer e.

Rindika Çiya: Temsîliyeta xweşik bûnê dike.

Pisîk: Hevaleke zana ye. Ji bo Ehmed dost e û wî ji xetereyan xelas dike.

Keвок: Şîretkar in, kesên rind ji xerabiyan diparêzin.

Tajî: Hevalbendê ‘Ehmede di jiyana wî ya kambax de.

Hesp: Nişana lehengiyê ye. ‘Emed bi saya serê hespa xwe heyfa xwe hildigire.

3.7.î. Nirxan

Di vê çîrokê de em bi gelemperî dikarin bibêjin ku em rastî sê dersan tên. Yek kesên axa an jî dewlemend kê m zêde xwedî dek û dolab in. Dema ku karek bi van kesan re hate kirin ger mirov baldar be. Dersa duyem wêrekî ne karê mêran tenê ye, kesê xurt xurt e. Li vê derê em fêm dikin ku ji bona gotina pêşiyar “ Şêr şêr e çi jin e çi mêr e” piştrast bike lehengiya jinan hatiye ravekirin. Dersa sêyem jî girîngiya ji hezkirina ajalan li ber çavan radixe. Ji bona vê yekê em di çîrokê de rastî çend cûre ajal tên mînak: Hesp, tajî, pisîk, kevok, beq.

3.8. Siltan Hesen û Eşîra Binî Zêdan¹⁹⁷

Hebû tunebû di demeke nediyar de Eşîra binî zêdan hebû. Di demekê de baran nebarî, zevî şîn nebûn, her der û dor hişk û hola man. Êdî diyar bû, heft salan xela bi ser Eşîra binî zêdan de daket. Giregirên ‘eşîrê li hev berev bûn gotin em çer bikin û çer nekin? Serokê ‘eşîrê Siltan Hesen got çara me tenê ev e ku ger em herin cem Keçelê Şorê.

Siltan Hesen û Ebû Zêd berê xwe dan cihê Keçelê Şorê. Bi şev û rojan çûn, diyar dane pişt xwe zozan dane sînga xwe, ne li ber kaniyan, ne li ber siyên daran sekinîn çûn û çûn. Piştî çend rojan gihiştin cihê Keçelê Şoran. Bavoooo ! çi bibînin?

Keçelê Şorê li hêlekê destav dike, li hêlekê sipiyan dikuje, li hêlekê nanî dixwe. Siltan Hesen û Ebû Zêd bi hev û din şevirîn gotin, ma wê ev keçela çi çareyê ji me re bibîne, hel halê wî, hel pêrgala wî tewwww! Rabûn çar naçar vegeeriyar, di vê navberê de Keçelê Şorê bangî wan kir;

- Loo loo mêvanno ka werin hûn hatine çi !? hûn çima paş de vedigerin? Ka bêjin derdê we çi ye?

Siltan Hesen;

¹⁹⁷Min ev çîroka ji Meryem DUSAK (Meyra Xerîb) wergirt. (12.07.2012)

- Law mal neşevitiyo! Ev çi halê te ye? Tu çi dikî? Ev çi rewş e?

Keçelê Şorê;

- Ez sipiyan dikuji, xwe ji dijminên xwe pak dikim. Ez nanî dixwim nefsa xwe kor dikim. Ez destav dikim, bêhna xwe fireh dikim, canê xwe rehet dikim. Pêşde werin derdê xwe ji min re bêjin.

Siltan Hesên;

- Ev bû heft sale xela bi ser Eşîra binî zêdan daketiye, tu yê di vî warî de çi ji me re bibêjî?

Keçelê Şorê;

- Ma ji vê hêsatir çi heye. Hûn ê herin welatê xwe, dema hûn gihiştin welatê xwe hûn ê çar arwaneyan¹⁹⁸ bikin. Paşê hûn ê wana egal kin (bitevilîn). Berê yekê bidin rojava, berê yekê bidin rojhilat, berê yekê bidin başûr, berê yekê bidin bakur. Bi vî awayî bira şevêkê bimînin. Dema sibe bû li rewşa wan binêrin û werin wê rewşê ji min re bêjin.

Siltan Hesên û Ebû Zêd li welatê xwe veşeriyên. Dotira rojê çûn bazara hêştiran çar hêştir kirîn. Beriya êvarê berê yekê dan rojava, berê yekê dan rojhilat, berê yekê dan başûr, berê yekê dan bakur. Heta sibê bi meraq sekinîn. Dema edî rojê hedî hedî dinya ronî kir hemû kes ji malên xwe derketin û ber bi hêştiran ve çûn. Bavoo! Çi bibînin! Hemû arwane hişk bûne, mirarî bûne, hew bi tenê ya rojhilat xunavî li ser çavan zîpik zîpikî bûye, kayikan dike. Siltan Hesên û Ebû Zêd berê xwe dane cem Keçel. Çûn çûn bi şevan bi rojan çûn. Kanî û banî li paş xwe hiştin. Berbanga rojekê gihiştin cem Keçelê Şorê. Siltan Hesên hemû tiştên ku li nava Eşîra binî zêdan qewimî bû ji Keçelê Şorê re rave kir.

Keçelê Şorê;

¹⁹⁸ Hêştir (Deve) a mê.

- Baş e, baş e a ha! Wê çaxê hûnê malê xwe bar kin û xwe li rojhilat bigrin û herin. Xêr û erzanî li hêla rojhilat e.

Siltan Hesen û Ebû Zêd vegeyriyan nava qewmê xwe. Mizgînê dane wan. Gotin êdî nan û avê me li vir nema, bi şîreta Keçelê Şorê ger em ji vir bar kin û berê xwe bidin rojhilat. Hemû ‘eşîrê amadekariya xwe kirin. Mal bar kirin.

Pîreka Siltan Hesen ‘Alyê xerîb bû. Kesên ji xerîbê di nava xwe de heznedikirin digotin: “ Hatel geray xelet xeray” bila ên xerîb vegeyriyan mala bavê xwe, yê din jî bira bi me re werin. ‘Alyê çar naçar vegeyriya mala bavê xwe. (Siltan Hesen ji vê bûyerê ne agahdar e) Koçan bar kir û berê xwe dane rojhilat. Ji warê bav û kalan dûr ketin karekî dijwar e. Her kesek çavên van bûbûn çemekî bihêz, hestir diherikîn bi ser rûyê wan de. Pîrekan stranên xerîbiyê digotin, lawij diherikîn ji dev û lêvan. Hinek disekinîn û li paş xwe dinerîn, di vê navberê de rojên xwe yê şadî dianîn bîra xwe, kul û keder dibûn du qat. Karwan çû, hedî hedî li palpişta çiyên wendabûn.

Siltan Hesen û Ebû Zêd li pêşiya karwan diçin, rêberiyê ji karwan re dikin. Bi şev û rojan meşa wan berdevam kir. Rojekê gihiştin qeraxa çemekî, dîtin ku wê hêla çem şînê, tûm, genim, ceh, gil û giha xêra Xwedê ye, kar û berx didin tîzoka her der û dor xêr û bêr e. Karwan giş gîhan ser hevûdin. De gelo em ê çawa derbasî hêla din bibin. Civat berev bû bi hevûdin şewirîn.

Siltan Hesen;

- Gelo erê ez serok ‘eşîrim lê belê zana yê me Ebû Zêd e, ka Ebû Zêd tu çi dibêjî.

Ebû Zêd;

- Ya Siltan Hesen tu çend rojan bide min da ku ez çara di ser çem re derbasbûnê binêrim.

Siltan Hesen;

- Baş e, Ebû Zêd tu bi kêfa xwe, lê tu dibînî rewşa zar û zêçan, heyrana te tu lezkî.

Çer guftugo qediya Ebû Zêd misasê¹⁹⁹ xwe rakir û bi qeraxa çem ket. Çû çû li derekê rast hat. Li wê derê beraya çem hindik dibe, misasê xwe li wir dadiçikîne, daw û delingê xwe berev dike û dide nava çem. Dihere dihere lê kûrahiya çem zêde nabe, de de de bê zehmet dihere hêla din. Bang dike dia dike;

- Ya Rebê min te ez fedîkar û rûreş dernexistim, ez ‘evdê te çiças pesna te bidim û çiças dia bikim wê gotinên min kêmbimîn. Hema ez dibêjim tu zanî û tu kanî.

Ebû Zêd cardin di şûna xwe re veqerîya çem misasê ku di ‘erdê de daçikandiye. Misasê xwe bi wî halî hîşt û berê xwe da nava ‘ebra binî zêdan. Ber bi êvarê gihişte nava Eşîra xwe. Hemû ‘eşîr di bin konê Siltan Hesên yê donzdeh stûnî de rûniştîbûn. Geşbûna sûretê Ebû Zêd hemû hevîdar kirin. Gişk bi kelecânî li benda bersiva Ebû Zêd in. Hemûyan bêhna xwe girtiye, qey tu yê bibêje her kes ev bû heftê sale wefat kirine. Deng ji kesekî dernayê, hew bi tenê vingina çend mêşane, bê van çend mêşana kesekî zindî tu ne ye! Ev bêdengiya bi dengê Siltan Hesên hate birrîn.

Siltan Hesên;

- Ebû Zêd ev bû çend rojin em li heviya hatina te bûn. Ez dibînim rûyê te dikenî, bawer dikim û ji Xwedayê hemû aleman hêvî dikim te ji me re xebera xêrê aniye.

Ebû Zêd;

- Siltanê min, qesem dikim bi navê Xwedê edî em filitîn, min riya ji çem derbasbûnê dît. Min cihek nîşan kiriye bi meşeke qedere çend rojan em ê bigihêjine wir û em ê di ser çem re derbas bibin.

Dotira rojê careke din koça ‘eşîrê binî zêdan bar kir. Çûn çûn gihiştine cihê ku Ebû Zêd misasê xwe daçikandiye. Ebû Zêd û Silatan Hesên dabû pêşya karwan, hinek ji çem derbas bûn, hinek jî hîn derbas dibûn. Silatan Hesên û Ebû Zêd li qiraxa çem sekinîne li benda karwane, da ku hemû bi sax û silametî çem derbas bikin. (Siltan Hesên di nava vê teşxelê de ewlad û ‘eyalê xwe ji bîr kiribû. Ewqas mijûl bû ku roja ji welatê xwe derket heta vê rojê ne carê malbatên xwe ne jî zarokên xwe

¹⁹⁹ Ço, şiv, şirtik

dîbû.) Pîrek li ser arwaneyekê, di ber Siltan Hesên re derbas dibe, arwaneya pîrê çav li keskayiyê dikeve heşê wê ji serî difire û êrîşî ser gihê dike. Pîrê bi dilê safî ji arwananeya xwe re dibêje : (haya wê ji Siltan Hesên tune)

- Hay hay ne bi xêr û ne bala, ew jî bûye Siltan Hesên çav li tûmê kesk ket her tişt ji bîr kir.

Dengê pîrê çû Siltan Hesên, Siltan Hesên gazî pîrê kir;

- Dayê dayê ma min çî ji bîr kir tu min dişibînî vê arwane yê.

Pîrê;

- Siltan Hesên, em bûn çend rojên bi rê tîn, te ne mala xwe ne malbata xwe pirsî, kanê ‘Alya çavbelek. Eşîra te nehîştin ‘Alyê bi me re were. ‘Alyê xeyidî û çû mala bavê xwe.

Qey tu yê bêje sîtilek ava germ bi ser Siltan Hesên de kirin. Ka wê çî bêje. Ya Sebûr! Koç hemû ji çem derbas bûn û li ber qiraxa çem Eşîra binî zêdan kon wegirtin. Hemû kon çar- pênc stûnî bûn, lê konê Siltan Hesên donzdeh stûnî bû. Kêfa ‘eşîrê xweş bû, rû û sûretên hemûyan dikenyan, ji ber ku ji mirinê filitî bûn. Lê her kes şad û bextewar bû lê dilê Siltan Hesên mîna beroşa bulxurê dikeliya. Tebat ne dihatê. Ev bû heftek- dudu ye bi rê tê û qet mal û malbat nehate bîrê. Her tim di pêş karwan de diçû lê malbata wî li dû wî ma. Gelo bi ‘edetên Eşîra Bavê ‘Alyê dizanîbû, an niha ‘Alyê dane yekî an jî kuştine. Siltan Hesên biryar da, bi rûniştinê dert nayên dermankirin, berbanga sibehê xwe şidand û xeber da Ebû Zêd. Ebû Zêd bi lez û bez hate dîwana Siltan Hesên. Dema ku Ebû Zêd kete dîwanê, xulaman qahwe anîn ber Ebû Zêd. Ebû Zêd bi guman bû. Zanîbû ku tiştêkî girîng tunebe Siltan Hesên di berbanga sibehê de bangî wî nedikir. Ebû Zêd qehweya xwe hedî hedî vexwar, zikê wî birçî bû, qehwe weke çemekî di gewriya wî re daket berve jê gera qehweyê ya di laşê xwe de hemû hîs dikir. Piştî vexwarina qehweyê Siltan Hesên dest bi gotinê kir;

- Ebû Zêd tu zanayê me yî û hem jî tu birayê min î, tu dibêjî ‘eceb Siltan Hesên çima vê demê bangî min kir ?

Ebû Zêd;

- Bi navê Xwedê tu mafdarî, çergî ku ez hatime vir ez vî tiştî difikirim.

Siltan Hesen;

- De guhdarî bike. Dema ku me ji warê xwe koç barkirin û ez û tû em ketin pêş koçê, hinekên xêrnexwaz û hesûd li paş koçê ji ‘Alyê re dibêjin tu xerfbî, tu bi me re mê. Tu zanî ‘Alyê qîza bega ye û bi fêz e (xurûr), wê jî li xwe dananiye û bi tena serê xwe berê xwe daye mala bavê xwe, heta vê derê jî ji ber mijûliyê ez agahdar nebûme ku ‘Alyê vegeriya ye malê.

Ebû Zêd;

- Tu bi Xwedê kî?

Siltan Hesen;

- Erê Welleh û Billeh. Kekê min tu ‘edetên Eşîra ‘Aliyê ji min rintir zanî. A niha ez ê sedema bangkirina te, ji te re bêjim.

Ebû Zêd;

- Siltanê bidad, çira mala bavê min, giyan û canê min, ewladên min û Eşîra min di riya te de feda ye. De ferman ke!

Siltan Hesen;

- Ebû Zêd ez dixwazim ku tu Şêro û ‘Egît bi min re bişîne.

Ebû Zêd;

- Siltan Hesen, ne Şêro û ‘Egît her neh zarokê min bila di riya te de feda bin.

Piştî vê guftugoyê Ebû Zêd çû malê bangî Şêro û ‘Egît kir, mesele ji herduyan re vegot û şîret li wan kir : “ Siltan Hesen ji we re çî got bînine cih, bê qedriya Siltan mekin.” Zarokan bersiv dane bavê xwe : “ Bavo hewce nake ku tu ji me re wisa dibêjî, em bimrin jî em ê apê xwe sax bişînin cem we.” Piştî vê guftugoyê Siltan

Hesen her du lawên xwe himbêz kir û maçek danî ser ‘eniya wan. Şêro û ‘Egît ketin nava amadekariyê. Kurk û herbanîyê xwe li xwe jidandin, rim û şûrên xwe amade kirin, hebanên xwe tijî xwarin kirin, hespên xwe mitirh kirin paşê xatir ji malbatê xwestin û çûne bal konê Siltan Hesen. Siltan Hesen bi dîtina wan kefxweş bû wî jî amadekariya xwe kir û berê xwe dane nav Eşîra mala bavê ‘Alyê.

Hersê ‘egîdên Eşîra binî zêdan berê xwe dane oxirê pişta xwe dane felekê. Çiya û banî, deşt û newal, gund û mezre derbas kirin. Her sê ‘egît mîna bazên ku konsantreyî nêçîra xwe bibin çavê xwe tîq kiribûn û li asoya pêş xwe dinêrîn. Geh rewanên xwe didan çargaviya, geh jî dimilmilandin. Her ku roj di ser wan re derbas dibû bêhna welat bêvila wan dişewitan, ber bi êvarekê ji dûr ve wargeha Eşîra binî zêdan ditîn. Lê mixabin nikaribûn dagerin warê xwe ji ber ku hîn riya wan dûr bû. Dema ji dûr ve warê xwe hedî hedî derbaskirin, rojên berê ketin xeyalên wan, bi taybet Siltan Hesen zêdetir xemgîn bû. Siltan Hesen noqî binê xeyalan bû. Li her der û dorê waqe waqa qazan, çîveçîva çivîkan, ûrina sewalan, liqeliqa qîzên ciwan, pîstepista pîrên giran, şîngeşînga rim, şûr û mertalên ‘egîdên Eşîra binîzêdan, bavo bavoya Sittê ya biçûk, qeqeba kewên gozel, hayehaya dengbêjan, bê dengiya şevbûherkên çîrok û stranan, hakehaka zarokên lêvterikî ...

- Apo, apo !

Bi gotina apo apo re Siltan Hesen ji xêyalên kûr veciniqî.

Siltan Hesen;

- Xêre lawo!

‘Egît;

- Apo tu dixwazî em hinekî bêhna xwe bigrin, ji ber ku şev pirr çû ji sibehê re qederek ma.

Siltan Hesen;

- Erê welleh hûn rast dibêjin. Ger em hinekî bêhna xwe vedin û razên ji ber ku sibe rojeke dirêj li ber me ye. Ger em sibe hîn bi hêztir bibin.

Her sê ‘egîdan kurkê xwe li ser ‘erdê raxistin û xwe li ser dirêjkirin. Ji ber ku dinya germ bû herbaniyên xwe li kêleka xwe danîn, rimên xwe kirin bin herbaniyan, şûrên xwe kirin bin serên xwe. ‘ewr filan bîvan li ‘ezmanan tune bû, stêrk dibiriqîn ji dûr ve dûvstêrkek dîtîn li ‘ezmanan, stêrk dirijiyên bi van dîmenên balkêş hêdî hêdî bijangên (mijang) wan hatine ser hevûdin û ketine xewa şêrîn ya ku gel jê re dibêjin birayê mirinê.

Roj bejneke hilat, lê hersê ‘egît ji xew ranebûn. Tîna rojê qederekê şûnda hîn zêde bû. Siltan Hesen hedî hedî xulmaç bû. Venuxurî ser xwe li derdora xwe nêrî, her der hişk û hola ye, deşt, çiya ji bêbaraniyê zer bûne. Lê li ber vê dîmenê xemgîn bû. Hedîka rabû ser xwe kurkê xwe ji ‘erdê rakir û dawêşand û di vê navberê de tişteke hat bîra wî : “ Hey şeytanê na’letullah me nimêja sibehê nekir. Ya Reb tu me efû bike êdî ji betaliyê (west) em gêj bûbûn Tu ji me baştir zanî, tu me efû bikî.” Siltan Hesen, bi ava kun destmêj girt (bi hindik av) û qezaya nêmeja sibehê kir. Paşê bangî her du biraziyên xwe kir, wana jî mîna apê xwe destmêj girtin û qeza nimêja sibehê kirin. Piştî nimêjê hebanên xwe vekirin, çend parî nanê sêlê, hinek toraq û hinek penêr derxistin û bi navê Xwedê dest bi taştê kirin. Siltan Hesen got : “ Ya Rebê min î mezin di nava vê xelayê de te ev na’meta daye me, ji bo her tiştî bê dawî şikir.”

Bila Siltan Hesen û xwarziyên xwe taştîya xwe bikin em herin cem ‘Alyê û malbata wê. Bavê ‘Alyê jî serok ‘eşîr bû. Piştî ku ‘Alyê li mala bavê xwe vejeriya, di nava ‘eşîrê de ev bûyera kete rojevê, ji zarokên pêçekê hetanî kal û pîrên li ber mirinê qal û bala vê bûyerê dikirin. Hinek gotinên nebaş diçûn guhê bavê ‘Alyê û bi van gotinan diêşiya. Bavê ‘Alyê çare nedît, ka wê çawa bike. Di heşê vî de bi sedan fikr û ramanan êrîşî hevûdin dikirin: “ Gelo, Siltan Hesen ne merivekî wisa bû çi qewimî?”, “ Qey çewtiyeke ‘Alyê hebû qîza min li min vegerand?”, “ Çima mîna mêran nehat bûyer ji min re venegot?” bi vî rengî ramanek dihat yek diçû. Dî nedî, bangî ‘Alyê kir :

- ‘Alya min a çavxezal, êdî Siltan Hesen û filan û bîvan li te venagere, ka em te bidine pismamê te da ku dawîya van bêbextî û gotinên pûç were.

‘Alyê jî pir xemgîn bû û dilê wê ji Siltan Hesen mabû kete nava xeyalan, bi xwe û xwe digot : “ Ma zalimo te qey negot kanê hevjiîna min ? Ma xayino ev gotinên xweş û delal te ji min re fikir hemî derewbûn ?”

‘Alyê, ‘Alyê, ‘Alyê bi vê gotinê re ‘Alyê ji xeyalên xwe bi dûr ket. Hema ji nişkave fermo bavo!

Bavê ‘Alyê;

- Qîza min tu ji gotinên min re çî dibêjî? Ev bû qedereke li benda te me, tu deng ji te dernayê.

‘Alyê bi dilekî şevitî û kelogirî;

- Bavo tu zanî.

Bavê ‘Alyê bangî birayên xwe kir. Hemû birayên wî li bin konê wî yê donzdeh stûnî rûniştin. Hewa germ e, vingevinga mêşane, hinek titûnê derdixin dikin qelûnê, hêdî hêdî hesteyên li ‘erdê radikin çik! Çik! Çik! Agirê hesteyên wan melûl melûl vêdikeve, giran giran heste dibin ser qelûnê, agir bi titûnê dikeve, dûmaneke rengmarî dilerizê û berjor ve diçe, piştî demekê li nava kon belav dibe. Urte urt li hev diqelibin. Hinek bi dengê bilind, sedema berevbûna wana di binê kon de ji yê din dipirsin, hinek di bin çavan re li derûdora xwe dinêrin, hinek simêlên xwe yê qeytan ba didin.

Ji nişka ve dengê bilind hat. Hûn hemû bi xêr hatin! Bi vî dengê re gotin, xeberdan, pirs hemû hatine birrîn. Her kes tîq bûn û li birayên xwe yê mezin mêze kirin. Bavê ‘Alyê dest bi gotinê kir : “ Hûn hemû dizanin ku ev bû qedereke qîza min ‘Alyê ji nava Eşîra binîzêdan hate qewitandin. Ev kirin ne kirinên mêran e, lê carekê bû! Min biryar da ku ez ê qîza xwe bidime biraziyekî xwe, ji bona vê ya min bangî we kir. Ka lawê kê qîza min dixwaze ?”

Demekê deng ji kesekî derneket. Paşê birayê biçûk Qefer bang kir: “ Ez ê ji lawê xwe re bixwazim. ‘Alyê namûsa me hemûyane.” Tu kesekî bervêna. (Lê Bavê ‘Alyê xemgîn bû ji ber ku Qefer kesekî fenek bû) Hema li wir biryar hate dayîn

û bi lez û bez dest bi amadekariya bûk derxistinê kirin. Lê Qefer mirovekî mizawir bû. Bi kêf ji kon derket û çû malê. Bangî lawê xwe kir : “ Lawo min ‘Alyê ji te re xwest !” bi vê gotinê re ar kete çavê lêwêk : “ Bavo te kesek nedî, te avriya ber devê Siltan Hesên ji min re xwest.”

Qefer;

- Lawo, min xwest ku em namûsa xwe xelas bikin. Şeva ku ‘Alyê bû bûk û me konê we dûrî kona vegirt. Tu yê wê xençer kî. Wê demê wê bang bike bêje “ yûma” ku te gotina yûma bihîst, ji kon bireve û bide hirobiyan bêje dizan ‘Alyê kuşt. Em ê bi vî awayî ji vê belayê xelas bibin ji ber ku edî hemû ‘eşîr ji ‘Alyê aciz in.

Bila mala bavê ‘Alyê amadekariya şahiyê û Qefer jî amadekariya dek û dolaban bike em li Siltan Hesên û biraziyê wî vegerin.

Piştî taştê xwarinê, Siltan Hesên û biraziyên wî, hespên xwe yên tewilandî vekirin, mitirhê wan li ser wan kirin, zengûyên wan şidandin û bi ser hespên xwe ketin, berî dane nava Eşîra Bavê ‘Alyê. Mîna salên borî çiya û neval li dû xwe dihîştin. Cih û warên ku tê re diçûn hemû kavil bûbûn. Cih û warên şên, bûbûn warên mar û mişkan. Nimêja ‘esir, êvarî û ‘eşa bi hevdu re kirin. Ji bilî demên nimêjan ranewestiyên çûn çûn. Nêzîkî roj hilatinê dîtin ku ji dûr ve hinek çira diçirûsin. Siltan Hesên bangî xwarziyên xwe kir: “ Ew çirana çirayên Eşîra mala bavê ‘Alyê ne, em bisekinin nimêja sibê bikin em ê paşê bi rê kevin ji ber ku riya me hindik maye.”

Cewdikek av tenê li bal wan mabû. Hersêyan bi hindikek av destmêja xwe girtin. Siltan Hesên ji wan re bû mele. Bi hemû hucreyên xwe dia xwendin û nimêja xwe qedandin. Piştî nimêjê Silatan Hesên destê xwe vekir û dia kir. Diaya wî hetanî rojhilat berdewan kir. Dema roj hilat ji hebanên xwe çend parî nan derxistin û nanê tisî xwarin. Piştî xwarinê. Ber bi ‘ebra Eşîra mala bavê ‘Alyê çûn. Dema nêzîkî li ‘ebrê kirin, dîtin ku dengê defê tê. Hinekî din çûn li şivanekî rast hatin.

Siltan Hesên;

- Şivano roja te bi xêr.

Şivan;

- Xêr bi silamet.

Siltan Hesen;

- Gelo ma ev çî denge ji nava vê ‘ebrê tê.

Şivan;

- Bi navê Xwedê ev dengê defê ye. Li vê ‘ebra me bûk derdikeve.

Siltan Hesen;

- Bûka kê ye?

Şivan;

- Qîza serokeşîrê me ‘Alyê didin pismamê wê.

Dema ev gotina kete guhê Siltan Hesen mîna deh gule bi hev re di dilê wî re derbas bibe. Lê rewşa xwe diyar nekir. Xatir ji şivan xwestin û berve nav konên ‘ebra bavê ‘Alyê çûn. Dema ku gihîştin nêzîkî konan dîtî ku konek qeydimekê ji hemû konan veqetiyaye. Siltan Hesen fêhm kir ku ev kona konê Pîra sêhr e. Hêdfika xwe gihîştine kon û ketin bin konê Pîra Sêhr. Pîrê Siltan Hesen nas dikir. Pîrê pirsî : “ Siltan Hesen ‘Alyê didine mêr, tu dereng nema?” Siltan Hesen : “ Erê welleh ez dereng mam.”

Pîra Sêhr kenîya;

- Na na tu dereng nemayî.

Siltan Hesen;

- Ka em ê çawa bikin.

Pîra Sêhr;

- ‘Edeteke me heye, dema ku bûkek derdikeve, xwediyê bûkê, konê bûk û zavê li dûrê konên ‘ebrê datînin. Ez ê herim cem ‘Alyê û ez ê xebera hatina te bidimê. Ez ê jêre bibêjim, ‘Alyê dema ku tu birin kirin kozika bûkê, mesekine ji wir derkeve were bin konê min Siltan Hesên wê li wir li hêviya te be.’

Siltan Hesên;

- Ê ev baş e. Lê dema zava were kozikê wê bi vê rewşê nehese? Gelo zava bi vê rewşê bihese em ê çawa ji nava wan bifilitin?

Pîra Sêhr;

- Wê pê bihese lê wê dereng pê bihese?

Siltan Hesên;

- Çawa?

Pîra Sêhr;

- Aha vaye kerasên bûkan li bal min hene. Em ê kerasên bûkan li biraziyê tekin û ew ê li şûna ‘Alyê li hêviya zavê bin. Heta bi vê rewşê bihesin tu û ‘Alyê hûn ê ji vê ‘ebrê bi dûr ketibin.

Biraziyê Siltan Hesên jî dibin danasên gotinên Pîra Sêhr. Siltan Hesên vê yekê napejirîne. Lê biraziyê wî ji wî re dibêjin: “ Apo tu vî karî bikî, em filitîn, filitîn em nefilitîn jî wê nav û dengê me di nava Eşîra binî zêdan bê dawî were xwendin, wê li ser me stran, klam were gotin. Em bi vî halî razî ne.”

Pîrê radibe diçe cem ‘Alyê rewşê ji ‘Alyê re vedibêje. ‘Alyê : “ Min zanîbû, min zanî bû Siltan Hesên min nake xwarina gur û hirçan. Min zanîbû.” ‘Alyê ji pîrê re dibêje : “ Here ji Siltan Hesên re bêje ez ê bêm” Pîrê bi lez û bez vedigere cem Siltan Hesên û gotinên ‘Alyê ji wî re dibêje. Siltan Hesên kefxweş dibe û amadekariya êvarê dikan.

Ber bi êvarê konê bûkê ji konan dûr vegirtin. Piştî ku êvar bû hemû şênîyên ‘ebrê bûk birin kon û vegeriyan malên xwe. Hema di wê navberê de herdu biraziyên

Siltan Hesen (Ku vana li mala Pîra Sêhr kincên bûka li xwe kiribûn) dikevin binê kon. ‘Alyê bi hatina wana kefxweş dibe, ‘Alyê bi lez û bez ji kon derdikeve dihere bal Siltan Hesen. Ji biraziyên Siltan Hesen yek dikeve nava nivînên bûkê yek jî xwe li paş stêr vedişêre. Demekê şûnda zava tê nava kon û bê qal û bal şûr li nava nivînan dide. Dengê ji nava nivînan tê dibêje : “ Yaba” Zava heyirî dimîne dibêje ma gelo ger vê negota “ yûma” ? cardin zava ji xwe re dibêje : “ Hele ez bêhnê li derve bigrim ez ê cardin vê xayinê bidime ber şûran.” Dema ku zava derdikeve derve, birazyê Siltan Hesen tê laşê birayê xwe radike dibe li paş stêr datîne, îcar ew dikeve nava nivînan. (Lê kanîbû bi rimekê zava bişanda dojecha keran, lê ji bo filitandina apê xwe wî jî xwest canê xwe feda bike)

Qederekê şûnda zava hat hundurê kon û careke din bê qal û bal şûr ji kalanê kişand û di bûka nava nivînande daçikand, carekê, du caran, sê caran... cardin dengê ji nava nivînan hat “ Yaba” zava cardin heyirî ma. Piştî vê gotinê zava dirêjî lehifê bû lehêf ji ser bûkê rakir. Xêliya bûkê danî bavooo! Çi bibîne? Ev kesa ne ‘Alyê ye, zilamekî biyanî ye. Zavê kir qêrîn gazî kire ‘ebrê, ‘ebr hatin bavoooo! çi bibînin? Du laşên ciwanan li ber konê zavê ye.

Bila ‘ebra Eşîra mala bavê ‘Alyê li ber konê zavê bisekinin em îcar herin cem Siltan Hesen û ‘Alyê.

‘Alyê dema ku ji kon derket kirasên bûkaniyê ji xwe kirin û cilên zilaman (peya, mêr) li xwe dike û berê xwe dide konê Pîra Sêhr. Dema ku ji nişkave dikeve nava kon Siltan Hesen û Pîrê vediceniqîn, jê dipirsin: “ Gelo tu kî yî ?” “karê te li vir çi ye ?” ‘Alyê dibêje : “ Siltan Hesen ez im ez, ez ‘Alyê me!” Siltan Hesen hema dest û piyên xwe di stûyê ‘Alyê re dibe û bi hesreta salan ‘Alyê himbêz dike. Ji nişkavê pîrê dibêje : “ De hadê herin hûn, dereng bimînin wê şênî bi we bihese û we bikujin.” De ka êdî kî mêr e wê Siltan Hesen bisekinîne an jî xwe bigînin Siltan Hesen. Siltan Hesen li kumêta xwe, ‘Alyê jî li kumêteke din siwar bû û berê xwe dane warê Binî Zêdan. Herdu kumêt weke bayê bezê diçûn. Her gaveke kumêtan qeydimek bû. Ba li pêy wan diwestiya. Çiya û newalan xwe didan alî rê ji wan re vedikirin. Qey tu dibêje artêşek leşkeran bi rê ve diçe, her der û dor kirine tozan, herdu kumêtan û siwarên kumêtan. Wê şevê, bi roj û şeva din bê sekin hespên xwe bezandin. (Bi tenê

dema ku wexta nimêjê dihat ji hespên xwe peya dibûn û nêmjên xwe dikirin.) Li tu warî nebûne mêvan, bi tenê nişangeha wana nava Eşîra binî zêdan bû. Riya hefteyekî di du rojan de girtin. Berbi şefaqê bi qasî cixarekê rawestiyan nimêja xwe kirin û careke din bi rê ketin. Çûn çûn çûn. Bê sekin çûn, bê bêhnvedan çûn, bê axavtin çûn, bê ken çûn, bê pirs û bersiv çûn, çûn çûn çûn lê belê bi hêvî çûn, bi hêviya jiyaneke nû çûn, bi hêviya despêkeke nû çûn, bi hêviya evîneke nû çûn, bi hêviya dilşadiyeke nû çûn. NeseKinîn, hesp beziyan, hevî gur bûn, hesp beziyan azadî pêşde hat, ji mirinê filitîn, hesp beziyan ‘erdê di navbera wan û Eşîra binî zêdan hindik ma, hesp beziyan çiya li paş man, hesp beziyan dijmin li kaş man, hesp beziyan neval û deşt bûne palpişt, hesp beziyan Siltan Hesên û ‘Alyê çûn. Piştî çend rojan ber bi êvarê herdu siwaran nêzîkî li warê Binî Zêdan kirin. Nêzîkî ‘ebrê li şivanê xwe rast hat Siltan Hesên. Slav li şivên kir û ji hespê peya bû.

Siltan Hesên;

- Slava Xwedê li ser te bî Zinar.

Zinar;

- Wey siltanê dilan Xwedê ji te razî be. Bisekinin hûn niha betilîne ez ji were hinek şîr bidoşim. Bila behna we derê.

Siltan Hesên;

- Wey tu her hebî Zinaro! Bavê te jî mêr bû, tu jî mêr î.

Siltan Hesên ji ‘Alyê re got : “ ‘Alyê de kerem ke tu jî ji hespê peya bibî, em cixarekê bêhna xwe vedin, tasek şîr vexwin bila heşê me vere serê me. Ev bû çend rojin em bi tenê li ser pişta hespan çend parî nanê tisî dixwin.” ‘Alyê mîna birûskê ji ser hespê xwe peya bû û weke werdegeke Gola Hemko milmilî ber bi Siltan Hesên hat û xwe li teniştê wî bera ‘erdê da. Zinar di vê navberê de şîr dot, şîr kire taseke ‘eba û anî da Siltan Hesên. Dema ku Zinar tasa şîr di destan de, ber bi Siltan Hesên hat, ‘Alyê piçekî ji cem Siltan Hesên bi dûr ket û pişta xwe bi Siltan Hesên û Zinar de kir. (Ji ber ku jineke oldar bû Herçiqas Zinar şivanê wan bûya jî cardin namehrem bû.) Zinar tas anî û da Siltan Hesên, Siltan şîr venexwar rabû çû ber ‘Alyê û şîr da

‘Alyê : “ ‘Alya delal ha ji te re şîr. Tu berê vexwî ez ê paşê vexwin.” ‘Alyê Herçiqas got na jî, Siltan Hesen got îlle tu yê vexwî. ‘Alyê got “Bîsmîllahîrehmanîrehîm” û tasa şîrê xwe vexwar. Piştî wê Zinar tasek şîr ji Siltan Hesen re jî anî Siltan Hesen jî weke ‘Alyê şîrê xwe vexwar. Piştî şîr vexwarinê Siltan Hesen xatir ji Zinar xwest û li hespên xwe siyar bûn. Lê Zinar;

- Siltanê Dilan ez ji te rica dikim hûn hinekî li vir rûnin, ez herim nava ‘eşîrê mizgîna hatina we bidime wana. Da ku ez heqê mizgînê ji Ebû Zêd bistînim.

Siltan Hesen;

- Dibe baş e.

Zinar bi lez çû nava ‘eşîrê mizgîna hatina Siltan Hesen daye ‘eşîrê. Bi vê nûçeyê re giregir, zar û zêç, qîz û bûk, xort, kal û pîrên ‘eşîrê kirin zilxet û ber bi Siltan Hesen çûn. Ebû Zêd ji bona vê mizgînê deh beran dane Zinêr. ‘Eşîr hatine pêş Siltan Hesen, Siltan û ‘Alyê pêşwazî kirin. Lê dîtî ku her du biraziyê Siltan Hesen li cem wana tunene. Hemûyan fêm kir ku ‘Egît û Şêro hatine kuştin. Tu kesekî tiştek ji Siltana Hesen nepirsî ji ber ku hemûyan zanîbûn ya wê Siltan Hesen li wana venegere yan jî birziyên wî. Siltan Hesen û Eşîra Binî Zêdan hatin nava konên xwe. Siltan Hesen di bin konê xwe yê donzdeh stûnî de rûnişt û giregirên ‘eşîrê li wî berev bûn. Siltan Hesen hemû bûyera ku bi serê vî de hatibû ji wana re vegot. Di vê navberê de dengê Ebû Zêd hat;

- Siltan Hesen, bi tenê ne Şêro û Êgît bila hemû mal û milk û Eşîra me ji te re bibe qurbanî.

Xwezî di qirika Siltan de ma, kelo girî bû hew bi tenê,

Siltan Hesen;

- Ez ez ez...

Dengbêjan li ser Şêro û ‘Egît klam derxistin, çîrokbêjan çîrok derxistin. Piştî çend rojan Siltan Hesen bangî Ebû Zêd kir û got : “ Ebû Zêd, tu birê min î, te ew qas fedakarî di ber min de kir ku ez çî bikin wê ji te re hindik bimîne, Kekê min, ez

dixwazim Sittê bidime lawê te tu çi dibêjî? ” Ebû Zêd : “ Siltanê Dilan te got çi bila wisa be, gotina te ser çavan.” Hema wê gavê gazî kirin gundiyan, gotin sibê dev û dawet e. Sittê dibe bûka mala Ebû Zêd. Dotira rojê amadekariya şahiyê kirin. Hemû ‘eşîr berev bû li ber bilûra şivanan govend girêdan. Piştî govendê bi destê Sittê girtin û birin konê zavê. Berbûyan Sittê li binê kon hîştin û vegeriyan nava konên xwe. Dema ku zava hate cem Sittê û xêliya wê rakir, Sittê bi dengê qehrî; “ Ma qey te heyfa birayên xwe Şêro û ‘Egît hilanî, tu te yî cem min.” Zava bi ser vê gotinê berbi Sittê neçû. Sibe bû zava çû cem bavê xwe got: “ Ez Sittê naxwazim ji ber ku gotinên kêr ji min re kirin.” Sittê dane birayên din, Sittê li wî jî wa kir. Were were Sittê li şeş biran heman tişt kir. Paşê Sittê dane birayên biçûktirîn. Dema ku zava çû cem Sittê, Sittê ji wî re jî : “Ma qey te heyfa birayên xwe Şêro û ‘Egît hilanî, tu te yî cem min.” Zava gotin lê Sittê vegerand : “ Hele were were ez sefera li ber xwe ada kim, ez ê paşê Eşîra Bavê ‘Alyê ji dinyayê rakim.” Piştî vê gotinê zava xeber da mele, mele hat mara wana birrî.

Çend rojan şûnda lawê Ebû Zêd ê biçûk (zavê Siltan Hesên) ji bavê xwe re got : “Bavo ez ê herim heyfa birayên xwe bigirim.”

Ebû Zêd;

- Baş e. Lê belê ger em berê ji Siltan Hesên re bibijên.

Ebû Zêd çû bal Siltan Hesên û fikra lawê xwe ji Siltan Hesên re vegot. Siltan Hesên ev fikra bi kêfxweşî pêşwazî kir. Hemû giregirên ‘eşîrê li xwe berev kirin, rewş ji wana re jî got. Paşê biryar derket: Şer...

Eşîra Binî Zêdan, amadekariya şer kirin. Ji aliyê din ve xeber ghişte Eşîra Bavê ‘Alyê jî, wana jî ji bo şer amadekarî kirin. Piştî çend rojan herdu hêz (Eşîra Binî Zêdan û Eşîra Bavê ‘Alyê) bi rê ketin. Dem weke avê diherikî piştî çend rojan her du hêz li Deşta Axwêranê hatin hemberî hev. Şer destê sibê dest pê kir. Şûr ji kalanan hate kişandin, rim û mertal, hevsarên hespan hate jidandin bi ‘hirobiyan, bi alanan şîngînî kete qadê. Toz û dûman ji ber lingên siwaran radibû, qada şer bûbû axirdewran. Şîngeşînga şûr û mertalan, firefira hespên kihêl, alanên şervanan

tevlîhev dibû li qada şer. Ji her alî de axîna birîndaran tevlî halanên şervanan dibû.
Deng dihat:

- “Heeeyyyy ez bavê keybanû me ka kî mîre bira were hemberî min.”

- “Heeeyyyy ez siwarê Azwerê me ka kî dixwaze jinên xwe bê mîr, zarokên xwe bê bav bihêle bira were hemberî min.”

- “Ho ho ho ho ez kilê çavê ‘Efrê me ka kî lawê bavana bira were hemberî min.”

- “Heeeyyyy ez kilê çavê Sittê me, birayên min di ser pêncan re li yê şeşan dixist, derd bi min ke ve ma qey ez nikanim di ser şeşan re li yê heftan xim.”

Ber bi êvarê pir kes ji Eşîra mala bavê ‘alyê hatine kuştin ên sax man bi zorê canê xwe ji destê şervanên Binî Zêdan xelas kirin, li paş xwe nenerîn û wekî bayê bezê ji qada şer reviyar. Piştî şer rawestiya Deştê Axwêranê bûbû gola xwînê. Ên serî jê bû bûn, ên pî jê bûbûn, ên çav derketibûn... Siltan Hesên emir da: “Bira her kes ji hespên xwe peya bibin û li nava qada şer bigerin, kesên mirî û kesên birîndar ji hevdu cihê bikin. Birîndaran li aliyê rojhilat berev bikin, ên mîrî jî li aliyê rojava berev bikin û Mirî û birîndarên me ji yê Eşîra din cuda deynin.” Bi vê fermanê re hemû şervanên Eşîra Binî Zêdan ji hespên xwe peya bûn û li qada şer geriyar. Piştî demekê hemû mirî û birîndar berev kirin. Ji Eşîra Bavê ‘Alyê sih merî, du birîndar. Ji Eşîra Binî Zêdan pênc mirî, sê birîndar. Siltan Hesên, hemû şervan li dora xwe berv kir û ji wana re got:

- Ez dibêjim ku, em xeberê bidin Eşîra Mala Bavê ‘Alyê bira werin mirî û birîndarê xwe bibin. Wê ev tiştê hîn baş nebe gelo?

Mezinên ‘eşîrê hemûyan gotin gotina te rast e Siltan Hesên. Di nava xwe de yek hilbirjartin û şandin cem Bavê ‘Alyê. Siltan Hesên ji qasid re got: “Here xwe bigîne Bavê ‘Alyê û vê xebera me jê re bibêje. Em ê jî mirî û birîndarê xwe bibin, tu yê ji paş de bigêji me.” Qasid bi rê ket. Siltan Hesên û şervanên wî mirî û birîndarên xwe li hespan kirin. Siltan Hesên ji bo birîndarê Eşîra din peyayek peywirdar kir û ji wî re got: “Em niha diherin, tu li cem van birîndaran bimîne u li wana miqate be. Dema ku Bavê ‘Alyê hate vir, tu û qasidê din bi hev re bidin rê û xwe bigihînin me.”

Siltan Hesen û Eşîra wî ber bi cih û warên xwe bi rê ketin. Qasidê Siltan Hesen ji paş de gihişte koma Eşîra Bavê ‘Alyê û gotinên Siltan Hesen ji wana re got. Dema ku Bavê ‘Alyê ev gotina bihîst vegeriya eşîra xwe û got:

- Siltan Hesen ji berê de mêr bû. Îro careke din mêraniya xwe diyar kir.

Bavê ‘Alyê tevî şervanên xwe bi şûnda vegeriya. Mirî û birîndarê xwe li ser hespan kirin û berê xwe dane welatê xwe. Herdu şervanên Binî Zêdan jî ji paş de gihişte koma xwe. Siltan Hesen û şervanên Eşîra Binî Zêdan gihiştin nava zar û zêçên xwe. Paşê dengbêjan şerê Siltan Hesen û Bavê ‘Alyê kirine stran, bi sed salan li ser devê dengbêjan ev şera bi navê Şerê Deşta Axwêranê hate bibîranîn.

3.8.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî

Misas: Ço, şiv

‘Eyal: Malbat

Arwane: Hêştira mê

Xulmaç: Ji xew rabûn

Cewdik: ‘Eyarê ku ava vexwarinê tê de (Bi piranî ji çermê karan tê çêkirin)

‘Ebr: Cih, war

Qal û bal: gotin, behskirin

Adakirin: Bicihanîn

3.8.b. Metelokên Herêmê

Mal neşewitiyo!

Nan û avê me li vir nema

Berê xwe dane oxirê pişta xwe dane felekê

Sefera li ber xwe adakirin

3.8.c. Di Çîrokê de Dem

Di çîrokê de dem ne diyar e.

3.8.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh

Zevî

Zozan

Diyar

Deşta Axwêranê

3.8.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî

Ber konê Siltan Hesên

3.8.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî

Konê Siltan Hesên

Konê Pîra Sêhr

3.8.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê

1. Eşîra Binî Zêdan hebû (i)
2. Ji ber xelayê ji welatê xwe derdikevin (e^2)
3. Eşîra Binîzêdan nahêle ‘Alyê bi wan re were (X^9)
4. Siltan Hesên pê dihese ku ‘Alyê tune ye (x^1)
5. Siltan Hesên ji bo anîna ‘Alyê bangê gelê xwe dike (Y^1)
6. Siltan Hesên biryara çûyîne dide (W)
7. Siltan Hesên ji malê dedrdikeve diçe (\uparrow)
8. Siltan Hesên bi hespa xwe bi rê dikeve (R^2)
9. Siltan Hesên ‘aliyê digire û tîne (E^1)

10. Siltan Hesên ji nava Eşîra Bavê ‘Alyê difilite (S)

11. Siltan Hesên vedigere nav Eşîra xwe (↓)

12. Eşîra Binî Zêdan û Eşîra Bavê ‘Alyê li Deşta Axwêranê şer dikin (L¹)

13. Eşîra Binî Zêdan û Eşîra Bavê ‘Alyê li Deşta Axwêranê têk dibe (V¹)

Şemaya vê çîrokê wisa ye:

e², X⁹, x¹, Y¹, W, ↑, R², E¹, S, ↓, L¹, V¹

3.8.h. Peyam

1. Xela karesateke dijwar e.
2. Welatên Rojhilat bi xêr û bêr in.
3. Girîngiya jinan di naca civata kurdan de.
4. Civata kurd civateke oldar e.

3.8.i. Leheng

Siltan Hesên: Rêber û rêzanê eşîra xwe ye. Kesekî wêrek û dilsoz e.

Ebû Zêd: Dostê dostê xwe ye. Hişmend û aqilmendê eşîrê ye.

Keçelê Şorê: Kesekî zana ye.

‘Alyê: Jineke bedew, xwedî doz û wefakar e.

Şêro: Cangoriyê doza apê xwe ye. Bê tirs e.

‘Egît: Cangoriyê doza apê xwe ye. Bê tirs e.

Sitê: Delaliya Siltan Hesên e. Ji bo tolhildana pismamên xwe têdikoşe.

Qefer: Beko Ewan e. Fenek e, xwedî dek û dolab e.

Pîra Sêhr: Di hemû çîrokan de roleke neyinî dilîze, lê belê di vê çîrokê de lehengeke erênî ye. Ji bona revandina Alyê rê û rêbazan nîşanî Siltan Hesên dide.

Zinar: Şivanekî dilsoz e.

Azwer: Nîşana lehengiyê ye. Hespeke bi nav û deng e.

3.8.î. Nirxan

Di vê çîrokê de jî pirr ders têne dayîn. Zor û zehmeta xelayê li ber çavan radixe da ku mirov qedr û qîmeta hebûnê zanibe. Herçiqas di nava gelên dinyayê de Rojhilat cihekî nebaş tê pejirandin jî nerastbûna vê bi bereketa Rojava vedişire. Dersên din ên ku ji vê çîrokê were derxistin yek jin her tim di nava civata kurdan de bi qîmet in. Zilam dikarin seba jinan mirinê jî bide ber çavê xwe, ger hewce be di vê oxirê de dikarin hemû Eşîran jî feda bikin. Dersa din jî gelê kurd di her dem û her zamanî de oldar in, girîngiya olê di nava kurdan de zêde ye.

3.9. Sodeleynê²⁰⁰

Hebû tunebû, carekê ji caran rehmet li dê û bavê guhdaran. Gundek hebû, navê wî gundî Tirba 'Egîda bû. Ev gunda cih û warê Eşîra Qemaran bû. Qemaran ciranê hinek 'eşîrên 'Ereban bû. Ji ber vê yekê di nava Eşîra Qemaran de hinek navên jin û mêran dişibiyên navên 'Ereban. Serokê 'Eşîrê navê wî 'Evdê bû û lawekî wî tenê hebû, bê vî lawikî tu zarokên wî tunebûn. Navê lawê wî Keleşûs bû. 'Evdê di nava hemû Eşîran de bi nav û deng bû. Her dem sifreya wî li 'erdê bû. Mevanek dihat yek diçû.

Tirba 'Egîda li kêleka çemekî bû, beriya wê hemû deşt bûn lê li hemberî vê, li aliyê din pişt xwe dabû çiyayên bilind. Hemû çiya xedî navbûn, ji zarokên pêçekê hetanî kal û pîrên li ber mirinê navê van çiyayên dizanîbûn. Hemû navên çiyayên, bi jiyana wê civatê têkildar bû. Çiyayê Miraza, Çiyayê Xezebê, Çiyayê Spî, Çiyayê Dilşewat, Çiyayê Zilmê û hwd. Eşîra Qemaran nîv deştî û nîv çiyayî bûn.

Serma û seqema zivistanê, mij û morana zivistanê hêdî hêdî kezî û delingên xwe berev dikirin, xatir ji çiya û deştên Qemaran dixwestin. Lê ne xatir xwestineke bêdawî bû, ev xatirxwestina, xatirxwestineke demkî bû. Dest li ba dikir zivistanê û ji

²⁰⁰ Min ev çîroka ji Zerê Akborû (Zera Fatê) wergirt. (15.08.2013) Zerê Xanim 72 salî ye, nexwendî ye û li Rihayê dijî.

dûr ve diqêriya: “ Li benda me bin, em diçin lê di demeke kin de, em cardin mêvanê we ne.” Di vê xatirxwestinê de qet hêsir nedihate barandin û qet kesek xemgîn nedibû.

Her demê Xwedê keştiya bextê mirovan di behrên bêpêl de nade avjenîkirin. Car caran pêlên bextê mirovan wisa radibe ku mirovan noqî binê behrê dike. Vê carê felek ji Keleşûs re wê xefkên qedere deyne. Simbêla Keleşûs hîn nû xwî dida. Mêvan diçûn û dihatin. Konê donzdeh stûnê yê ‘Evdê Begê tu caran ji mêvanan xalî nedima. Keleşûs tu caran li kêleka bavê xwe nedima ji ber ku gotûbêjên mezinan ew ‘aciz dikir. Derveyî kon ji Keleşûs re her dem cihekî azadiyê bû. Lewra li derveyî kon Sodeleynê hebû, lewra li derveyî kon gotûbêjên evîniyê hebûn.

Vê şevê felek ji ‘Evdê Beg re xefkekê datîne navê xefkê jana zirav e. Ji êvara Xwedê de ye kuxekuxa ‘Evdê Beg e, her ku dikuxe xwîn ji gewriya wî tê çavên wî di kortikan de dibe gola xwînê. Hekîm anîn, remildar anîn lê yek ji ‘Evdê Beg re nebûn çare. Êdî diyarê goristanê ji nêz ve xweya dikir. ‘Evdê Beg ev şeva xedar bi darê zorê kire sibeh. Laşê wî di binê lihêfê de bûye quşûf. Çavên vî gola xwînê. Ji nişka ve destê xwe dirêj kir û bi dengê lawaz (Qey tu dibêje ji binê bîrekê tê):

- Keleşûs, keleşê Eşîra Qemaran, xwe nêzîkî min ke û guhê xwe bide ser gotinên min. Yadîgara dayika xwe, tayê rihanê, ez êdî diçim vaye diyar e qeder dibêje bese. Lê gotinên min xwe ji bîr meke. Xwîn di zikê apê te Cano û pîreka wî Reşê de tune ye. Tu vêya rind zanibe. Ji aliyê wana de baldar be.

Berbi nîvro halê ‘Evdê Beg xerab bû. Qasidê Rebul ‘Alemîn li ser bedena nazik bû mêvan, li ser ‘eniya wî xwîdan zîpikzîpikî bûbû, çavên wî tîq bûbû li stûna kon dinêrî. Binê kon bi dengê Qura’anê û diayan alan dida. Hew bi tenê edî du lêvên ‘Evdê Beg diliviyên, Keleşûs guhên xwe bire ser lêvên bavê xwe da ku gotinên wî bibihîze, Keleşûs di nava lêvên bavê xwe de gotina dawiyê bihîst: “ Eşhedûenlaîlahe îlallah we Eşhedû Enne Mûhemmeden ‘abdûhû we Resûlûhû” çav xeriqîn, laş cemidî. ‘Evdê Beg îro mêvanê welatê xwe yê ebedul abadê ye. Giregirên ‘eşîrê berev bûn cenaze şuştin, kefen kirin û binax kirin. Hemû ‘eşîr ji goristanê veqeriyên ‘Evdê Beg û bi xêr û gunehên xwe re bi tenê ma.

Bi hevalbendiya qîqeçîka dîkan, bi hevalbendiya çîveçîva çûkan, bi hevalbendiya ‘ê ye ‘ê ya şivanan rojê dinya kire kizoteke agir. Her der û dor disincirî, vinge vinga mêşan Keleşûs ji xewa şêrîn rakir. Rabû hedî hedî tevizî da xwe, rabû ser xwe, misînê qela kirî da destê xwe û xwe bi ser teyştê de qûrve kir. Çend mist ava misîn li rûyê xwe kir, lê avê ser çavê wî şewitan, qey tu yê bêjî ev ava ne di bin kon de ye, li ser agirekî gur hatiye kelandin. Kire nirçenirç û vegeriya cihê xwe. Hinek xulam bi lez û bez hatin nivîn hilanîn, kulavê reng hingivîn dawêşandin, her der û dora kon paqîş kirin hinekan jî taştê amade kirin. Di vê navberê de Cano li deriyê kon xweya kir. Bi dengekî qure:

- Law tereso! edî dewr û dewrana te û bavê te qediya. Rabe ji vir, vî kulavî li xwe ke, hêştir li benda te ne.

Dinya Keleşûs tevlihev bû ramanek hat, yek çû xwest bersiva xwe bide, lê kelogirî bû hew bi tenê.

- Ma apo, qey, qey...

Canoyê zalim bi şelmaqan hate rûyê hinarî, Cano Keleşûs da ber xwe û bir nava hêştiran. Cano, kîncên Keleşûs jê danîn, hinek pertolên qetiyayî û bi pîne li bejna nazik û delal kir. Keleşûs bê çare kulavekî serwaniyê li xwe kir. Cano bi qerf;

- A ha niha tam bû, binêre ev kulava û ev kincana çî xweş li bejna te hat. Teres kurê teresa. Law qeşmer ji tirsava bavê te re min nikarîbû tiştêk ji te re bigota lê ji îro şûnda ez te li cem Sodeleynê bibînim ez ê pî û destê te bişkînim ha.

Keleşûs ji kerba deng nekir û bi tenê bû hîskehîska wî. Ji aliyekî qedexekirina dîtina Sodeleynê, ji aliyekî de zilm û zora apê wî. Dinya li serê Keleşûs bûbû zordarek, her der, her dem ji wî re bi rengê zilmê dihate hûnandin. Lê Keleşûs xwedî doz bû, bawermend bû dema ku bi tenê dima xwe bi xwe digot: “ Ev qedera Xwedê ye ger ez sebir bikim dem wê bizivire, qey wê çerqxa felekê rojekê li aliyê min jî bizivire. Ya Sabûr, Ya Sabûr!”

Roj mîna ava çeman diherikî ev bû saleke Keleşûs serwanê hêştira ye. Hew car caran bi dizî ji dûr ve Sodeleynê didît. Dilê wî ji bo Sodeleynê dilê Sodeleynê jî ji

bona wî dikire gupegup. Bayê evînê her dem mêvanê herdu yan bû. Di nava salekê de bi dehan qasid hatin ser Sodeleynê lê Sodeleynê yek nepejirandin. Cano û Reşê li cem remildaran nivîşt çêkirin lê ev nivîştana kêrî tişteki nehatin. Carekê evîna Keleşûs dilê Sodeleynê dîl girtibû, ma qey mimkune ku nivîşt kêrî tişteki werin?

Berbanga sibehê ye dengê li ber Çemê Bêmirazan olan dide. Piştî nimêja sibehê Keleşûs destê xwe berbi ‘ezmana vekiriye û çavekî şil dia dike: “ Ey Xwedayê hemû gerdûnê, li ber vê zilmê tu sebrê bike nesîbê min, Tu dibîne, Tu zane û Tu kane. Ey Xwedayê min...” Dia bi vî awayî heta roj hilat berdewam kir. Paşê Keleşûs rabû û çû ber çem da ku hinek av vexwe. Dema gihîşte qiraxa çem kevirêki gilover weke hêka leglegê dît pirr ji vî kevirî hez kir û ev kevirê kire berîka xwe.

Rojekê ji rojan Keleşûs bihîst ku zêrîngerek hatiye gund. Keleşûs kevirê xwe yê gilover kire destê xwe û çû cem zêrînger ji zêrînger re got: “ Tu ji kerema xwe re vî kevirê min têxe nava hesinekî û zincîrekê pêveke wekî baskekî kaniyan. Dema ku heştir reviyar ez dê vî kevirî bavêjim ji wana de û da ku kevirê min wenda nebe ger tu bi vî awayî vî kevirî ji min re amade bikî.” Zêrînger gotina Keleşûs anî cih. Keleşûs kevirê xwe yê bi zincîrê kire berîka xwe û çû nava hêştiran. Dema ku Keleşûs çû nava hêştiran arwaneyek ji nava hêştiran bazda û reviya Keleşûs da pê arwaneyê da ku wegerîne. Lê kir û nekir arwane venegeriya. Keleşûs kevirê xwe yê bi zincîrê derxist, li ba kir û avête ji arwaneyê de. Kevir li hêleke arwaneyê ket di hêla din re derket û arwane ket û telef bû. Keleşûs dema çû ber serê arwaneyê qey tu yê bibêjî bûye heft sale ev sewala telef bûye. Ber bi êvarê Keleşûs hêştir anî gund. Cano mîna her car di devê çitê de sekinî û hêştir jimartin. Paşê dît ku arwanek kê m e. Bi hêrs ji Keleşûs pirsî;

- Law tereso çima arwaneyek kê m e ? Te çî bi arwaneyê kir?

Keleşûs dev bi ber hev ket, ji tirsê diheziya û pirsê apê xwe bersivand.

- Arwane, arwane, arwa...

Cano;

- Law teres, te çer kir ev çî gelmigelma te ye. Te arwane kuşt an jî wenda kir ?

Keleşûs;

- Arwane, arwane, reviya, kevir, ez, çû, kuşt...

Cano;

- Law qeşmer tu çi dibêjî!?

Hema cano bi kulmista hate ser çavê Keleşûs, dev û pozê wî tije xwîn kir. Ser çavên Keleşûs bi kulmistan reşûhêşîn kir. Bi dengê qebe bang kir.

-Teres lawê teresa sê rojan ez nanî nadime te û ez ê te bi kuta kon ve girêdim û tu bisekine ev cezaya hîn hindike, dema ku min tu girêda hîn ez ê çi bînim serê te tu yê bibîn.

Cano dest û lingên Keleşûs girêdan û bi kuta kon ve girêda. Di vê navberê de xeber ji 'eşîreke 'Ereban re şand û gotin verin ez ê Soldeleynê bidime we. Dotira rojê xwezgînçiyê Soldeleynê hatin. Sodeleynê çikas gote: "ez bê Keleşûs tu kesî naxwazim, hûn min bidin vî heramî ez ê xwe bikujim." Tu fêde nekir carekê dilê bavê wê bûbû kevir xwîn di zikê bavê wê de tunebû, guhê bavê wê bûbû kevir qet gotinek nedibihîst. Cano ji bona Sodeleynê sed hêştir, du xençer û hespeke kihêl qelen xwest. Giregirên Eşîra 'Ereban ev xwestekana pejirandin û fatîha xwendin. Paşê ji cano re gotin: "em ê hefteyekî din şûnda, bi berbûyekî mezin werin û em ê Soldeleynê bibin."

Cano;

- Hay hay ser seran û ser çavan.

Sodeleynê di paş perdê de van gotinan guhdarî dika û ji aliyekî de hesiran dibarîne. Hîn mêvan rûniştine Sodeleynê bi dizî dihere cem Keleşûs û bûyerê jê re dibêje;

- Keleşûs hesreta vî dilê rezîl vane xwezgînçiyê min hatine û tu bi vê stûnê ve girêdayî ye. Ka bêje em ê çi xweliyê li xwe kin."

Keleşûs;

- Dotmam, kul û kesera vî dilî sebir bike.

Sodeleynê;

- Pismam ez dibêjim qelenê min birîne wê heftekî din werin min bibi tu hîn dibêji sebir.

Keleşûs;

- Dotmam “Sebir mine Re’hman ‘ecel mine şeytan²⁰¹”.

Sê rojên Keleşûs xelas bû, apê wî hate dest û nigên vî vekirin. Şirîta ku li dest û nigên Keleşûs hatibû girêdan, dest û nigên Keleşûs werimandibû. Apê Keleşûs boy ku keleşûs xemgîn bibe Sodeleynê jî bi xwe re biribî hinda konê Keleşûs. Di destê Sodeleynêde nanekî tisi û tasek dew hebû, Cano ji mirdarî bang kir,

- Sodeleynê bûka Eşîra ‘Ereban xêra bavê xwe wî kurtêleke nanî û wê tasa dew li ber vî teresî deyne, bira hinek jehr bixwe da ku karibe here ber heştiran.

Sodeleynê bi çavekî şil û bi keseran nanî û dew li ber Keleşûs danî û bi lez şûnda veşariya çû nava konê xwe. Keleşûs nanî xwar, kulavê xwe li xwe kir, hêştir hemû ji nava çîtan derxist û berê wana da Çemê Bêmirazan. Careke din Keleşûs kul û derdê xwe ji çem re digotin. Sê çar rojan şûnda cardin Keleşûs li qiraxa çem rûniştibû û ji nişkave dengê hat:

Keleşûs! Keleşûs!

Keleşûs dema ku paşde zivirî dît ku Soldel’eynê wekî heyva çardeh şevî li pişt wî sekiniye, deng nekir û li bejn û bala wê mêze kir. Qederekê şûnda Sodeleynê bang kir.

- Pismam ma tu kerrî an jî tu lal bûyî, ev çi hale tu li min napirsî.

Keleşûs;

²⁰¹ Sebir ji Xwedê ye, ‘ecele kirin ji şeytanî ye.

- Dotmama min, kul û kedera vî kesê dilbixwîn, ka were li rex min rûne ka wê qeder li pêş me çi riyê veke.

Sodeleynê çû li rex pismamê xwe rûnişt û bi çavên şil derdê xwe vegot;

-Pismamo, sibe wê berbûyê min were û we min ji xwe re bibin, lê ez dibînim qet ne xema te yî.

Keleşûs;

- Dotmamê sebir, sebir.

Sodeleynê;

- Pismamo de ka ev sebir serê me nexwe baş e.

Keleşûs;

- Qet xem nîne Xwedê heye xem tune ye. Sebir bike.

Dotira rojê xeber hate cem Cano û gotin: “ Berbûyê Sodeleynê gihiştine Çemê Bêmirazan wê qedereke din li vir bin.” Di paş perdê de Sodeleynê ev gotina bihîst û bi lez çû cem Keleşûs,

- Pismamo vaye berbûyê min hate diyarê malan ka em ê çer bikin. Ez naxwazim bibim nêçîra nêçîrvanekê ‘ereb, ez pismamê xwe dixwazim.

Keleşûs;

- Sebir dotmam, sebir.

Sodeleynê, heviyên wê şikestin û vejeriya konê mala bavê xwe. Hîn Sodeleynê nû ketibû konê xwe û li ber derê kon dengê zilxetan dinê xerab dikir. Lê li derve pîrekan dikirin zilxet li bin kon Sodeleynê hesir dibarandin. Cano bi lez û bez derket û berbûyê qîza xwe peşwazî kir. Giregirên Eşîra ‘Ereban qelenê Sodeleynê sed heştir, du xençer û hespeke kihêl anîbûn. Berbûyan û gundiyên tirba ‘egîdan govend girêdan, li aliyekî zilxet, li aliyekî berx û beran têne serjêkirin, li aliyekî xwarin tê amadekirin, li aliyekî zarok dikin çirevît, li aliyekî kef û henek. Qîrewîr li

ezmanan olan dida, Keleşûs jî ji dûr ve li şahiyê dinêrî. Keleşûs îro kincên qirêj ji xwe danîbûn, hinek kincên paqij li xwe kiribûn, xençera bavê xwe di ber xwe re kiribû û kevirê xwe kiribû destê xwe û digot: “ Ya Sabûr, Ya Sabûr.”

Ji nişkave rabû kevirê xwe li ba kir û avêt, kevirê wî çû di paş stûyê apê wî de lêket û apê wî bi dev û rûya ve çû erdê. Xwînê di dev û pozê apê wî re avêt. Haho haho kete nava millet çûne ser Cano qey tu yê bibêje ev bû heft sale mirî ye. Di nav wê girseya millet de kesî nizanîbû çî bû çî qewimî. Giş hev dipirsin: “ Gelo çî bû?”, “ Ev derbeya ji ku hat?”, “Bi hemd bû?”, “Bê hemd bû?” pirs bi vî awayî rêz bûn lê bersiva van pirsan kes nizane. Keleşûs di wê navberê re hat û got : “ We apê min kuşt em dotmama xwe nadim.” Dî nedîn berbû paş stuyê xwe xwurandin û ji gund derketin, çûn welatê xwe. Keleşûs bi destê Sodeleynê girt û jê re got : “Dotmam, mayina me ya li vir heram e, em ê berê xwe bidin oxirê”. Çûn, çûn, çûn...

Li gundê Qerûkê li cem Merdo Axa bi cih bûn. Piştî çend rojan cerdê²⁰² girte ser Qerûkê lê Keleşûs rabû xwe kir paş stêr²⁰³ da ku bila xelk bibêje ev kesa newirek e. Merdo axa hate bal konê Keleşûs û ji Sodeleynê pirsî :

- Qîza min ka peyayê te?

Sodeleynê;

- Haho apo! Peya yê min ji roviyan ditirse, ka hîn were cerdê vegeîne. Wele waye ji tirsaxwe kiriye paş stêr.

Merdo Axa;

- Peyayê ku xwe di paş stêr de veşêre, wê were ji min re çî cerdê vegeîne.

Cerd ji gund derket çûn, hemû kel û kax bûn. Hinek siwarên gund bi şopa cerdê ketin. Di vê navberê de Keleşûs bi dizî ji paş stêr derket li hespa xwe siwar bû û xwe gîhande cerdê. Li pêşiya cerdê fitilî. Cerd hemû tazî kirin, hemû kuştin û hespê wana da ber xwe û berve gund anîn dema ku nêzîkî gund bû rişme, lîwan, gem

²⁰² Ji gundekî, an jî ji ‘eşîrekê hinek kes ji bona talanê (pez, dewar, mal talankirin) biçûna ser gund û ‘eşîrên din ji vê re digotin: Cerd

²⁰³ Cihê ku nivîn li ser

û zengûyê hemû hespan jê danîn û li derekê veşart, paşê hesp dane ber xwe û hetanî diyarê gund anî û paşê cardin bi dizî çû nava konê xwe. Siwarên ku bi şopa cerdê ketibûn ji hev belav bûn lê qet tiştek nedîn û her yek di derekê re veşeriyayan gund. Dema ku vedigeriyayan gund hinek siwaran ditîn ku hespên ku cerdê birine hemû li diyarê gund diçêrin hema wana jî çûn hesp dane ber xwe û anîn gund. Yekî digo min hesp anîn, ê din digo na wele min anî, gengeşî bi vî awayî berdewam dikir. Merdo Axa dest bi axavtinê kir hemû kes bê deng bûn : “ Gelo temam we ev hespana anî baş e. Lê ma qey ev hespana bê rişme, bê lîwan, bê gem û bê zengû bûn? Kanê ev tiştana?” Hemû kes sekinîn û li hev û din mêze kirin.

Di vê navberê de dengê Sodeleynê hat û got: “Axa wele çi kiribe Keleşîûs kiriye.” Axa bangî Keleşîûs dike û jê dipirse: “Gelo ev kara te kir an na?” Keleşîûs: “Erê Axa min kir.” Keleşîûs dihere hemû tiştên hespan tîne. Paşê Axa dibêje edî axatî li min haram e. Ji îro şûnda li vî welatî axa tu yî. Keleşîûs li wî welatî bû Axa, Sodeleynê jî bû xatûn

3.9.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî

Xefk: Dahfik, kemîn

Giregir: Mezinên ‘eşîrê

Serwan: Yên ku li hêştiran dinêrin (gavana hêştitan)

Kut: Stûn

Berbû: Berbûk, kesên ku bi bûkê re tên

Cerd: Talan

3.9.b. Metelokên Herêmê

Em ê çi xweliyê li xwe kin

Xwîn di zik de tune ye

Paş stûyê xwe xurandin

3.9.c. Di Çîrokê de Dem

Dema çîrokê ne diyar e.

3.9.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh

Gundê Tirba 'Egîdan

Deşt

3.9.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî

Derveyî Konê 'Evdê Begê

3.9.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî

Konê donzdeh stûnî yê 'Evdê Begê

Binê kon

3.9.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê

1. Hebû tunebû lawikek hebû (i)
2. Keleşîûs ji Sodeleynê hez dike (x^1)
3. Cano ji Keleşîûs re dibêje edî tu yê di nava hêştiran de razê (k^2)
4. Cano Keleşîûs ji hundurê kon diqewirîne (X^9)
5. Cano Keleşîûs bi stûna kon ve girê dide (X^{15})
6. Keleşîûs kevirekî dibîne (Z^5)
7. Keleşîûs biryarê dide ku apê xwe bikuje (W)
8. Keleşîûs apê xwe dikuje (Pu)
9. Keleşîûs û Sodeleynê bi rê dikevin (\uparrow)
10. Keleşîûs û Sodeleynê diçin gundê Qerûkê (R^2)
11. Keleşîûs û kesên cerd birin şer dikin (L^1)

12. Keleşîûs dijminê xwe têk dibe (V¹)

13. Keleşîûs dibe axê Qerûkê (N*)

Şemaya vê çîrokê wisa ye:

x¹, k², X⁹, X¹⁵, Z⁵, W, Pu, ↑, R², L¹, V¹, N*

3.9.h. Peyam

1. Sebir karekî girîng e.
2. Civata kurda civateke oldar e.

3.9.i. Leheng

‘Evdê: Serokê ‘eşîrê ye. Bavê Keleşîûs e. Kesekî pêşbîn û şareza ye.

Keleşîûs: Keskekî weke Hz. Eyûb bi sebre.(Bi sebir e.)

Cano: Di vê çîrokê de keekî xirab û nerind temsîl dike.

Sodeleyn: Rindiyê, wefadariyê, zweşikiyê temsîl dike.

Merdo Axa: Kesekî ciwamêr e. Qedr û qîmeta mêvanan dizane.

3.9.î. Nirxan

Di vê çîrokê de bi gelemperî sê peyam hatine dayîn. Yek Ger mirov di her şert û mecî de sebir bike. Kesê ku sebir kir dawiya dawiyê digihêje mirazên xwe. Dersa duduyan dibêje ku gelê kurd gelekî oldar e, di jiyana kurdan de ol cihekî girîng digire. Dersa dawiyê jî dibêje ku (di nava gel de herçiqas Axa mirovên ne baş were zanîn jî) car caran hinek axa yên baş jî henin.

3.10. Perîzade²⁰⁴

Roj careke din îro, erdê reben dipêjîn e. Tîrêj weke tîran di rûyê erdê de dadiçike. Apê Eyo, Eyo yê Xulyê Demo li ber dîwarê hewşê runiştîye. Kûr difikire,

²⁰⁴ Min ev çîroka ji Eyyûp Bozkoyun (Eyûbê Xelîl) wergirt. (19.06.2012) Eyûb Beg 65 salî ye. Him bejtbêj e him jî çîrokbêj e. Ji bilî vê hostayê ‘erbaneyê ye. Dibistana navîn qedandiye û li gundê Taşliyê Şêxan dijî.

ramanek êrîşî ramanê din dike, barê gerdûnê hemû li ser pişta rebeno barkiriye. Eyoyê kurmanç bi halê hevjinê (jin) xwe pirr xemgîn dibe. Destê xwe radike û dibêje:

_Ya Rebbê min, te du lav dane min ji te re bê dawî şikir/sipas. Lê qîzeke min hebûya wê alîkariya hevjinê min bikira û wê kar û barê rebenê piçekî sivik bibûya. Lê ez ji mehderiya te ne bê hevî me, ez bi navê te ji te, bûkeke şîr helal dixwazim.

Apê Eyo bi van fikr û ramanan destmêjeke nû girt û berê xwe da Mizgefta Sinyê Kullo. Li pêy nimêja nîvro mirov hemû ji mizgeftê derketin û çûne ser kar û barên xwe. Apê Eyo bi dilekî şewitî cardin destê xwe vekir û dia kir. Di vê navberê de li wir, kalekî rû pak peyda bû û ji Apê Eyo re wusa got: Eyo yê derd giran, rabe here gundê Lîwîn mala Hemedê Hemran, qîza wî Perîzade ji lawê xwe re bixwaze. Apê Eyo bi dilşahiyeke mezin çû malê û xwezgînê şande ser Perîzade ya Hemedê Hemran. Hemedê Hemran mirovekî zana û dil bi rehm bû, tu pirsgirêk dernexistin û Perîzade da Apê Eyo. Lawê Apê Eyo Hesên (gundiyan ji Hesên re digotin Hesên ê Girêş, ne digotin Hesênê Eyo. Çimkî Hesên her tim digot êşa dilê min weke gir a bilind e) zavakî çeleng û bejn zirav bû, lê birayê wî Mehmûd mizawirekî wek roviyan bû.

Hesên û Perîzade weke Mem û Zîn ji hev hez dikirin. Rojê wan bi kêf û şahî derbas dibûn. Lê mixabin va şahiya wan pirr berdewam nekir. Paşayê welatê şêxa li hember Haca ketibû şerekî giran. Paşa ji ber vî şerê giran bang li ciwanên şêxa kir û hemû birin şerê çûyin û nehatin ê. Şer bi salan berdewam kir. Perîzade bûk a ser bi xêlî, bê zava kete nava xem ên giran. Di ser şer re pazdeh sal derbasbûn lê tu agahdarî ji Hesên nehat. Mir, ma, bû xwarina guran, tu kesekî nizanîbû. Mehmûd bi çavê xerabiyê li bûka xwe dinêrî. Rojekê çû menzela Perîzadeyê û ji Perîzadeyê re got, tu yê min bixwaze. Perîzade yê li ber vê gotinê bertekeke tûnd da Mehmûdê mizawir. Lê Mehmûd dest bi dek û dolaban kir. Bi navê Hesên nameyek nivîsand û li ber deriyê menzela Perîzade danî. Dema Perîzadeyê ev nameya dît û xwend, hêstir bûn baran û bi ser rûyê hinarî de barîn. Lê ser bi xêlî, ser berjêr ma. Mehmûdê mizawir li ber vê rewşê simbêl babida û digot perî edî tu yê min bixwazî. Lê Perîzadeyê got: Law Mehmûdê mizawir li gerdûnê ez û tu bi tenê bimînin jî cardin ez

te naxwazim. Mehmûd dî ku Perîzade çare lê nabe, îcar jî dest bi bêbextiyan kir. Li nava gund belav kir ku Perîzade bi yar û dergîstî ye. Gundiyan bê dad, Perîzade hetanî ber qirikê kirin axê û bi keviran hatin serê Perîzade ya narîn. Gotin edî Perîzde mir, em dikarin vegerin gund. Gundî vegeryan gund lê Perîzade bi destûra Xwedê hîn nemirîbû. Hinek bazirgan di wê derê (cih ê Perîzade di axê de bû) re derbasdibûn. Wan bazirganan dîtin ku di nav keviran de nalînek dilşewat tê. Çûn kevîr avêtin hêlekê nêrîn ku qîzeke rû bi xwîn û birîndar. Hema bi lez û bez qîz derxistin û derman kirin. Paşê li ser hêştirên xwe kirin û hêdî hêdî ji gundê şêxan bi dûrketin. Salê dor veda, Perîzade li bazara dîl a ji hêla Paşayê Mûska ve hate kurrîn. Paşayê Mûska Sinyê Omo Perîzade bir Qesra Guhera Eliyê Hindî.

Perîzde bû berdestiya Paşayê Mûska. Di vê navberê de seyîsê paşa çav berda Perîzade yê. Xwest ku Perîzade ji wî re bibe bermalî. Lê Perîzdeyê ev xwesteka wî nepejirand. Ji ber vê seyîs ji bona Perîzadeyê kemîn amade kir. Şevêkê bi dizî kete menzela Perîzadeyê û Perîzade xewirand, bi lez û bez çû menzela lawê paşê û lawikê du salî anî menzela perîzdeyê. Serê lîwik jê kir û lawik kire nav nivînên Perîzade yê. Sibe bû, dema ku xulam çûne menzela lawikê paşê, kirin qêrîn û hawar. Haho lawe Paşê wendaye! Paşa bi lez û bez li nava menzela geriya. Dema çû menzela Perîzdeyê çav li serî bû çîzo-mîzo û şûr kêşand û xwest ku sere Perîzadeyê ji laşe we hilqetîne. Lê wusa nebû. Destê paşa çû jor lê çerkir nekir destê wî nehate jêr. Got: Ya Rebbê min ev çi hale? Lê Perîzade got: Paşa ez bê gunehim. Paşa jî got erê welle ma vê qîzê lawê min bikuşt a wê evarî birewiya. Ji ber ku ez bawerdikim ku vê qîzê lawê min nekuştaye. Perîzade dia kir destê Paşê weke berê sax bû. Hîn Paşa ji menzela Perîzade derneketibû denge xulaman kete guhan. Xulaman digotin: Seyîsê me tune ye. Paşê fêhm kir ku ev kara ji bin serê seyîs derketiyê. Leşker bi şopa seyîs xistin, leşkeran seyîs girtin û bi darve kirin. Paşa, Perîzade bangî cem xwe kir û heftê zêr danê. Paşê ji Perîzadeyê re got: Here bila riya te vekirîbe tu ji vê demê şûnde azad î.

Perîzade ji Qesra Paşayê Mûska derket berê xwe da oxirê pişt a xwe da felekê û meşiya. Çend rojan şûnda gihişt gundê Tehtokê. Dît ku li ber kaniya gund jineke nav sal digirî, got: Dayê tu ji bona çi digirî? Jinikê lê vegevand û got: Qîza min

lawê min bû deyndarê Paşayê Tehtokê Haşîmê Zeko. Paşa dibêje ku di nav du rojan de lawê te deynê min nîne ez ê wî bi darvekim. Perîzade got daye deynê lawê te çiye? Jina nav sal got çil zêr e. Perîzade hema ji kîsikê xwe çil zêr derxist û da jinik a navsal û bi lez ji ber kaniyê bi dûr ket. Cardin bi rojan çol û banî derbaskirin çû perava Gola Qûmê. Li ber golê kete xeweke şêrîn. Dema ku çavê xwe vedike dibîne ku dest û lingên wê hatine girêdan û du keştîvan li hember wê rûniştin e. Dike qêrîn hewar lê tu fêde nake. Keştîvan Perîzade dikin keştîyê û bere xwe didin cihekî ne diYa. Demekê şûnda baraneke xurt dibare, ba û bahoz rabibe keştî di nava golê de weke dergûşekê dileq e. Di vê navberê de serê Perîzadeyê li qiraxa keştîyê dikeve û Perîzade dixewir e. Dema ku çavê xwe vedike dibîne ku di keştîyê de ew tene maye, keştîvan meştîvan qe tu kes nemane. Hebekî berxwe dide dest û linge xwe ji weris difilitîne. Radibe ser xwe kinc/cil ên keştîvanan li xwe dike û kumekî dide serê xwe û dibêje ez ê ji wir şûnda weke mêran bijîm. Keştîyê dibe ber bender a Qûç a Reş, ji keştîyê tê xwar û bi halê xwe digrî. Paşayê Qûç a Reş Şêelyê Guro, cilê xwe guherîne û di nava gel ê xwe de digere, lê gel kesek Şêelî nasnakin. Şêelî dinêre ku zilamek li ber keştîyekê digrî. Şêelî diçe rex zilam û dibêje: Keko tu ji bona çi digirî? (ji ber ku Perîzade edî cil ê meran li xwe dikir, ji ber vê yekê mirovan nizanîbû ku ew jin e) Perîzade dibêje derde min girane, tu yê ji bona xwedê nepirse. Şêelî got: Dibe, ez napirsim lê vê kaxezê bigire, dema serê te kete tengasiyê tu vê kaxezê rê kê bide, wê te bîne bal min û Şêelî ji wir bi dûr ket.

Roj li pêy hev weke çem herikîn. Perîzade ne karek dî ne jî tu. Her şev li cihekî dima, ketibû halekî xirab. Rojekê Perîzade got ez herim xwediyê vê kaxizê bibinim, dibe ku alîkariya min bike. Dema ku kaxiz rê mirovekî da mirov raste rast Perîzade bir ber Qesra Paşayê Qûç a Reş, li ber deriye qesrê wî mirovê biyanî ji Perîzadeyê re got: Birayê min xwediyê vê kaxizê paşayê me Şêelîyê Guro ye û ev qesra jî a wî ye. Xulaman Perîzade ji ber derî girtin, ew birin cem Paşê. Paşê got: Hevalo tu bi xêr hatî. Perîzade got: Di nava xêrê de be. Paşa, Perîzade kir berdevkê xwe. Demeke dirêj Perîzade li cem Paşa ma. Edî Paşa kal bûbû li ber mirinê bû. Paşa ji hemwelatîyê xwe re wasiyetnameyek/hosîname nivîsand û got li pêy min paşa yê we berdevkê min ê biyanî ye. Dem borî Paşa mir. Perîzade li şûna wî bû paşa. Em li vir wegerin cem Hesên. Hesên paşî bîst salan ji leşkeriyê (ji şerê haca) vedigere mal.

Lê dema tê malê ne bav, ne dê, ne jî Perîzade hene. Tenê bira yên wî Mehmûdê mizawir li mal maye, lê ew jî lal bûye. Gundiyên Hesên hemû bûyer ji Hesên re gotin. Hesên serê xwe rakir û ji wî welatî berve cihekî ne diYa çû. Hesên bi hesreta Perîzade dişewitî. Nizanî bû ku Perîzade nemirî ye. Bi sal û mehan li çol û çiyên geriya. Li keştiyekê siyar bû û cardin bere xwe da cihên ne diyar. Keştiya ku Hesên ketibûyê noqî binê avê bû. Hesên dema ku çavê xwe vekir di nava nivîna da ye. Di ser wî re yekî ku bi xof sekiniye. Xwediyê malê got mala Xwedê ava be zîlam şiyar bû. Hesên pirsî got:

-Ev dera... Ez lê ku me?

Xwediyê malê got:

-Ev Qesra Şêelîyê Guro Paşayê Qûç a Reş e.

Xwediyê malê ji Hesên pirsî û got:

-Keko tu kî yî ? Tu ji ku de tê, ku de diçî?

Hesên got:

-Ez Hesênê Girêş im. Ez ji welatê şêxan tîm. Bi vê gotinê re Perîzade kumê sere xwe davêje û dibêje Hesênê minnnnnnnnn! Hesên jî dest bi stranê dike û dibêje:

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Li te kirin fitne û bêbextiye

Lê delalê bê guneh û bê xetaye

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Tu b' xebat û tu b' lebatî

Li ser çavê min re hatî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Kin gewr bû mîna pûşê di kendalan

Bibîne halê evdalan

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Bidim pala te balgî û mestan

Ez ramûsim her du destan

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Veke carek xet û xalan

Bibînim eyd û sersalan

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Were li wira tu rûnî

Tu roniya her du çavanî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Tu gul û tu rihanî

Derdê min re tu dermanî

Dilê min re tu dermanî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Tu bûy dosta ey rehmanî

Tu bûy dermanê derdanî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Halê kîn û kehrê zanî

Kitanê reş li bejnê danî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Were li cihê min rûne

Li dewsa min padîşah be

Dilê min bila b' te şa be

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Cana min lê tu can girî

Çavê min kir hesr û girî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Ji te re ez eşk û dîn im

Digerim ez te nabînim

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Tu pîrr rind û tu çelengî

Tu xweşik û bi heft rengî

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Hêsrê te can dişewtîne

Were halê min bibîne

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Dilê min tu Perîzade

Canê min tu Perîzade

Ay gula min tu Perîzade

Perîzade ay Perîzade

Perîzade ay Perîzade

3.10.a. Ferhenga Bêjeyên Herêmî

Mizawir: Kesê fenek, fêlbaz.

Dergîstî: Evîn, destgirtî

Seyîs: Yê ku li hespan dinêrin, nêrînvânên hespan

3.10.b. Metelokên Herêmê

Bû xwarina guran

Berê xwe da oxirê pišta xwe da felekê

3.10.c. Di Çîrokê de Dem

Dema vê çîrokê ne diyar e.

3.10.d. Di Çîrokê de Cihên Fireh

Çol

Banî

Bendera Qûça Reş

3.10.e. Di Çîrokê de Cihên Teng Vekirî

Pêş mala Apê Eyo

3.10.f. Di Çîrokê de Cihên Teng Girtî

Mizgefta Sinyê Kullo

Qesra guhera Eliyê Hindî

Keştî

Qesra Şêeliyê Guro

3.10.g. Li Gor Metoda (azîne) Propp Dahûrîna Çîrokê

1. Hebû tunebû lawikek û keçikek hebû navê lîwik Hesên, navê keçikê Perîzade bû (i)

2. Hesên û Perîzade dizewicin (x^1)

3. Ji bona şerê Haca Eşîra Şêxa bangî Hesên dikin (Y^1)

4. Hesên diçe şer (e^3)

5. Perîzade bi nameya Mehmûd dixape (g^1)

6. Bêbextî li perîzadeyê tê kirin (F)

7. Perîzade ji walatê xwe diçe (↑)
8. Seyîs lawê padîşah dikuje (X^{14})
9. Keştîvan Perîzadeyê girê didin (X^{15})
10. Perîzade lawayan ji keştîvanan dike (D^5)
11. Hesen ji şer vedigere malê (↓)
12. Bûyerên ku hatine serê Perîzadeyê ji Hesen re dibêjin (Y^4)
13. Hesen biryarê dide ku li Perîzadeyê digere (W)
14. Hesen ji malê diçe (↑)
15. Hesen bi rê diçe (R^2)
16. Perîzadeyê Hesen nas dike (M^2)
17. Dema ku Hesen Perîzadeyê nas dike dest bi lawijan dike (Y^7)
18. Hesen û Perîzade bi mirazê hevdu şa dibin (N^*)

Şemaya vê çîrokê wisa ye:

$x^1, Y^1, e^3, g^1, F, \uparrow, X^{14}, X^{15}, D^5, \downarrow, Y^4, W, \uparrow, R^2, M^2, Y^7, N^*$

3.10.h. Peyam

1. Bêbextî karekî qirêj e
2. Dawiya bêbextiyan tune ye
3. Kesên rast û durust her çiqas zehmetê bibînbe jî dawiya dawîn dilşand û bextewar dibin
4. Evîn dikare her tiştî mirovan bide kirin
5. Dia karekî baş e

3.10.i. Leheng

Perîzade: Keçikeke xweşik û delal e. Bêbextî lê tê kirin

Hesen: Lawikekî bedew û leheng e

Apê Eyo: Kesekî xizan û oldar e

Kalê: Kesekî zana ye

Hemedê Hemran: Kesekî baş e û bavê Perîzadeyê ye

Mehmûd: Kesekî fêlbaz û fenek e

Seyîs: Kesekî fêlbaz û fenek e

Sinyê Omo: Padîshahekî dilbirehm e

Haşîmê Zeko: Padîshahekî sîtemkar e

Şêliyê Guro: Padîshahekî xwedî dad e, ji alîkariyê hez dike

3.10.î. Nirxan

Di vê çîrokê de jî pirr ders têne dayîn. Di vê çîrokê de em nerindî û nepakiya bêbextiyê, zehmetiya tenêbûna jinê, qedir zanînê, wefa yê, evîn ê, rindî yê, reşiya dawîya xerabiyê, xîret ê, cefayê, lehengiyê, şer û pevçûnên eşîra, oldariyê û hwd. dibînin.

Encam

Me di vê xebatê de xwest ku di derbarê Eşîra Şêxan û çîrokên ku di nava Eşîra Şêxan de tên vegotin û hetanî vê demê neketine lîteraturê destnîşan bikin. Di vê çarçoveyê de di dawiya vê xebatê de em gihiştin van encamên jêrîn.

Folklor çalakiyeke gelemperiye û di hundurê xwe de gelek pêvajoyan dihewîne. Mirov çî çax di derheqê civatê de li çî bigere ev tiştana di nava folklorê de tê pêşberî mirov. Hemû şaxên civatê dibe ku di nava folklorê de tunebe ango em dikarin bibêjin ku folklor ne hemû tiştên civatêne, lê belê gelek tiştên civatêne. Folklor di nava xwe de beşên wekî pêşgotin, çîrvanok, gotinên peşiyar, beyt û hwd. dihewîne.

Hemû gelên li ser rûyê dinyayê kêr zêde xwediyê folklorê ne. Gelan rengê xwe dane folklorê. Ji wan gelana yek jî gelê Kurd e. Folklorê Kurdan ji her awayî de gelekî dewlemend e û pirr beşan di nava xwe de di hundurê.

Çîrok beşek ji folklorê kurdî ye. Di derbarê pirr kar û barên civatê û navgînên civatê de teqez çîrokek heye. Çîrokên cot, çîrokên çînînê, çîrokên dextlê, çîrokên bêderê, çîrokên mîrkut, çîrokên mal barkirinê, çîrokên bêrî û pez, çîrokên tevnê, çîrokên teşiyê, çîrokên kulav, çîrokên şonik û hwd.

Çîrok bîra civakêye û rengê civakê raberî mirovan dike. Ji bona nîşan çîrok xwenasîn e. Dema ku çîrok tene vegotin urf û edet, jiya rojane, daxwazên gelan, taybetmendiyên erdnigariyê, êş, azarên civakê tene pêşberî me. Çîrokên her herêmekê, her 'eşîrekê, her gundekî taybetmendiyên wana di nava xwe de di hundurîn. Her deverê, çîrokê bi rengê xwe boyax dike. Ji van herêmana herêmek jî Herêma Şêxa ye.

Herêma Şêxan navê xwe ji Eşîra Şêxan digire. Eşîra Şêxan mezintirîn 'eşîreke li Rihayê ye. Di berbarê cih û warê vê 'eşîrê yê sereke de agahiyên zelal tunen e. Lê belê li gor baweriyeke gelemperî ev eşîra di dewra hukumdarê Emewiya Yezîd I. De ji Kufayê hatine Reqqayê, paşê di dewra Harûn Reşîdê Ebbasî de hatine

herêma Rihayê. Piştî vê koçeriyê bi sedan salan li Rihayê mane û 'eşîr li gelek deveran belav bûne. Ev Eşîra wekî her 'eşîreke kurd ji aliyê folklorê de nîrxên dewlemend di nava xwe de di hundurîne. Bi taybet çîrok di nava vê 'eşîrê de li gorî bêşên folklorê yê din hîn zêdetir pêş de çû ye. Lê mixabin hetanî vê demê ev çîrokana nehatine nivîsandin.

Di vê xebatê de çend çîrokên Herêma Şêxan hatin nivîsandin û ev çîrokana hûr -hûr hatin tehlîl kirin. Tehlîl li gorî metoda Propp hatiye kirin. Fonksiyonên çîrokan li gorî vê metodê hatine amadekirin.

Di amadekariya şemayên çîrokan de dibe ku kêmasî hebin. Ev jî tiştêkî ji rêzê ye. Ji ber ku Propp dibêje : "Di hinek çîrokan de şemaya sereke, ji aliyê teşeyê de kême. Hema hema di hemû çîrokan de hinek fonksiyon kême in. Di çîrokê de kêmasiya hin fonksiyonan avahiya çîrokê naguhere, cihê fonksiyona kême fonksiyonên din tije dike."²⁰⁵ Di çîrokên Herêma Şêxan de hinek bûyer henin ku em di fonksiyonên Propp de rastî van tiştan nayên. Wekî "dengbêjî", "di çîrokê de du lehengên sereke", "xwekujî" û hwd.

Ji bilî çîrokan tiştêkî din ê girîng jî çîrokbêjiye. Ked û bandora jina Kurd di warê jiyanê de li ber çava ye. Ev ked û bandor di warê hunerê de jî xuya dibe. Li Herêma Şêxan di warê çîrokbêjiyê de jin roleke sereke dilîzin. Bi saya serê wan bîra civakê hîn nemiçiqiye.

Me dixwest ku em hin çîrokên din jî binivîsîn, lê belê çîrokên ku di destê me de zêde zêde dirêjin ku bihatana nivîsandin wê xebat ji çarçoveya lîsansa bilind derketa.

Di vî warê de xebatên bîbliyografîk kême in (em dikarin bêjin ku hema hema tune ne) û têr û tije nîn in. Divê bîbloyafiyayên ku ji xebatên her çar parçeyên Kurdistanê, Qefqasya (Xebatên herî bi rêk û pêk li vê erdnîgariyê hatine kirin), Ewropayê û parzemînên din yê dinîyayê (ji bo folklorê kurdî) jî dihebînin bînin amadekirin. Ev xebata wê karê lêkolîneran hêsantir bike.

²⁰⁵Emmez, *h.b.*, r. 126.

Divê lêkolîner zû destê xwe bigirin û çîrokên ku neketine lîteraturê berhev bikin. Ji ber ku êdî çîrokbêj kê m bûne (Hinekan wefat kirine, hinek temen dirêj bûne û çîrok xwe ji bîr kirine).

Xetereya mezin ew e ku bi pêşveçûna teknolojiyê çîrok li ber candanê ne. Ger ev çîrokana neyên nivîsandin di demeke kin de edî wê wenda bibin û edî tu caran wên neyin ditîn.

Di vî warî de di tûrikê kê de çî hebe bila derxînin holê, da ku civat jê sûtê bigire. Bila were zanîn ku çîrok ne malê kesî ye, malê kesan e. Di encamê de em dikarin bibêjin ku ev xebat jî wek gelek xebatan, bêkêmasî nîne. Ev xebata me, eger di warê xwe de hinek valahiyan tijî bike, em dê gelek şad û bextewar bin.

Çavkanî

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebebiyata Kurdî ya Klasîk*, Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2014.

Ahmedzade, Haşîm, *Ulus ve Roman*, (Wer. Azad Zana Gündoğan), Weşanên Pêrî, Stenbol 2004.

Ahmedzade, Haşîm, *Romana Kurdî û Nasname*, (wer. Fahriye Adsay), Weşanên Awesta, Stenbol 2011.

Akpınar, Alişan - L. Rogan, Eugene, *Aşîret Devlet, Osmanlı Devleti'nde Aşîret Mektebi*, Aramtoplum yayınları, İstanbul 2001.

Alakom, Rohat, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, Çapa Duyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2013,

Alan, Dundes, "Folklor Nedir", *Millî Folklor Dergisi (Türk Dünyası Folklor Dergisi)* (wer. F. Gülay Mirzaoğlu), j. 36, Zivistan- 1997, r. 76

Alan, Remezan, *Folklor û Roman*, Weşanên Peywend, Stenbol 2013.

Amedî, Paşa, "Malbata Casimê Celîl", *Nûbihar*, j. 126, Zivistan, Stenbol 2014, r. 63.

Andersen, Hans Christian, *Çîrok û Serpêhatî*, (wer. Ezîzê Gerdengerî), Weşanên Doz, Stenbol 2011.

Anonim, *Edebiyat Ansiklopedisi*, Milliyet Gazetesi Armağanı, İstanbul 1991.

Atalay, İbrahim, – Mortan, Kenan, *Türkiye Bölgesel Coğrafyası*, İnkılap Yayınevi, İstanbul, 1997.

Babaoğlu, İrfan, "Kurteçîrok Hestên Kurdan in" *Kovara W*, j. 47 Gulan-Pûşper, Stenbol 2013, r. 52.

Baran, Bahoz, "Ji Çîroka Bakur Çend Têbinî", *Kovara W*, j. 47 Gulan-Pûşper, Stenbol 2013, r. 47.

Bedîrxan, Celadet, "Ferhengok", *Hawar*, j. 30, Şam, 1941, r. 16.

Bedlîsî, Şerefxanê, *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, (wer. Ziya Avcı) Çapa Sêyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2007.

Berbir, Hogir, *Ji Dengbêj Fadilê Kufragî Destan û Çîrokên Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed 2007, r. 5.

Beşikçi, İsmail, *Doğuda Değişim ve Yapısal Sorunlar (Göçebe Alikan Aşireti)*, Doğan Kitapevî, Ankara 1969.

Beyazîdî, Mela Mehmûdê, *Adet û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2010.

Bilkan, Ali Fuat, *Masal Estetiği*, Weşanên Timaş, İstanbul 2009.

Bozarşlan, M. Emin, *Gurê Bilûrvan*, Weşanên Deng, Amed 2000.

Bozkurt, İbrahîm, *Tarih Boyunca Aşiretçilik ve Şanlıurfa Aşiretleri Tarihi*, İmaj Yayıncılık, Birecik, 2003.

Bruinessen, Martin Van, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (trc. Banu Yalkut), İletişim Yayınları, İstanbul 2003, r. 82.

Candan, Goran, “Heciyê Cindî : Jiyan û Kar”, *Nûbihar*, j. 126, Zivistan, Stenbol 2014, r. 60.

Celîl, Casimê-Celalî, Emerê, *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011.

Celîl, Ordîxanê-Celîl, Celîlê, *Zargotina Kurda*, I, Çapa Sêyem, Weşanên Aram, Amed 2013.

Cewerî, Firat, *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)*, I, Çapa Yekem, Weşanên Nûdem, İstanbul 2003.

Cindî, Heciyê-Evdal, Emînê, *Folkloru Kurmanca*, Çapa Yekem, Weşanên Avesta, Stenbol 2008.

Cizîrî, Şerefşan, *Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon*, Weşanên Aram, İstanbul 2011.

Çetintaş, Ahmet, *Aşiretlerin Sosyal Yapısı Üzerine Sosyolojik Bir İnceleme (İzollu Aşireti Malatya Örneği)*, (Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi), Isparta 2002.

Çifçi, Tekin, *Kilam û Jin*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2014.

Denîz, Serwet, “Destpêka Çîrokê” *Kovara W*, j. 48, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır 2013, r. 64.

Dewrêş, Hesenê, “Di Hin Berhemên Kurdî de Şopên Çanda Devkî”, *Kovara Zarema*, j. 1 Gulan, Stenbol 2014, r. 60.

Dorson, Richard M., – Thoms, W. J., “William John Thoms ve ‘Folklor’ Başlıklı Yazısı”, *Milli Folklor Dergisi (Türk Dünyası Folklor Dergisi)* (wer. Serpil Aygün Cengiz), j. 36, Zivistan- 1997, r. 90.

Emmez, Berivan Can, *Sözlü Gelenekten Modern Masala: Çocuk Edebiyatında Masal Üzerine Halkbilimsel Bir İnceleme*, (Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi), Ankara 2008.

Fewzi, Kemal, “Kürd Masalları”, *Jîn*, V, (amd. M. Emin Bozarslan), Weşanên Deng, Uppsala 1988, r. 934-935.

Geverî, Ayhan, *Antolojiya Çîrokên Nûbiharê*, Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2008.

Gökalp, Ziya, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, (amd. Şevket Beysanoğlu), Sosyal Yayınları, İstanbul 1992.

Güleç, Hamdi, *Halk Edebiyatı*, Weşanên Çizgi Kitapevi, İstanbul 1988.

Gürel, Zeki û Hwd., *Çocuk Edebiyatı*, Weşanên Öncü Kitap, Ankara 2007.

Hay, William Rupert, *Kürdistan’da İki Yıl 1918-1920*, Weşanên Awesta, Stenbol 2005.

Herdem, Dilxwaz, “Di Gotinên Devkî de Hişmendîya Gel”, *Kovara W*, j. 25, Adar-Avrêl, Stenbol 2009, r. 45.

Jîr, Sîdar, “Çîrokeke Ciwan: Ji Agresîfîyê Diçe Henûniyê” *Kovara W*, j. 47, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır 2013, r. 35.

Karakaya, Rahmetullah, “Eskerê Boyik: Şûrê Destê Şervanê Me, Zimanê Me ye”, *Nûbihar*, j. 126, Zivistan, Stenbol 2014, r. 44.

Kaya, Doğan, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weşanên Akçağ, Ankara 2007.

Kaya, Hasan, *Kürt Öykü Antolojisi*, Weşanên Ewrensel, Stenbol 2005.

Kevirbirî, Salih, *Yirmi Olay, Yirmi Kılam Kürt Halk Türkülerinden Seçmeler*, (wer. Mazlum Doğan), Weşanên Ewrensel, Stenbol 2004.

Kıran, Eyüp, *Dewrêşê Evdî, Kulîlka Bilbizêk û Rim*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011.

Kurdo, Qanatê, *Tarixa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Stenbol 2010.

Mihemed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, (wer. Ziya Avcı), Çapa Yekem, Weşanên Awesta, Stenbol 2002.

Mînorsky, Viladîmîr-Boîs, Thomas-Mac Kenzîe, D. N., *Kürtler ve Kürdistan*, Çapa Duyem, Weşanên Doz, Stenbol 2004.

Mînorsky, Viladîmîr-Boîs, Thomas, *Kürt Milliyetçiliği*, Weşanên Örgün, Stenbol 2008.

Nikitin, Bazil, *Kürtler*, Weşanên Deng, Diyarbakır 2013.

Ong, Walter J., *Sözlü ve Yazılı Kültür, Sözüün Teknolojileşmesi* (wer. Sema Postacıoğlu Banon), Çapa Çarem, Weşanên Metîs, Stenbol 2013.

Orbelî, Î. A., *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane*, (amd. Sinan Hakan), Çapa Yekem, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011.

Özer, Ahmet, *Doğu'da Aşiret Düzeni ve Brukanlar*, Elips Kitap, İstanbul 2003.

Pertev, Ramazan, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedogojiya Kurdî)*, Weşanên Doz, Stenbol 2009.

Proop, Vladimir, *Teori ve Tarih*, Weşanên Awesta, Stenbol 2001.

Qasimlo, Abdurrahman, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Awesta, Stenbol 2009.

Qedrî Can, *Guneh*, Çapa Yekem, Weşanên Lîs, Stenbol 2007.

Roger, Lescot, *Memê Alan*, Çapa Duyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2010..

Sağniç, Feqî Huseyn, *Çîrokên Kurdî (Fabl)*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol 1999.

Sağniç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Çapa Yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2002.

Sâmi, Şemseddin, *Kâmûs-ı Türkî*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1989.

Sokolov, Yuri M., *Folklor, Tarih ve Kuram*, (wer. Yerke Özer), Weşanên Geleneksel, Ankara 2009, r. 11.

Taşdelen, Musa, *Göçerlerin Şehirleşmesi (Beritanlı Aşireti Örneği)*, Turan Yayınları, İstanbul 1997.

Temo, Fûad, “Çîrok”, *Kovara Rojî Kurd*, (amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê), Çapa Yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2013.

Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği*, (trc. Kamuran Fıratlı), Doz Yayınları, İstanbul 1997, r. 135.

Türkdoğan, Orhan, *Güneydoğu Kimliği Aşiret-Kültür-İnsan*, 2. Baskı, Alfa Yayınları, İstanbul 1998.

Uluç, A.,Vahap, “Kürtler’de Sosyal ve Siyasal Örgütlenme: Aşiret”, *Mukaddime*, j. 2, Mardin 2010, r. 52.

Uzun, Mehmed, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, (amd. Mehmed Uzun) I, Tüm Zamanlar Yayıncılık, İstanbul 1995.

Uzun, Mehmed, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Çapa Sêyem, Weşanên Îthakî, Stenbol 2011.

War, Ronî, “Çîrok Pêşverû ye”, *Kovara W*, j. 18, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır 2008, r. 36.

War, Ronî, “Şaristani” *Kovara W*, j. 25, Adar-Avrêl Stenbol 2009, r. 38.

Xanî, Exmedê, *Mem û Zîn*, (Şîrove û Kurdiya Îro. Jan Dost), Weşanên Awesta, Stenbol 2010.

Yalçın, Alemdar, Aytaş, Giyasettin, *Çocuk Edebiyatı*, Weşanên Akçağ, Ankara 2002.

Yavuz Helimoğlu, Muhsine, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Weşanên Wezaretê Çandê, Ankara 2002.

Yıldırım, Kadri-Pertev, Ramazan-Aslan, Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşana Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tîrkiye ya Zanîngeha Artûklûyê, Mêrdîn 2013.

Yılmaz, R., (Gernas Koçer), *Destana Şerrê Kundan û Qijikan*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2007.

Zengin, Ahmet Yaşar-Zengin, Nesrin, *Çocuk Edebiyatı*, Çapa Duyem, Weşanên Bizim Büro, Ankara 2002.

Zinar, Zeynelabidîn, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, (amd. Mehmed Uzun) I, Tüm Zamanlar Yayıncılık, İstanbul 1995.

Zinar, Zeynelabidîn, Axaftina di panela kurd-kavê de ya li ser “*Folklorê Kurdî û Hunera di Folklorê de*”, 2006.

Zinar, Zeynelabidîn, “Hunera Folklorê Kurdî” *Nûbihar*, j. 99, Stenbol 2006, r. 18.

Çavkaniyên Elektronîk

<http://www.semskiasireti.com/?syf=18&hbr=486428&/%c5%9eeyhanlı,%c5%9eeyhan,-%c5%9eeyx%c4%b0-a%c5%9e%c4%b0ret%c4%b0>, (02. 03. 2014.)

http://tr.wikipedia.org/wiki/Edgar_Allan_Poe (10.09.2014)

Pêvek



Wêne 1: Di Lîstika Deloyê de Yekik



Wêne 2: Di Lîstika Deloyê de Duduk



Wêne 3: Di Lîstika Deloyê de Sisik



Wêne 4: Di Lîstika Deloyê de Tepiş



Wêne 5: Di Lîstika Deloyê de Tilîk



Wêne 6: Di Lîstika Deloyê de Çandir (Kon)



Wêne 7: Di Lîstika Deloyê de Qal 1



Wêne 8: Di Lîstika Deloyê de Qal 2




Wêne 9: Di Lîstika Deloyê de Qal 3



Wêne 10: Di Lîstika Deloyê de Perîncok




Wêne 11: Di Lîstika Deloyê de Derzîkok



Wêne 12: Di Lîstika Deloyê de Şûjinok



Wêne 13: Di Lîstika Deloyê de Sabûnok



Wêne 14: Di Lîstika Deloyê de Mêkutok



Wêne 15: Wetha Bozkoyun (Wetha Şukrî)



Wêne 16: Zerê Akboru (Zera Fatê)



Wêne 17: Meryem Dusak (Meyra Xerîb)



Wêne 18: Eyyüp Bozkoyun (Eyûbê Xefîl)



Wêne 19: Mehmet Bozkoyun (Kûto)



Wêne 20: Hasan Bozkoyun (Hesenê Xelîl)



Wêne 21: Sinan Buğdaycı (Sinanê Sofî Kalo)



Wêne 22: Şemsettin Bulut



Wêne 23: Abdulkadir Akboru



Wêne 24: İbrahim Kırmızıgöz



Wêne 25: Gundekî Eşîra Şêxan (Taşli)



Wêne 26: Gundekî Eşîra Şêxan (Bozq)



Wêne 27: Gundeke Eşîra Şêxan (Beg Elî)



Wêne 28: Jûreke (Ode) Eşîra Şêxan (Gundê Ziyaretê)